Arşîva bîra Kurdan: Philippe Rondot û Babakr El Bachadari rewşa Kurdistana Başûr dinirxînin... (nîsan 1977) ▶ R. 12

LE MONDE diplomatique kurdî

Çileya pêşîn 2010 - Hejmar 13 · www.lemonde-kurdi.com · info@lemonde-kurdi.com · 24 Rûpel

**Pierre Daum û Aurel**
Piştî bûyerên du sal berê, Yûnanistan ket nava bêdengiyê. Digel vê qeyrana aborî û bernameyên hikumetê, gelo ciwanên yûnan ku dadiketin kolanan bi ku de wenda bûn?
▶ R. 6

**Nikolas Kozloff**
Di qeyrana siyasî ya cîhanî de, peywendiya Îranê ya bi Amerîkaya latînî re, gelo piştgirî ye an hesabên wan di ber hev de ne? Ev dostaniya wan ji ku tê?
▶ R. 8

**A. Popelard û P. Vannier**
Paytexta Cezayirê ev 50 sal in ku ava dibe. Lê belê, bajarvaniya nû bi xwe re bajarekî nû jî ava dike. Gelo Cezayir daye ser rêya kîjan bajarvaniyê?
▶ R. 9

**Laurent L. Jacque**
Şerrê sar êdî li ser pereyan tê kirin. Dolar, euro, yen, sterlîn... Her dewlet dixwaze hêza xwe bi pereyê xwe ve diyar bike. Gelo çima û kî dê bi ser bikeve?
▶ R. 21

**Philippe Rivière**
Herkes dibêje, lê kî bawer dike? Facebook agahiyên mirov bi dest dixe, lê gelo çi bi wan dike? Agahiyên mirov parastî ne an tiştin hene ku em pê nizanin?
▶ R. 23

# Krîza Siyasî ya li Iraqê û rola Kurdan

Prof. Dr. Ferhad Îbrahîm

### Kurd bi erka tayînker

Di çapemeniya anglosakson û di ya ereb û alman de jî, li ser rola damezrandina hikumetê, di krîzê de zêde mubalaxe hat kirin û ev yek wek rola tayînker (kingmaker) hat nivîsandin û nîşandayin.

Di realîteya polîtik ya Iraqa nû de, faktora kurd roleke girîng a zelal wergirtiye. Lê belê dîsa jî li gor bandora rewşên heyî, hêzên siyasî yên ereb li ser sîstema nû li Iraqê biryar didin. Eger rewşa hêzan û helwesta partiyên ereb daxwazên Kurdan bigirin ber çav, du tişt zelal dixuyên:

1. Têkiliya Kurdan bi hemû berendamên serokwezîriyê re ji normal heta baş bû.

2. Ji hemû aliyan ve hêz hebûn ku pejirandina daxwazên Kurdan red dikirin. Mînak hêzên Sunnî yên li derdora serokwezîrê nuha al-Nujaifi û siyasetmedarên Sunnî yên koalîsyona iraqî li derdora Iyad al-Alawî, ne gellek dostên Kurdan bûn. Ev yek ji bo muttefîkên nuha Nurî al-Malikî, Muqtada al-Sadr jî derbas dibe ku di vê pirsgirêkê de ji 2003´yan ve bi awayekî eşkere daxwaza Kurdan ya sîstema federal red dikin.

Ji vê yekê hin encam derdikevin.

**1-** Kurd dizanin ku ew di tu rewşên siyasî de nikarin daxwazên xwe bi tevayî bînin cîh. Ji ber vê yekê di hemû pirsan de amadeyê lihevhatinê ne.

**2-** Kurd dizanin, eger partiyên ereb li ser berendamekî bihêz yê ku di parlamentoyê de pirraniyê saz dike li hev bên, divê ew jî mîna wan bikin.

**3-** Partiyên ereb jî, ji ber gellek sedeman dixwazin ku Kurdan tevlî desthilatdariyê bikin. Di dema dîrokî ya nuha de lidervehiştina Kurdan ya ji hikumeta navendî dikare bê bawerî û biyanîbûnê zêde bike.

Ji derveyî vê jî, Kurd xwediyê alavên din in. Yek ji wan astengkirina guhertina qanûna bingehîn e; li gorî qanûna bingehîn ya Iraqê mafê Kurdan yê vetoyê li ser guhertina qanûna bingehîn ya Iraqê, di sê herêmên ku di bin kontrola wan de ne, heye.

Ji bo ku ez di dawiya nivîsa xwe de perspektîvekê şanî bidim, dixwazim sê pirsan bînim ziman.

### Daxwazên Kurdan

Daxwazên Kurdan mîna şertê beşdariya hikumeteke iraqî xwe di sê pirsgirêkan de diyar dikin:

**1-** Siberoja navçeyên ku mijara gengêşiyê ne, bi taybetî jî ya herêma Kerkûkê

**2-** Siberoja statuya hêzên leşkerî yên kurd (Pêşmerge)

**3-** û tevlîheviya mezin ya li ser federalîzmê û şîroveya federalîzmê.

Daxwazên ku girîngiya wan di rêza duyemîn de ye jî tên ser vê yekê. Wekî daxwaza cîhê Serokdewletiyê (lê ev bi kesayetiya Serokkomar Celal Talabanî ve girêdayî ye) (1), wekî din daxwaza wezareteke navendî. Heta nuha Hoşyar Zebarî ji Partiya Demokrat ya Kurdistanê xwediyê wezareta derve ye.

Heta nuha, pênc sal piştî derxistina qanûna bingehîn û damezrandina hikumeta yekemîn û li gorî hiqûqa gelan dawîlêanîna dagirkeriyê, mirov nekariye ji van pirsan re çareyekê bibîne.

Hemû cudahî di pirsekê de kom dibin: sîstema federal ya Iraq û naskirina karakterê pirr-etnîk ya Iraqê.

Ez bi pirsa federalîzmê dest pê dikim. Kurdan ev pirs dema ku muxalîf bûn çareser kir. (2) Ev dîsa encama gengêşiya li ser tayînkirina qedera xwe bû ku di navbera rewşenbîrên kurd û rewşenbîrên ereb ên iraqî de piştî Helebçe û piştî Enfalê çêbûbûn.

▶ R. 11

Almanya: 4,50 €
**Awûstûrya, Belçîka, Fransa, Hollanda:** 5,00 €
**Brîtanya:** 4 £, **Danîmarka:** 40 DKK, **Norweç:** 40 NOK, **Swêd:** 50 SEK, **Swîsre:** 6,50 CHF, **Tirkiye:** 7 TL

# Riya ku ji antîkurdolojiyê ber bi kurdolojiyê ve diçe û Îsmaîl Beşîkçî *

M. Malmîsanij **

Peyva kurdolojîyê (kurdnasîyê) bi gelemperî tê wateya xebat û lêkolînên li ser ziman, dîrok, wêje û avabûna civakî ya Kurdan. Heman peyv, ji bo binavkirina wan dezgehên îlmî jî tê bikaranîn ku li ser van mijaran xebatên zanistî dimeşînin (1). Ji ber ku li Tirkiyeyê hebûna Kurdan hatiye înkarkirin û her tiştê ku bi Kurdan re têkildar e digel navê welatê wan Kurdistanî hatine qedexekirin, li vî welatî tu xebatên kurdolojiyê çênebûbûn. Îsmaîl Beşîkçî, di vî warî de di zanîngehên Tirkan de awarteyek e. Her ji ber vê yekê, dema ku li Tirkiyeyê qala kurdolojiyê tê kirin serê pêşîn ew tê bîra mirov.

Xebat û lêkolînên Beşîkçî yên li ser vê mijarê di salên 1960'î de dest pê dikin. Heger em li ser wan xebatên ku ji dema dawî ya Osmaniyan ve dihatin kirin, bifikirin ev yek dê alîkariya me bike daku em têbigihîjin ka cihê Beşîkçî di warê kurdolojiyê de çi ye û ew ji hawîrdorekê çawa tê. Her çend di zanîngehên welatên cur bi cur de li ser ziman, dîrok û wêjeya Kurdî hin xebatên akademîk dihatin kirin jî, li Tirkiyeyê di şûna wan de mirov dikare behsa du cure xebatan bike ku ez wan wekî "antîkurdolojî" û "kurdolojiya nepenî" bi nav dikim.

### I - Antîkurdolojî

Mebesta min ji gotina antîkurdolojîyê tahrîfkirina rastiyên li ser Kurdan û xebatên veşartina rastiyan e. Ev xebat teza dîroka resmî ye û bi kurtî ji noqteya ku kurd nikarin wek millet û zimanê wan jî nikare wek zimanek bên hesibandin dide rê û kurdan dike tirkên ku zimanê xwe ji bîr kirine. Di xebatên bi vî rengî de çarçoveya encaman ji berê de hatiye diyarkirin. Ji van yên ku hatine weşandin, dawîya dawî wekî weşanên propagandayê mane û mîna nimûneyên sextekarîya teza dîroka resmî ketine kitêbxaneyan.

Dîroka antîkurdolojiya li Tirkiyeyê ku çavkaniyên gelek dewlemend pêşkeşî lêkolînvanan dike, xwe digihîne heta serdema dawî ya Dewleta Osmanî. *Îttîhat ve Terakkî* [Yekîtî û Pêşketin] ku piştî ragihandina Meşrûtiyeta Duyemîn wê gelek salan dewlet bi rê ve bibiraya, wekî pêdiviyeke projeya wan a endezyariya civakî, nemaze jî di salên Yekemîn Şerê Cihanê de, li ser Kurdan siyaseta bişavtinê dimeşîne daku wan bike Tirk. *Aşair ve Muhacirin Müdriyet-i Umumiyesi* [Mudiriyeta Giştî ya Eşîr û Muhaciran], ji sala 1916 an û pê ve li ser Kurdan hin xebatên girîng pêk tîne û bi sedan hezar Kurd li Anatoliya Navîn û Rojava tên bicihkirin. Mudîrê vê dezgehê yê wê demê Şükrü Beg [Şükrü Kaya] paşê



Mahmut Celayir: **Seyraneke dawiya havînê 2**, akrîlboyaxa ser tûwalê, 140 x 200 cm

▶ R. 14

www.arsivakurdi.org

# Bêdadî

SERGE HALIMI

Van rojan, lîberal pirr bi hejaran eleqedar dibin. Weke mînak, li Brîtanyayê, serokwezîrê mihafezekar David Cameron'ê ku ji pêşiyê xwe, Tony Blair'ê serokê berê ye Partiya Karkeran, îlhamê digire, dixwaze bi girseyî xercên qeydiyên Zanîngehê zêde bike (1). Ev pirs tedbîreke civatî ye. Objektîf e, gelo? Xwendina bilind ku pirraniya "mişteri"yên wê ji tebeqeyên halxweş tên divê nekeve situyê hemî kesên ku bacê didin. Dewlet dixwaze teserrûfekê bike; bûrsa hejaran heye. Berî nuha bi sê salan, li Fransayê, sernivîskar Jacques Julliard berî herkesî pêşbînî kiribû ku "belaşî, piştgiriyek e ji dewlemendên ku zarokên xwe dişînin zanîngehê re. (2)" Xercê qeydiyan ên buha reformeke li ser bingeha wekheviyê ye.

Mezinbûna jêkêmiyên butçeyê dibe sedemê berfirehkirina vê mentiqê ji bo hemî alîkariyên civatî û qerekterê wan yê gerdûnî dixe ber lêpirsînê. Ger em ji alîkariyên malbatî dest pê bikin: "Ji derenceyeke[hatiniyê] wê de, mirov dibîne ku bi tenê dest davêjin 'alîkariyê'. Pereyê Dewletê li vira belasebeb tê xerc kirin", wezîrê kevn ê rast Luc Ferry ev yek dubare kir, gava ku serokwezîrê kevn ê sosyalîst Laurent Fabius heman tişt gotibû qiyamet rabûbû (3). Piştî vê sîgorta noşdariyê tê: Alain Minc, şêwirmendê Nicolas Sarkozy û herweha jî nêzîkî Martine Aubry xanimê [seroka partiya sosyalîst], weke ku xeyidî be, qesda bavê xwe dike, "ku 15 rojan li servîsa reanîmasyonê razaye" û weha didomîne "birêvebiriya herêmî ya fransî 100 000 euros ji bo mirovekî 102 salî xerc kir [...] Divê em ji xwe bipirsin daku zanibin, bi beşdarkirina mîrat û mîratxwirên nexweşan, bê çawa mirov dikare mesrefên noşdariyê yên kesên pirr pîr bi şûn de vegerîne. Ev pêşniyarî dê bi bernameyeke sosyalîst bê kirin (4)." Di encamê de, em karin bên ser mehaneya xanenişîniyê: Heftenameya lîberal The Economist li ber ket gava ku Osborne, wezîrê darayî yê birîtanî, êrîşa xwe sîstematîze kir: "li dijî prensîbê gerdûnîbûnê bûn di xwezaya sîstema civatî de heye. Diviya bû, weke mînak, mirov ji xwe re awantajên buha yên xanenişînan, ji hatiniya wan cihê, ji xwe re bikiraya armanc. (5)"

Bi vî awayî, lîberal xwiya dikin ku bala wan li ser "edalet"a piştî kêmkirina pêlik bi pêlik a bacê ji nû ve parvekirinê ye. Qonaxa wan a bê jî ji niha ve diyar e; Dewletên Yekbûyî berî tecrûba vê yekê kirine: di nav sîstemên siyasî yên çînên navendî û yên mestir de, birrîna xizmetên giştî û alîkariyên civatî gava ku tebeqeyên xwedî îmtiyaz dev ji îstifadekirina wê berdin dibe lîstika zarokan. Ew bawer dikin ku awantajên wê çandeke pê ve girêdayîbûnê û bêretiyê xwedî dike; hejmara kesên ku mafê wan heye kêm dibe; kontroleke bi kîtekît li ser wan tê ferz kirin. Girêdana alîkariyên civakî ya mercê hatiniyê ve, tê wateya programkirina wendabûna wan ya bi awayekî giştî.

1 Cameron dixwaze xerca qeydiya zanîngehan ji 3 290 sterlînî derxe heta 9 000 sterlînî ku dike (10.600 euroyî) ku ji xwe Blair hîn berî wî, di sala 2004'an de, salê ji 1 125 sterlînî derxistibû 3.000 sterlînî
2 LCI, 7'ê tirmeha 2007'an
3 Bi dorê, Le Figaro'ya di 18'ê çiriya paşîna 2010'an û Ewropa 1, 4'ê çiriya paşîna 2010
4 "Parlons Net / Li ser înternetê", France Info, 7'ê gulanê, 2010
5 The Economist, Londres, 23 çiriya pêşîn, 2010

Wergera ji fransî:Yaqûb Karademir

**Ji LMd-kurdî salnameya 2011yan!**
**Rojên taybet û girîng bi kurdî bişopînin!**



Buhayê ebada biçûk
10,5 x 42 cm: 5,00 €
(buhayê şandinê tê ser)

Buhayê ebada mezin - 29,7 x 42 cm: 10,00 €
(buhayê şandinê tê ser)

**Salnameya ku bi motîvên wênesazên bijare yên kurd hatine xemilandin, dê rojên we hîn rengîntir bike!**

# JI ÇAPEMENIYÊ

## Tirkiye û azadiya olî

Kovara hefteyî ya îngilîzî *The Economist*, di 2'yê kanûnê de gotareke li ser azadiya olî ya li Tirkiyeyê û rewşa kêmaniyên olî yên Kurdistana Bakûr weşand. Di gotara ku ji aliyê Wooing Christians ve hatiye nivîsandin de tê diyarkirin ku di sala 1915'an de, di komkujiya li dij Ermeniyan de eşîrên kurd alîkariya Osmaniyan kirine. Kovar, herweha bi devê meleyekî kurd ê bi navê Mele Hadî ku yek ji kêm kesan e ku dixwaze bi Ermeniyan re li hev bê, radigihîne ku wê demê fetwa hatiye dayîn ku bi kuştina Ermeniyan dê misilman biçin buhuştê. Şaredarê navçeya Sûrê ya Diyarbekirê Abdullah Demîrbaş jî gotiye ku ew amade ne ku bi paşeroja xwe re rû bi rû bibin daku karibin tiştan biguherînin û ew herweha bermahiyên mesîhiyan yên li Diyarbekir restore dikin.
Kovar herweha radigihîne ku kêm mesîhiyên ku niha li parêzgeha Mêrdînê mane, ji cerdevanên gundan tade dibînin ku serkêşiya wê ji aliyê Mala Çelebî ve tê kirin. Mala Çelebî, di sala 1915an de bi bêşdarbûna xwînrijandina Ermeniyan tê tewanbarkirin û serokeşîrê vê binemalê Süleyman Çelebî ji Partiya Dad û Pêşveçûnê (AKP) wekî endamê parlamentoyê hatiye hilbijartin. *The Economist*, wekî din dinivîsine ku Dêra Mor Gabrîel a Suryanî-Ortodoks, ne tenê tûşî êrîşên cerdevanan dibe, lê belê herweha zextên dewletê jî. Dewlet, erdê dêrê ku ev 20 sal in beyar e wekî daristan bi nav dike, daku erdê wan ji destê wan bigre.
Kovar, cîh dide rapora komeleyeke katolîk ya alman a bi navê Missio ku tê de tê gotin ku armanca ew dozên ku dewlet li dij dêrê vedike ew e ku dêr ji holê rabe. Komeleyê herweha gotiye ku mesîhiyên Midyadî rastî êrîşan tên û bawer dikin ku êrîşbir yan gundiyên kurd in yan jî artêşa tirk e.
*The Economist*, di dawiya gotara xwe de dibêje, her çend Yekitiya Ewropî daxwaz ji Tirkiyeyê dike ku rewşa kêmaniyên ne-misilman baştir bike û ji serokwezîrê tirk Recep Tayyip Erdoğan daxwaz dike ku tade li mesîhiyan neyê kirin. Samuel Aktaşê berpirsiyarê dêra Mor Gabrîel dibêje ku ewî heta niha li hember neheqiyê deng dernexistiye, lê belê nema bêdeng dimîne.

## Belgeyên Wikileaks û Kurd û Tirkiye

Di 29'ê çiriya paşîn de rojnameya tirk Hurriyetê belgeyên balyozxaneyên Dewletên Yekgirtî yên Amerîkayê ku ji aliyê malpera Wikileaksê ve hatibûn aşkere kirin, weşand. Di detayên belgeyan de diyar dibe ku serokwezîrê berê yê Danîmarkayê Anders Fogh Rasmussen, ji bo girtina kanala peykî ya kurdî Roj TV'yê bi Tirkiyeyê re bazarî kiriye.
Di 18'ê Sibata 2010'an de alîkarê wezîrê karên derve yê Dewletên Yekgirtî yên Amerîkayê William Burns, digel şêwirmendê wezareta karên derve yê Tirkiyeyê Feridun Sinirlioğlu hevdîtinek pêk tîne. Di vê hevdîtinê de Sinirlioğlu gazindan dike û dibêje ku Rasmussen soz daye Tirkiyeyê û gotiye ku heger Tirkiye helwesta xwe ya li hember Danîmarkayê biguherîne û piştgiriyê bide wan, daku bibin sekreterê giştî yê NATO'yê, ewê jî ji bo girtina Roj TV'yê serî li rêyên hiqûqî bidin. Lê belê Rasmussen soza xwe bi cîh neaniye û Roj TV nehatiye girtin.
Di belgeyên Wikileaksê de herweha li ser siyasetmedarên tirk gelek agahî jî têne dayîn û binavkirinên balkêş tên kirin. Di belgeyekê de tê diyarkirin ku AKP gendeliyê dike û wezîrê dewletê yê berpisiyarê bazirganiya derve û gumrukan Kürşat Tüzmen wek 'bertîlxur' tê bi nav kirin.
Di belgeyeke din de jî Bülent Arinçê alîkarê serokwezîr wekî 'kûçikê êrîşê yê Tayyip Erdogan'tê binavkirin. Herweha, li gor van belgeyan ji devê balyozê berê yê DYE'yê yê Enqereyê Eric Edelman tê ragihandin ku Erdoğan di bankayên Swîsreyê de xwedîyê 8 hesabên cuda yên nepenî ye. Edelman herweha dibêje ku AKP bi sozên dawîleânîna gendeliyê bû hikûmet, lê belê xizmên endamên partîyê, birêvebir û parlamenterên AKP ji gendeliyê sûd werdigirin.
Di belgeyeke balyozxaneya DYE'yê ya Enqereyê, rexne li siyaseta derve ya Tirkiyeyê tê girtin û tê gotin ku Enqere, li Rojhilata Navîn û Balkanan wekî Neo-Osmanî tev digere. Ev rewş ji axaftina Davutoğlu ku li Saraybosnayê kiribû, aşkere dibe. Belgeyeke din dibêje ku Tirkiye, ji bo ku vê rolê bilîze, dikare digel îslamîstan hevkariyê bike.

## Kurd, xizanî û birçîtî

Di 3'yê Kanûnê de rojnameya tirkî Radikalê lêkolînek li ser Kurdan weşand ku ji aliyê KONDA'yê ve hatiye kirin. Li gor vê lêkolînê, li Tirkiyeyê 23 dersedê Kurdan di bin sînorê birçîtiyê de û 53 dersedê wan jî di bin sînorên xizaniyê de dijîn.
Sebaret bi demografiya Tirkiyeyê lêkolînê diyar kiriye ku Kurd, bi hejmara xwe ya 13 milyon û 261 hezar, 18,3 dersedê hemû gelheya Tirkiyeyê pêk tînin. Her weha hejmara Kurdan, li gor sala 2006an qasî 3 dersedî zêde bûye.
Li ser zimanê dayîkê jî hatiye diyarkirin ku 84 dersedê Tirkiyeyê Tirkîziman, 12,7 dersedê wê Kurmancîziman û 1,4 dersedê wê jî Kirdkîziman in.
Di warê perwerdeyê de jî di navbera Kurdan û Tirkan de ferqeke aşkere heye. Rêjeya kesên ne xwenda, li cem Tirkan tenê 6,5 dersed e, lê belê li cem Kurdan 26 dersed e. Rêjeya kesên ku lîse qedandine li cem Tirkan 27,3 dersed e, li cem Kurdan jî 18,4 dersed e. Ev rêje, di warê perwerdeya zanîngehê de nîvî nîvî ye. Ango 13,3 dersedê Tirkan û 7,3 dersedê Kurdan çûne zanîngehê.
Rêjeya betaliyê ya li cem Tirkan 11,8 dersed e, ya li cem Kurdan jî 18 dersed e. Kurdên teqawitbûyî, çar caran ji teqawîtên Tirk kêmtir in. 17,1 dersedê Kurdan, di mehekê de kêmî 300 lîreyan pere bi dest dixin. Ev hejmar li cem Tirkan 4,8 dersed e. Bi gotineke din, rêjeya xizaniya Kurdan çar qat ji ya Tirkan zêdetir e. Lêkolîn, herweha diyar dike ku 36 dersedê Kurdan, di malên 6-8 kesî de dijîn û 23,4 dersedê Kurdan, di rojê de kêmî dolarekê bi dest dixin. Ev hejmar, li cem Tirkan 4,65 e ku 6 car kêmî Kurdan e.

**Le Monde Diplomatique kurdî**
Ji aliyê Independent Kurdish Media Group GmbH ve tê weşandin

**INDEPENDENT KURDISH MEDIA GROUP GMBH**
Carnotstr. 4
10587 Berlin / Almanya

**Lijneya Weşanê**
Murad Satik
Riza Dînç

**Le Monde Diplomatique kurdî**

**Redaksiyona Zimanî**
Îbrahîm Seydo Aydogan

**Alîkarên vê hejmarê**
A. Celîl Kaya
Semra Polat
Remzî Kerîm
Yado Ciwan

**Berpirsê Hunerî**
Hasan Huseyîn Devecî

**Designer**
Fabio Biasio

Tel: 00 49 (0)30 330 990 420
Fax: 00 49 (0)30 330 990 429

info@lemonde-kurdi.com
www.lemonde-kurdi.com

**ABONETÎ**
Independent Kurdish Media Group GmbH

Berliner Volksbank
Konto: 2284 123 010
BLZ: 100 900 10
IBAN: DE78 1009 0000 2284 1230 00
BIC/SWIFT: BEVODEBB

**Abonetiya Salane:**
Almanya: 50 €
Derveyî Almanyayê: 60 €
Abonetiya dijîtal: 20 €

**Le Monde Diplomatique**

**Damezrîner**
Hubert Beuve-Méry

**Birêveberê giştî**
Serge Halimi

**Sernivîskar**
Maurice Lemoine

**Cîgirên Sernivîskarî**
Martine Bulardi
Philippe Rivière
Anne-Cécile Robert

**Redaksiyon**
Alain Gresh
Mona Chollet
Pierre Rimbert
Dominique Vidal

**Birêveberê hunerî**
Alice Barzilay

**Dokumantasyon**
Olivier Pironet

**Sekreter**
Sophie Durand
Monique Salomé

Tel: 00 33 (0) 153 94 96 01
Fax: 00 33 (0) 153 94 96 26

1-3, rue Stephen-Pichon, F-75013, Paris, France

www.lemonde-kurdi.org

BELÇÎKA

# Xelkekî nenas: almanîaxêv

ALEXANDER HOMANN *

Li rojhilatê meliktiyê, nêzî sînorê Almanyayê, xelkekî baş parastî heye: şêst û çar hezar almanîaxêv, di nava neh şaredariyan de û li ser erdekî heşt sed û pêncî km² fireh de belav bûye. Tevî welatê flamanan, Bruksel û Valonyayê, Civaka Almanîaxêv yek ji çar hêmanên federe yên Belçîkayê ye, Belçîkaya ku beriya çend dehsalan hê dewleteke unîter bû. Ji ber ku statuyeke wê di destûra bingehîn de heye, parlemana Civaka Almanîaxêv bi xwe û hikumeteke wê ya herêmî heye ku bi wan dikare di mijarên gellekî cihêreng ên mîna perwerde, çapemenî, çand û herweha bi rengekî qismî di mijara kar de, qanûnan çêbike. Fransewîaxêv û hollandîaxêv li ser pirsên înstîtusyonel bi hev dikevin, belê di heman demê de weha xuya ye ku almanîaxêv jiyaneke bêserêş dewam dikin... Gelo ew ê belçîkiyên dawî bin?

Dîroka hebûna vê civaka almanîaxêv heta bi sala 1920'an diçe. Belçîka hingê ji nû ve dihat avakirin û bi pêkanîna Peymana Versailles'ê beşek ji erdên Almanyayê weke tezmînatê piştî şerê di navbera 1914'an û 1918'an de gihişt Belçîkayê. Lê belê, civaka ku bi vî rengî dibû parçeyek ji meliktiyê, têra xwe întegre nebûbû. Hê nû sala 1925'an destûra bingehîn ji bo "Belçîkiyên nû" jî derbas dibû. Sala 1962'an almanî bû sêyemîn zimanê neteweyî yê Belçîkayê ku rê li ber damezrandina Konseya Civaka Almanîaxêv vekir. Ev konsey sala 2004'an veguherî parlemana Civaka Almanîaxêv a Belçîkayê.

Fransewîaxêv û hollandîaxêv li zemînekî lihevkirinê digerin, li xaleke hevpar kurt û kurmancî, li lihevkirineke çendemîn ji bo ku bihevrejiyana dualî yan jî sêalî – lewra divê mirov herêma Brukselê ango paytextê ji bîr neke, yekane herêma duziman – digerin, di heman demê de almanîaxêv xwe ji vê meseleyê xilas dikin. Û di destê wan de qoz hene: 2.200 şîrketên ku kar didin 21.000 şêniyan. Li aliyekî em zêdebûneke bêkariyê li rojhilatê Belçîkayê tesbît dikin ku di 2001'ê de % 4.1 bû di 2010'an de bû % 8.6 (rêjeya bêkariyê nuha li Valonyayê % 13.7 e, li welatê flamanan % 7.3 û rêjeya bêkariyê ya neteweyî jî % 8.7 e), li aliyê din almanîaxêv li gorî belçîkiyên din gellekî mobîl in. Bi vî awayî 10.000 karker herroj diçin Almanyayê yan jî Dukîtiya Mezin a Luksembûrgê û tên. Bi xêra jêhatîbûna wan a zimanî, li welatên cîran, ew hevkarên gellekî baş ên potansiyel in.

Ya rastî, ji bilî statuya wan a îstîsnayî di Yekîtiya Ewropayê de, Civaka Almanîaxêv xwediyê qozekî coxrafî ye: sînorên wê yê bi Almanya, Hollanda, Luksembûrgê û herweha hemin bi herêm û civakên belçîkî re. Li ser xeta derbasbûna çandên latîn û cermanîk, ji almanîaxêvan hat ku şêwazê jiyanê yê hinan û hêzdariya yên din bikin yên xwe. Ew herweha dikarin bi rola navbeynkariyê jî rabin – li derve yan jî hundirê Belçîkayeke di bin zextê de. Erka navbeynkariyê ya di asta federal de ku melik Albertê Duyemîn sala 2008'an da serokwezîrê almanîaxêv Karl-Heinz Lambertz şahidiya vê yekê dike.

Federalîzma belçîkî dişibe avahîsaziyeke demdirêj ku wê di siberojeke nêzîk de bi dawî nebe. Bêyî ku dewleta federal zêde veguherînin qalikekî pûç û vala, dibe ku guhertinên înstîtusyonel, navendên girîng ber bi herêmên federe ve bişemitînin. Ango navê çarçoveyê hingê jî "Belçîka" be, welat wê berê xwe bide modeleke bêhtir konfederal ku qadeke firehtir a azadiyê wê bide hêmanên ku wê pêk tînin.

* Belgischer Rundfunk (BRF), Bruksel.

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

BELÇÎKA

# Di navbera lundisme û belçîkîbûnê de

ALFONSO ARTICO *

Ev potaya [neteweya pirreng] ku civakeke xeyalî diafirîne". Fîlozofê valon Jacques Sojcher bi vî rengî çandê terîf dike: çand ew e ku dike komek tevahiya tevgerên fikrî, çandî ku di wê re dibihurin, di "qalibekî pirreng û nepeytandî" de dihelîne; li gorî Jacques Sojcher, bi dana zêhniyeteke vekirî ya ku ji bo ku ji mirovan welatiyan biafirîne pêwîst e, çand divê mirovan bike hêjayî civaka tê de dijîn.

Li Belçîkayê ango labaratuwara şîzofrenîk a Ewropayê, nasname ya hê jî subjektîf, kirasê ruhekî taybet li xwe dike û bi vî rengî li her herêmê reh û rîşên xwe berdide. Valonyaya li ser çeprasta tevahiya rêyên Ewropaya Bakur, du tiştan bi hev re dijî, li aliyekî çîrokeke hê zindî (dêwên Ath'ê, berhemên şêwekar Paul Delvaux, fîgurê Tchantchès û devera Grand Hornu) û li aliyê din nifşekî nû yê hunermendan ên ku berevajî nifşê beriya xwe, êdî xwe jê venade ku ji bo hunera xwe bike, koçber bibe. Mirov dikare weke mînak behsa van kesan bike: sînemavan Jean-Pierre û Luc Dardenne (herduyan jî di festîvala filman a Cannes'ê ya sala 1999'an de ji bo filmê bi navê Rosetta xelat girtin), romannivîs Alain Barenboim, koma muzîkê ya rockê Girls in Hawaï, komediyen Marie Gillain û Yolande Moreau, aktor Olivier Gourmet...

Weha xuya ye ku dîroka valonî mişt e bi nakokiyan. Em bi lez û kurtebirî behsa vê yekê bikin... Ji sala 1831'ê û vir ve Flaman doza nasnameya xwe dikin, valon bi xwe di pîşesaziyê de çalak bûn. Piştre ev tevger berepaş bû. Sala 1937'an daxwaza ku digot çanda valonî ne weke çanda Belçîkaya mayî ye, hate zimên. "Manifestoya koma duşemê (lundi)" a ku Franz Hellens ruh pê anî, dengvedana vê daxwazê bû. Vê tevgerê fransewîaxêvî û qada bandora Franseyê derdixist pêş. Weke dijberê vê, nivîskar Pierre Mertens û civaknas Claude Javaux wê peyva "belçîkîbûnê (belgitude)" biafiranda. Herdu nivîskaran bi rengekî tinazker bal kişand ser reşbûna Leopold Sedar Senghor, Aimé Césaire û Leon Gontran Damas. Çapemeniyê jî ev peyv ji bo ku wê banal bike, bi kar anî. Mirov di navbera Xelo û Celo de dimîne çawa ye, Mertens ê endamê Club Saint Amour'ê (weke navê şerabeke nirxdar, komeke elît...) bi êşa wê zanîbû. Bi anîna cem hev a nivîskarên flaman û valon, vê klûbê xwendinên ji berhemên nivîskaran ên bi fransewî û hollandî, yên li raya giştî vekirî, organîze dikirin.

Di navbera lundisme û belçîkîbûnê de hunermendên valon demeke dirêj gellekî hewil dan xwe îfade bikin, di heman demê de li welatê Flamanan daxwazên nasnameyî her çû zêdetir bûn. Îroj bi xwe jî weha xuya ye ku li hemberî doza siyasî ya cîranê xwe, Valonya hê jî li xwe digere. Li paytexta Valonyayê Namurê, li muzeya Félicien Rops (şêwekarekî demeke dirêj li Parîsê mayî ...), Véronique Carpiaux bêyî ku vir de û wê de bike û gotinê di devê xwe de bibe û bîne, îddîa dike: "taybetbûna me valon e, belê em ewropî ne; ez xwe ewropî hîs dikim." Ji seranserê dunyayê hunermend tên Muzeya Hunera Modern û Hemdem (Mamac) a Liège'ê. Birêvebira hîperaktîf a muzeyê Françoise Safin bi hindik pereyên komkirî mûcîzeyan çêdike.

Ya rastî, tevî ku hin hewildan hene jî, fînansekirina çandê di ser Civaka Fransî re, lawaziya herêmê ye: hejmara navendên çandê sala 2004'an 109 bûn û ev hejmar sala 2009'an bû 115 (ji 12 milyon euroyan butçe gihîşte nêzî 23 milyon euroyan, butçeya ji bo sala 2010 jî 24 milyon euro ye). Navenda çandê ya Valonya-Brukselê, ya li hemberî Navenda George Pompidou ya li Parîsê, bi 2 milyon euroyan dixebite. Navend berhemên hunermendên valon, belê herweha têra xwe berhemên hunermendên "biyanî" jî pêşniyaz dike... Di heman demê de wezîrên valonî ên çandê li hemberî çandê timî dudilî bûn, lewra çand weke qada taybet tê dîtin ku lê tansiyonên di navbera daxwazên ji hev cihê yên welatiyan tên zimên. Bi vî rengî, herçend karûbarên îdarî hatin hêsankirin, ji bo sînemayê avantajên bacê û teşwîqên ji bo şanoyê hene jî, hin kes fikaran ji nebûna vîzyoneke demdirêj dikin. Dîrokzan Jean Pirotte weha hişyar dike: "çawa [Valonya] wê karibe vê pirsgirêka mezin, bi lingekî çareser bike:bi tenê xwe bispêre aboriyê û rabe, bêyî ku karibe qeraseyê sosyokulturel bi kar bîne?"

Siyaseta çandî li welatê Flamanan bi xurtî tê destekkirin, ya valonî li hemberî vê di warê sînerjiya di navbera qada îdarî ya hilbijartiyan û qada aktorên li deverê de jar xuya dike: Teşwîqa ji bo lîstikeke şanoyê çima bi tenê di nava qadeke cografî de bi nirx e? Îdarekirina fonan bi rengekî navendîkirî, xuya ye barekî giran e. Alaqe û navgîn ji Brukselê re diçin û Bruksel mêvandariya bûyerên hunerî yên herî bi prestîj dike. Derdor bixwe bi zor xwe fînanse dikin: Arlon, Dinant weke mînak gazinan dikin ku nikarin destekê bidin hunermendên li deverê. Weha xuya ye ku bi tenê Liège û di radeyeke ji vê kêmtir de Charleroi xwe ji vê rewşê xilas dikin.

Sedema fikareke din a hunermendan zêde siyasîbûna sektorê ye: "*hikumet piştî bangeke giştî ya namzetiyê ku ew bi xwe mercên wê diyar dike*, endam*ên saziyên şêwrê destnîşan dike*".

Dîsa jî, biryar û însîyatîfên hêja ye mirov pesnê wan bide, hene. Weke mînak damezrandina Komîsyona Zénobe'ê ya ku derdorên karsazan, zanyaran û "çandî" tîne cem hev. Kesê ku di damezrandina wê de pêşengî kirî wezîr Jean-Claude Marcourt – cîgirê serokê Civaka Fransî – e. Marcourt "seferberkirina welatiyan bi rêya karekî çandî" erê dike. Lê belê di çarçoveya siyasî ya Belçîkayê ya ne ewle de, projeyên demdirêj hemû vediguherin danezaneke niyetê. Bi bazarên siyasî yên mîna yên dikandaran, dem e êdî mirov tercîha xwe ya di navbera ji "wan" û ji "me" de bike. Lê belê Belçîka xwediyê erdekî berdar e ku li ser çareseriyên siyasî yên nû û hemdem şîn bibin ("lihevhatina belçîkî" a navdar ...).

*Rojnamevan.

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê



MAHMUT CELAYIR: **Ji rêzetabloyên bi navê Rêya Melîkî**

BELÇÎKA

# Nasnameya Valonî

MARC JACQUEMAIN *

Ji bo kesên ku lê dimînin Valonya çi ye? Heta bi kîjan radeyê ew girêdayî herêma xwe ne? Anketeke ku ji aliyê rojnameya brukselî ya referans La Libre Belgique (Belçîkaya Azad) ve 20'ê çiriya pêşiya 2010'an hatiye weşandin gihîştibû wê encamê ku % 4'ê şêniyên welêt xwe "di serî de weke valon" hîs dikin, li aliyê din % 25 xwe "di serî de flaman" û % 44 jî xwe "di serî de belçîkî" hîs dikin. Heke em van encaman li gorî zimanê li Belçîkayê tên axaftin dabeş bikin, wateya vê ew e ku % 40'ê hollandîaxêvan xwe serêpêşî flaman hîs dikin, belê bi tenê % 10'ê fransewîaxêvan xwe serêpêşî valon hîs dikin.

Di nihêrîna pêşî de ev hejmar fikreke belavbûyî piştrast dikin: bêguman "neteweyeke flaman" heye û dibe ku "neteweyeke belçîkî" jî hebe, lê belê di her halûkarî de "neteweyeke valon" nîne. Li aliyê din ev îmaja ku bêguman para rastiyê jî têde heye, dibe ku ser mijara girîng bigire. Serboriyek, vê yekê bi hêsanî nîşan dide: li navenda bajarê Liège'ê şêniyekî du ala bi awayekî ku baş xuya bikin li ser hev bi pencereya xwe ve kirine: dîkê valon bi vî rengî li ser rengên reş, zer û sor ango rengên alaya belçîkî derdikeve pêş. Tevahiya nasnameya herêmî xwe li wira dida der: ji bo pirraniya mezin a şêniyan pirsa gelo ew xwe "di serî de" valon an belçîkî hîs dikin zêde girîng nîne. Dema ku em ji valonan dipirsin gelo ew bi valonbûna xwe serbilind in, rêjeyên encama vê pirsê nêzî rêjeyên li welatên mîna Franse yan jî Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê ne ku kêm guman ji hebûna hesteke "neteweyî" ya li van welatan tê kirin. Lê belê yên ku dibêjin ew bi valonbûnê serfiraz in, herweha dibêjin ku ew bi belçîkîbûnê jî serfiraz in. Bi ser de jî peywendiya van hestan bi hev re heye: bi rengekî nîvekî, mirov çiqasî bi nasnameya xwe ya valon serbilind bin, ewqasî jî bi girêdana xwe ya neteweyî serfiraz in.

Beşek ji cihêbûna di navbera valon û flamanan de li nava vê peywendiya bi Belçîkayê re cihê xwe digire: yên pêşî behsa wan hat kirin valon û belçîkî ne, yên paşê behsa wan hat kirin ji belçîkiyan bêhtir flaman in. Mijar domînanzeke ku di nava herdu civakên zimanî de heye: lêkolîneke hûrûkûrtir wê bike ku nuans û xetên derzên navxweyî xuya bikin. Lê belê vê dijberiyê xwe herî baş di hilbijartinên federal ên hezîrana 2010'an de dan der: tercîha Valonan bi awayekî zelal Partiya Sosyalîst bû (gotara Olivier Bailly bixwîne) ku di nîqaşên civakî de zêde serketî xuya nake, flamanan jî serketineke mezin da NVA'yê (Nieuwe Vlaams Alliantie –Hevgirtina nû a flaman), partiyeke "flamanîaxêv" a gellekî xasûk e ku hê nû beriya duwanzdeh salekan hatiye damezrandin.

Dîroka aborî, çandî û civakî ya Belçîkayê, ji serxwebûna wê ango 1830'î û vir ve qismî van xisletan rave dike. Li gorî Valonyaya ku hema li pişt Ingilîstanê pêşengiya şoreşa pîşesaziyê dike, Welatê Flamanan ê gundî û katolîk di sedsala 19'an de herêma xizan a welêt bû. Di vê demê de cotkarên flaman bi awayekî girseyî koçber bûn, ber bi korteyên pîşesaz ên valon ve, ango ev cotkar yekemîn tebeqeya "koçberan" pêk tînin (ku îro ji Valonan nayên naskirin). Wê demê li herdu herêmên welêt bûrjûwayeke pîşesaziyê desthilatdar bû ku bi awayekî aşkere û zelal bi projeya neteweyî ya belçîkî xwe îfade dikir: ev elît ji Anversê heta bi Liège'ê ji Bruges'ê heta bi Gand'ê û Namûrê fransewîaxêv bû. Ango têkoşîna herêmparêz a flaman ku ji destpêka sedsala 20'an û pê ve xwe da der, wê bi tevahî çandî bi pêş biketa: mijar xwe azadkirina ji desthilatdariya çîneke aborî ye ku ji ber zimanê xwe weke biyanî tê dîtin. Bi ser de jî bi dîndariya xelkê asayî ne bawer e, lewra ew lîberaltir e. Dêra katolîk wê ji destpêkê û pê ve destek bida daxwaza azadbûna çandî û civakî ya flaman.

Em behsa tevgera valonî ya herêmparêz bikin; wê dê bi taybetî piştî Şerrê Cîhanê yê Duyemîn dest pê bikira û xurt bibûya. Ya rastî rêya pêşketinê qulipî: pîşesaziyên komirê û polayê bi qeyraneke strukturel re rûbirû ne, ango Valonya xizan dibe, li aliyê din welatê Flamanan ketiye ser rêya kapîtalîzmeke "bi tevahî nû", bi pêşkî pererazandina li sektorên hilgir: ango serêpêşî sektora hesin û pola ya keştiyan û hilberandina maşînan û paşê jî teknolojiyên nû. Di destpêka salên 1960'î de sorpasso pêk hat: Hilberandina Hundir a Brut (HHB) a flaman para herî mezin e. Rolên xizan û dewlemendan bi hev tên guhertin. Doza valon a di vê demê de bi taybetî xurt, hingê herî zêde xwe disipart çîna karkeran a herêmî. Sendîkavanan (ji siyasetvanan bêhtir) him doza otonomiyê dikir û him jî doza tişta ku hingê navê "reformên strukturel" lê dihat kirin, dikir. Ev "reformên strukturel" mudaxelevaniyeke zêde dibe ya hêzên dewletê bû daku pêşiyê li xirabçûna pîşesaziyê bigire. Daxwaz bi tenê bi reng û xemla xwe ango seresere çandî bû: ew fikara xwedîbûna navgînên înstîtusyonel bû daku siyaseteke aborî û civakî ya li gorî krîzê bê birêvebirin. Îronî û tinazweriya dîrokê ye ku aliyê înstîtusyonel ê vê bernameyê ango otonomiya herêmî, piştî salên 1980'î pêk hat. Ango tam di wê demê de ku di bin zexta îdeolojiya neolîberal de him li Ewropayê û him jî li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê dewra dewletê ji rewabûna xwe hat kirin û her çû ev dewr kêm bû.

Ango, tevgera valon serêpêşî weke tevgereke civakî xwe ava kir, bi awayekî berfireh bi cîhana karkeran re ketibû zikhev de û dijminê vê cîhana karkeran ne elîteke biyanî, belê kapîtalîzm bi xwe bû. Ji ber vê dîroka taybet, xisletek di nasnameya valon de maye: ew serê xwe ne bi hêzên mîrî (melîkî) ne jî bi aliyê sembolîk yê netewebûnê diêşîne. Bihevrehebûna xwezayî ya nasnameyên valonî û belçîkî ji ber vê yekê ye. Belasebeb e ku em li Valonyayê li bûyerên civakî yên ku di bin pêlên alayên herêmî de fetisîne bigerin. Flaman bi xwe berevajî Valonan dilê xwe gellekî dibijînin wan alayan.









Xisleta duyemîn a nasnameya valonî a ku mîrateya vê dîrokê ye, ji rêûresma çandî ya kevin bêhtir girêdana wê ya bi modeleke civakî re ye. Modela "sosyal demokrat" a parastina civakî ya xurt, şêwr û di heman demê de nirxpêdaneke berpirsiyariya ferdî bi hev ve girê dide. Ev model weha xuya ye ku ji aliyê civakê ve bi rengekî giştî tê qebûlkirin. Hemin rêûresm jî hene, lê diyar e ew ji herêmî bêhtir bi deverê sînordar in. Naskirin û îşaretpêkirina "çandeke valon" ya hinekî zexm, ji bo civaknasan zehmet xuya dike. Bi vî rengî, tevî ku pratîka şêwra civakî, bêyî têra xwe pevçûnê di jiyana rojane de nameşe, dîsa jî prensîba wê him di nîqaşên çepê de û him di yên rastê de him di yên patronan de û him jî di yên sendîkayan de weke referansa hevpar bi kêr tê: li ser navê modela şêwrê ye ku li Valonyayê heke hewl bê dayîn tesîra mafê grevê bê sînordarkirin, mirov prensîba mafê grevê diparêzin. Li gorî modela piştgiriya xurt pozîsyon û alî – yên carinan dijber – diyar dibin. Ev pozîsyon jî li ser mijarên gellekî ji hev cihê yên mîna siyaseta tenduristiyê yan jî sîstema bacstendina otomatîk a ji mûçeyan a ku hema bêje veguherî mijareke ku dunya alem meraq dike, lê belê weke prensîb, hîç bi awayekî yekser ji hember ve, rastî êrîşa tu aktorê girîng nayê.

Nasnameya valonî dibe ku weke ku zexm be xwe nîşan bide û di heman demê de dûrî mubalexeyên hissî û sembolîk be ku li gellek deverên dunyayê xisleta hissên neteweyî pêk tîne. Li aliyê din bi zexta globalbûnê re rûbirû mayî, mirov dikare vê nêzîkbûnê weke berhema dawî ya beriya mirinê ya dunyayeke dilhebîn binirxîne, yan jî berevajî vê, weke jêhatîbûnekê binirxîne ku wê bi kêra li pey xwe hiştina tevlîheviyan bê, yên ku weha xuya ye ku çarenûsa tevahiya civakên ewropî ne.

* Li zanîngeha Liège'ê profesorê sosyolojiyê

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

BELÇÎKA

# Gelo Valonya dê heta hetayê sosyalîst bimîne?

OLIVIER BAILLY *

27'ê Gulana 2009'an, roja çarşemê. Bûyer di weşana bernameya siyasî "Huis clos" (ji raya giştî veşartî) ya saziya Radyo û Televizyona Belçîkî ya Fransewîaxêv (RTBF) qewimî. Di nava deh rojan de hilbijêrên valonî dê hikumeta xwe ya herêmî hildibijêrin. Li gorî anketan rêjeya dengan a Partiya sosyalîst (PS) û ya Tevgera reformator (MR, lîberal) weke hev bûn.

Di bernameya zindî de him serokê PS'yê Elio Di Rupo û him serokê MR'yê Didier Reynders gellekî êrîşkar û heta qure bûn. Di Rupo tîra xwe ya êrîşa devkî tûj kir: "ji bo birêvebirina Valonyayê, ez bi MR'yê re nabim yek." Di sîstemeke hevgirtî ya belçîkî de ku ji bo dijberiyên îdeolojîk kêm meyildar e, peyama ku vê yekê dayî hilbijêran zelal e. Yekî ji me tercîh bikin!

"Hemleya" Di Rupo yê bi rastî ne di rewşeke xurt de ye. Têra xwe wêrek xuya dikir. Li navenda PS'yê birêvebiriya kampanyaya hilbijartinan êdî hêdî hêdî bi bayê têkçûnê hisiya. Çarçoveya siyasî ji bo wan xwe bi rengekî dramatîk da der. Ji sala 2005'an û vir ve skandalên li ser hev ên rayedarên payebilind derb li PS'yê dan. Lîsteya "skandalên" nû li Charleroi'yê dest pê kir; li vî bajarî jêxwarin û dizîna fonên dewletê kir ku gellek endamên meclîsa şaredariyê, kevnesenatorek, berpirsiyarên saziyên dewletê û heta serokwezîrê herêma Valonyayê Jean-Claude van Cauwenberghe ji wezîfe û erkên xwe bên bidûrxistin (2005). Piştî çar salan xelkê ev yek pirsî. Kîjan partî dikare xwe li ber demeke evqasî reştarî bigire, bêyî ku hilbijêrên wê kêm bibin?

Bersiv: Partiya Sosyalîst a valonî. Di encama hilbijartinên 7'ê hezîrana 2009'an de % 32.77'ê dengan bi dest xist, MR'yê % 23.41'ê dengan stend. Heta PS ji 97 kantonan li 53'an bi ser ket. Gelo herêma valon û PS wê heta hetayê bi hev ve girêdayî bin?

Dîrok dibe ku mirovan bixapîne jî. Ji destpêka pêkhatina herêma valon ango ji 1980'yî û vir ve PS di hikumeta federal de muxalefeta siyaseta rast e, lê herêmê bi rê ve dibe. Di dirêjahiya van salên 1980'yî de jihevdeketina sektora pîşesaziya hesin bû sedema pirsgirêkên ciddî yên civakî. Hevnivîskarê l'Encyclopédie du Mouvement wallon (Ansîklopediya tevgera valonî) dîrokzan Philippe Destatte ji bo van salan dibêje "Valonya weke cîhê liberxwedana li dijî zexteke lîberalîzasyona aboriyê xuya dikir. Ev serdema bi grevan têrûtijî, Valonyayê bi PS'yê re dike yek."

Hêmanekî din ku para wî di têkilhevbûna herêma valon û PS'yê de heye ev e: birêxistinkirina desthilatdariya siyasî û saziyên dewletê li Belçîkayê rolekî mezin didin partiyan. Ev jî dike ku siyasetzanê Navenda Lêkolîn û Agahiyên Civakî-Siyasî (CRISP) Jean Faniel bibêje, "serokên partiyan xwediyê hêza siyasî ne". Di Rupo erk û pozîsyonan li tevahiya qonaxên desthilatdariyê koordîne dike. Ew bazara hevgirtin û lihevkirina hikumetê dike, birêvebirên kabîneyê, konseyan û wezîran pêşniyaz dike... û heta navê serokwezîrê herêmê jî. Ji bo bersivê bide pirsa ka siyasetvanê herî xwedî bandor yê li Valonyayê kî ye, Faniel di navbera serokê PS'yê (Di Rupo) û serokwezîrê herêma valon (Rudy Demotte) de qet bêyî ku zêde dudil bibe dibijêre: "Elio di Rupo ye. Di Rupo bi xwe Demotte wezîfedar kir û Di Rupo dikare wî ji wezîfeyê dûr jî bixe." Ev girêdana ji nêz ve bivênevê dike ku pirsa tevlihevbûna şêwazan bê kirin. Destatte piştrast dike ku "mirov timî ji xwe dipirse ka motîvasyona *serokwezîr çi ye. Rudy Demotte xwedî hişdariyeke* bi rastî ya berjewendiya gelemperî ye, lê belê çi pê tê dema ku berjewendiyên herêmê û yên partiyê li rastî hev tên an jî bi hev re nakok in? Êdî ya dimîne, tercîha di navbera du wateyan de ye. Tu serokwezîr ji partiyê azad nîne".

Sedema îmaja Valonyayeke heta hetayê sosyalîst ew e ku bi rengekî mirovan ecêbmayî bihêle, demeke dirêj PS li başûrê Belçîkayê desthilatdar e. Di nava çil salan de ku herêm bi awayekî fermî heye, PS'yê sîh û heft salan di nava hikumeta koalîsyonê de cihê xwe girt. Û heke bobelatek neyê serê wê, ew ê herêmê heta sala 2014'an bi rê ve bibe. Naxwe, gelo li ser erdên welatê valonan nabe ku dengê partiyên desthilatdar kêm bibe?

PS li Belçîkayê di qonaxên desthilatdariyê hemûyan de cihê xwe digire (herêmî, federal û şaredarî). Ji heft bajarên mezin ên Valonyayê bi tenê li Namurê (paytext) bi ser neket. Çaryekê hilbijartiyên herêmî (endamên meclîsên şaredariyan) endamên PS'yê ne. Hema hema ji pênc şaredariyan yek bi pirraniyeke mutleq a sosyalîst tê birêvebirin. Ev qada fireh a ku PS tê de çalak e, dibe ku bibe sedema peydabûna sîstemeke bertîlê û kurtêlxwariyê, lê ew di heman demê de nêzîkbûneke gel a bi rastî jî xurt dike. Rojnamevan û çavdêrekî xwe dayî qebûlkirin ê cîhana siyasî Luc Deval weha rave dike: "gellek mirov dengê xwe didin kesekî ku nas dikin. Û li gorî mentiqa têkiliya yekser a bi gel re, PS hê jî rêxistineke tekûz e. Ew bi rengekî li ser qada siyasî ye ku pêkhatinên din, ji ber sedemên hesabê hejmara jî mabe, nikarin weke wê bikin. Di mijara têkiliyên bi xelkê welêt re kezeba mirovî *ji wan diqete, lê belê weke nûnerên bazirganiyê (şîrketan) bi xelkê re di nava têkiliyan de ne. Û ev sîstem ji nifşekî bi hêsanî û*

*baş derbasî nifşê din dibe. Nifşê nû yê berpirs*iyar, vê rêûresmê misêwa dewam dike. Min Paul Magnette li Hola Cîhana Komeleyan a li Marchienne'ê dît. Û hindik mab*û di pêşangeheke resman* a hevalan de jî y*a li pişta* kafe-bistroyekê organîzekirî, ez dîsa li rastî wî bêm!"

Di encamê de partiyê hejmara endamên xwe weke 100 000'î aşkere kir û ev hejmar ji tevahiya endamên partiyên mayî bêhtir e. Sekreterê giştî yê Federasyona Giştî ya Kar a Belçîkayê (FGTB) Thiery Bodson jî piştrast dike ku "yekîtiyên sosyalîst ên herêmî (USC) girêdaneke xurt a bi xelkê re mumkin dikin. Ez li gundekî serjimara wê 13 000 dimam û li wir 300 milîtanên PS'yê hebûn. Van milîtanan herkes nas dikir, ev yek tekûz bû." PS têkiliyên taybet bi FGTB'ê re dewam dike ku li Valonyayê hejmara endamên wê 600 000 e. Girêdanên di navbera herdu strukturan de tên destekkirin. Weke mînak FGTB di mekteba siyasî ya PS'yê weke çavdêr cîhê xwe digire. Û 29'ê gulana 2009'an ango çar rojan piştî lihevnekirina bi lîberalên li jor behskirî re, sendîkayê danezanek weşand û got "sosyalîst nebin, ji ber *ewlekariya civakî jî wê tiştekî zêde nemîne*". Gelo em dikarin behsa lihevhatineke nehênî ya di navbera desthilatdarî û dij-desthilatdariyê bikin? Bodson rewşê piçekî nerm dike: "Di partiyê de du kursiyên me hene, lê belê heke biryar li buroyê bên dayîn, ev ê bê zanîn. Ev cîhekî agahdariyê ye ku d*ivê dawî li xisleta wê ya pîroz bên anîn. Cîhek e ku agahdariyên balkêş tên standin û peyam tên ragihandin.*" Li aliyê din Faniel gumanan ji bikêrhatîbûna pêşniyazeke hilbijartinê dike: "FGTB struktureke gellekî pirreng û gellekî heterojen e. Di navê de *beşên pîşeyî û navpîşeyî xwedî xweseriyeke mezin in û ji ber vê jî bangeke siyasî* yan bê bandor e, yan jî bandora wê kêm e."

Heke ji PS'yê tê ku bi rengekî li herdeverê hebe, yek ji sedemên vê jêhatîbûna wê ew e ku dikare rûyê xwe yê ber bi der ve nû bike. Di Rupo xwe jê venade ku zilamên mîna Paul Magnette, Jean-Claude Marcourt, Jean-Marc Delizée û Jean-Charles Luperto û jinên mîna Marie Arena û Eliane Tillieux yên nayên nasîn teşwîq bike û payeyên wan bilind bike... Ev stratejî li gora daxwaza bilindkirina payeyan a kadroyan e ku ji ezmûna parkûra milîtanan a klasîk hatiye şuştin, û herweha ji bo ciwankirin, jinkirina û xurtkirina hîmên herêmî ye.

Erê desthilatdar e, dîsa jî ji partiyê tê ku redkirin û liberxwedana li dijî neolîberalîzmê bi gewde bike. Dewleta federal a belçîkî nûneriya vê neolîberalîzmê dike. Yek ji sedemên vê nîqaşê sîstema hilbijartinê ye ku hevgirtinan ferz dike. Ev hevgirtinên ferzkirî destûrê didin ku PS xwe ji siyaseta tê birêvebirin bişo. Sedemeke din jî ew e ku Di Rupo retorîkeke "çepê" nîşan dide.

PS'ya ku lîberal carinan destekê didinê, carinan weha difikire ku hawîrdorparêz û Navenda Demokrat Humanîst (cdH) – kevnepartiya sosyalîst xirîstiyan (PSC) – peykên sosyalîzmê pêktînin. Sala 2002'yan hawîrdorparêz ketin nav siyaseteke "nêzîkbûna çepan" ku kir ew bi PS'yê ve bên girêdan, di heman wextî de têkiliyên cdH'yê bi partiya gulê (PS) re gellekî koordînekirî ne. Li derdora komeleyî jî PS pêşîlêvekirin û hevgirtinên xwe zêde dike, bi rengekî weke ku li bingehên nû yên hilbijêran bigere. PS'ya bi awayekî dîrokî laîk, di bin birêvebiriya Di Rupo de xwe nêzî Tevgera karker a demokrat (MOC) kir. Heta, PS'yê Christiane Vienne, yek ji kevne-sekreterên giştî yê MOC'yê, weke wezîra tenduristî, karûbarên civakî û wekheviya derfetan a Valonyayê destnîşan kir (2004-2007).

Ango ew karê serketî ji PS'yê tê ku di heman demê de him kevin be him ciwan, him dijber û him desthilatdar, di axaftinê de çep û di kirin û pratîkê de navend-çep be: di nava lîberalkirina xizmetên dewletê de, di kontrola ecêb zêde ya bêkaran û dirêjkirina dema kariyerê pîşeyî de cîhê xwe digire. Lê dîsa jî ev partî bi xwe doza zêdekirina hin alîkariyên civakî dike, ji bo qanûnîkirina kesên bêkaxiz (qaçax) li welêt dimînin, pîvanên darîçav pêşniyaz dike daku keyfiyeta birêvebiriyê sînordar bike, herweha ji bo sînordarkirina mîqdara "lihevkirina zêrîn" û heta bacstendina ji prosedurên nukleer jî PS'yê pêşniyazên darîçav kirin.

Desatte vê pirrnasnameyîbûna partiyê bi rengekî erênî tîne zimên: "du aliyên Valonyayê hene: hîmê wê yê kevin ku xwe dis*ipêre çanda pîşesaziyê ya ku gir*êdayî sosyalîzm û sendîkavaniyê ye û çanda nû ya birêvebirina civakê tevî aboriyên cluster, biyoteknîk û hwd. Ya ku mirovan matmayî dihêle ew e ku PS li herdu aliyan e! Ew di heman demê de him parçeyekî zehmetiyan e û him jî parçeyekî veguherînê ye. Li gorî partiyên din weke ku dev ji pozîsyona xwe berdabe xuya nake (ango hevgirtî ye); zehmet e partiyên din cîhê xwe li aliyê ji bo guhertinê bigirin." Ev yek jî herweha rave dike ka ji bo çi hêzeke ji PS'yê çeptir dernakeve holê: PS her deverê dagir dike.

Tiştek zelal xuya dike: PS dê desthilatdariya xwe biparêze û pêwîstiyên wê pêk bîne. Di Rupo hewaya beriya hilbijartinên 7'ê hezîrana 2009'an bi bîr xist û rave kir ku "*gellek fikirîn ku divê PS ji tevahiya hikûmetan vekişe û di serî de ji ya federal. Ceynikên min ji vî rengê nihêrîna li tiştan diaran*. Dema mirov di nava çalakiya siyasî de ye tu caran dest jê bernade, pêk tîne. Heke *em deriyan li pişt xwe dadin, dadana deriyan 48 saetan dikişîne, û paşê derî girtî ne, dibe ku ji bo bîst salan girtî bimînin*".

Di vê demê de Belçîka bi qeyranên aborî, civakî û hawîrdorî re rûbirû ye. Bi ser de jî, jiyana li welatekî ku êdî ji hebûna xwe bi xwe jî ne piştrast e, ji bo welatiyê valonî li neewlebûna kar zêde dibe. Di vê rewşê de ev îmaja partiya "berpirsiyar" dikare mirovan qane bike. Gelo mumkin e ku mirov neewlebûnê hê zêdetir bike? Di dema guftogoyên hîpotetîk ên li ser pêkanîna hikumeteke federal (a dawî?) ku dawî li wan nayê de aktorê siyasî yê fransewîaxêv ê herî darîçav Di Rupo, her diçe bêhtir li başûrê welêt stûnekê bi gewde dike ku welat dê xwe di rewşa cihêbûnê de bisipêriyê.

Gelo Valonya dê heta hetayê sosyalîst bimîne? Navek li vir kêm e ku wisa nafikire: "Alternatîf mumkin e. Heke Reynders di 2009'an de *ewqasî êrîşkar nebûya, PS'yê bê*guman wê Valonya ji dest bida. Ango girêdan heta hetayê nîne". Li aliyê din Faniel bi bîr dixe ku sala 2007'an (hilbijartinên federal) rewşa PS'yê bi % 27'ê dengan li Valonyayê bi awayekî zelal kêmtir baş bû. Lîberalan dabû pêşiya wan. Ango guhertina valon mumkin xuya dike. Pirs êdî ew e, heke ev guhertin pêk bê, gelo ew ê bi kêr bê.

* Rojnamevan, Bruksel.

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

## Ewropa

# Pisporiya zanistî di xizmeta welatiyan de?

Jacques Testart *

Gelo daxwazên pisporiya Dezgeha Ewropayî ya Ewlehiya Xwarinan (AESA) li ser bêxeteriya riwekên transjenîk bi kêrî çi tê, digel ku hemû fikirên wê heta nuha erênî bûn û seroka wê bi lobiyeke endustriya xwarinê ve girêdayî bû? (1) Heger pisporên Rêxistina navneteweyî ya tendurustiyê (WHO) digel vaksînçêkeran têkel nebûbûna, gelo xetereya virûsa H1N1 dê bi vî rengî hatibûya nepixandin? Di rojên weha de ku lobî, her ku diçe, ji bo pesendkirina tercîhên endustriyel û nûbûnan çalaktir dibin, divê em li pisporiya zanistî bipirsin.

Sê têgehên cuda yên vê yekê hene. Têgeha herî klasîk û herî belav jî, xwestina fikira "kesên zanyar" e. Siyasetmedar pirrî caran weha dihesibînin ku ev boçûn înkar nabin, ji ber ku ji "zanyariyê" dertên. Li Fransayê, demeke kurt berê nuha, bi sazkirina Desteya Bilind a Biîoteknolojiyan (HCB), şikleke zelaltir îlan bû. Ew çembereke duyem e ku ji nûnerên zanyariyên mirovî, civakî, aborî, û komele an rêxistinên ne hukumetî (RNH) pêk tê; peywira wê jî ev e ku li pisporiya berê rohniyeke nû zêde bike. Avakirina HCB'ê di reforma Komîsyona muhendîsiya biomolekulî (CGB) de alîkar bû, lewre ku CGB bi têgeha berê hatibû sazkirin, û ji ber pisporiyên xwe yên timî alîgirên organîzmên jenetîkî yên guherandî (OJG), pirr caran rexne xwaribûn. Ev yek nakokiyan jî bi xwe re tîne. Marc Fellous, kevneserokê CGB'ê û serokê nuha yê Komeleya fransî ya biîoteknolojiyên riwekî, komeke zanyarên ku ji bo piştevaniya cotyariya endustriyalîzekirî dixebite, Dezgeha aborî, exlaqî û civakî (CEES) ya HCB'ê rexne dike ji ber ku ew *"komeleyên ku bi sedemên îdeolojîk û ne zanyarî, li dijî OJG'an in"* di nav xwe de vedihewîne, û dixwaze ku *"hevsengiyeke navbera her du komîteyan, lê di nava komîteyan de jî bên bicîhanîn. Wekî din, divê serokatî xwedan peywireke sentezê bibe"*. (1)

Ev rexne destnîşan dikin ka çawa zanyarperestî li ser dirûva rêzkirina pisporiyan bi bandor e: biryardêrekî siyasî dê her demî bêhtir guh bide ramana zanistî û ne ya CEES'ê ku gumanbarê kêmaniyên ewlehî û alînegiriyê ye.

Lê belê, gelo em dikarin bi temamî xwe bispêrin fikira pisporên zanyar, tevî ku zanîna wan tu carî têrê nake (ji ber giraniya pisporbûnê û kompleksbûna pirsan) û tehlîlên wan carina di bin bandora bawerî û nakokiya berjewendiyên aborî û îdeolojîk de ne? Heger em guh bidin wan, nûbûn daîmî ji bo xelkê tiştekî baş e, û cîhan dikare ji bo demeke dirêj sextekariyan ragire. Lê belê, divê fikirên li ser rastiya pêşketinan ji derveyî sazkerên van pêşketinan jî bên. Lewre jî, formuleke sêyem weha dihesibîne ku divê pisporiyeke berpirsiyar, nirxên zanyaran bi kar bîne, lê li gorî van nirxan neyê kirin.

Sazkirina Dezgeha Bilind a pisporî û gazincê (HAEA) dikare valahiya zanistî û welatî di navbera gotinên pisporan û biryara zagongêr de tijî bike. Saziyeke weha di 2007'ê de ji hêla Weqfa zanyariyên welatî ve, di dema hevdîtinên "Grenelleya hawirdorê" (4) de hat pêşniyarkirin, û ew anuha mijarê pêşnumayeke zagonê ye. (5) Ev komeke din a pisporan nîne, ev komîteyeke deontolojîk a pisporiyê ku peywira wî jî tarîfe û kontrolkirina şert û mercên vê xebatê ye.

Divê kiryareke exlaqî, zanyarî û demoqratîk a pisporiyê, hem guhdarê fikirên cuda, pirrpîşeyî, pirralî û zelal bibe. *Guhdarê fikirên cuda* ji ber ku teknozanyarî pîşeyekî alîgir e, û her dema ku sûd û xirabiyên nûbûnekê mijarê neraziyan in (yanî hema bêje her demê), navê pisporî bi tenê li yek fikirê guhdar bike (bi gelemperî, ya xweşbîn e), lê divê ew nîqaşekê navbera "zanistan", li hemberî komîsyoneke *pirralî* ya ji zanyarên cihê û nûnerên civaka sîvîl pêkhatî, veke. Wekî din, divê gotinên "zanist" û "zanyaran", ne weke bi tenê ji bo zemînê zanyariyên misbet bên fêmkirin, lê weke peyvên ji bo hemû zemînên zanînê derbasdar, di nêzîkatiyeke *pirrpîşeyî* de, tarîfe bibin. Pêwîst e ku tevahiya pêvajoyan *zelal* bibin jî, ji raya giştî û medyayan re vekirî, hem ji bo agahdarkirina civakê, hem ji bo xurtkirina serbixweyiya dezgehê. Weke mînak, divê nixumandina encamên pêşceribandinan, di bin bahaneya "sirraya endustryel" de, ji holê bê rakirin. (7)

HAEA dê ji bo şopandina gazincan jî, nemase di warên tenduristî û hawirdorê de, berpirsyar bibe. Bi zagona pêşniyarkirî, gazincker dê ji parastina taybet sûdê werbigrin (8) û dê tehlîla rexneyî ya qenaetên wan çêbibe. Herçî pispor in, alîgiriya wan a pîşeyî û îdeolojîk, kêm zêde her demê li ser boçûna wan bi bandor e, lewre jî divê diyar bibe ka ew ji kîjan hêlê diaxivin û pêwîst e ku zanînên din, belkî ji aliyê berjewendiyên din jî, li hemberî wan bên derêxistin. Ji bo endamên Dezgeha bilind a berpirsa deontolojiyê, îmzekirina peymaneke serxwebûnê ji xwe lazim e. Ku nakokî paşê pisporiyê dimînin, û eger rewş weha giran bibe ku hin nifûs an jî hawirdor di bin xetereyeke mezin de bin, HAEA dikare bixwaze ku Konvansiyoneke welatiyan (9) li dar bikeve; konvansiyon jî dê rayeke rohnîdar û alînegir bide.

Serhişkiya hilbijartiyan a li dijî nêzîkatiyên bi vî rengî, li ser xurtkirina demokrasiyê ya di vî warî de meriv dixe nava fikaran. Di 3'ê sibata 2010'ê de, li meclîsa neteweyî, komên meclîsê bi yekdengî li hemberî pêşnumaya zagonê ya nûnerê gel Jean Leonetti, li ser tevlîbûna welatiyan a sazkirina zagonên bîoetîkê, derketin. Lê belê, pisporî, çiqas bê kêmanî bibin jî, bi tenê dikarin berjewendiyên giştî biparêzin dema ku hukumet wan dihesibîne, bê ku di dawiyê de teslîmî stemkariya lobiyên endustriyel bibe. Lewre jî, ji bo pisporiyeke di xizmeta welatiyan de, pêwîst e ku mirov, ji destpêkê heta dawiyê, ji komên berjewendiyan haydar bibin.

* Serokê rûmetê yê lêkolînan li *Inserm*'ê, Serokê Weqfa zanyariyên welatî, http://jacques.testart.free.fr

1 Bnr. hevpeyvîna digel Jose Bove, li ser malpera www.euractiv.fr, 30 îlon 2010

2 Hevpeyvîna digel Wolfgang Wodarg, serokê Komîsyona tendurustiyê ya Konseya Ewropayê, *L'humanité*, 7 çileya paşîna 2010'an

3 Binihere: hevpeyivîna wî ya li ser malpera www.innovationlejournal.com 24 hezîrana 2010'an

4 Rêzeke civîn û hevdîtinên li derdora mijarê hawirdorê ku ji hêla Wezareta Hawirdorê ya Fransayê ve hatibûn lidarxistin. (Têbiniya wergêr)

5 Weqfa zanyariyên welatî, "Projet de loi de loi pour la déontologie de l'expertise et la protection des lanceurs d'alerte" ("Pêşnumaya zagonê ji bo deontolojiya pisporiyê û parastina gazinckeran", 22 cotmeh 2010, http://sciencescitoyennes.org

6 Bernadette Bensaude-Vincent, *Les vertiges de la technoscience (Sergêjiyên teknozanyariyê)*, La Découverte, Parîs, 2009

7 Di 2005'ê de, ji ber israrên RNY'an, dadê li ser şîrketa Monsantoyê ferz kir ku ceribandinên neyînî yên li ser mişkên ku garisa transjenîk xwaribûn, diyar bikin

8 Mekanîzmayên parêzvan ên bi vî rengî, di pirr welatan de hene (DYA, Brîtanya Mezin), lê Fransa hê jî ji wan bê par e

9 http://sciencescitoyennes.org/spip.php?rubrique124

Wergera ji fransî: Simko Destan








## YÛNANISTAN

# Piştî du salan, çi bi şoreşa ciwanên yûnan hat?

PIERRE DAUM û AUREL *



MAHMUT CELAYIR: **Karê hevrişîmê 1**, li ser qertonê



MAHMUT CELAYIR: **Karê hevrişîmê 2**, li ser qertonê

Em ji cîhê sûc, devera ku çirûska pêşî jê pekiya dest pê dikin: rêya Mîsolonjiyû, li navenda Eksarşiya rêyeke peyayan a çûnûhatina wê pirr a li Atînayê. Çend bar, dar, bi dehan ciwanên li vir û li wir û hin jê li erdê rûniştî, hêdî hêdî bîrayên xwe tamijkî vedixwin. Ne qadeh, ne qotî, ji şûşeyên 50 cl'yî vedixwin ku ji dikana di qunciké de kirrîne. "*Lewre, erzantir e.*" Li ser dîwaran hemûyan afîş, nîvîs û hin afîşên din hene. Li her deverî wêneyên ciwanekî awirên wî mîna yên melayîketan: ev wêneyên Aleksîs Grîgoropûlos in, ciwanê 15 salî ku 6'ê çileya pêşîna 2008'an ji aliyê polîsekî ve hatibû kuştin (1). Komek ciwan bi destan kevaleke reş a ji mermerê nîşanî me didin "*Tam li vê devera ha bû. Hindik ma ku du sal temam bibin*". Wê êvarê û çend rojên paşê gelo ew tev li xwepêşandanên li kolanan bûbûn yên ku gellek ji wan veguherîn şerên bi polêsan re? Ji dil bersivê didin: "*hemin! Ev demeke şahane bû! Em ji bo Aleksîs pirr xemgîn bûn û di heman demê de ewqasî jî hêrsa me rabûbû. Me hez dikir her tiştî bişikînin!*" Ya rastî ev pirs li vir ne di cîh de bû: herkes di nava van rojên dînane yên çileya pêşîna 2008'an de bû – û di şevên van rojan de jî herkes hebû ku di nava êgir de, dikanên camên wan hatî xwarê û bi gaza çavsotîner derbas bûn.

Ecêb gellekî li ser Eksarşiya hat nivîsîn! Mala anarşîstan, cîhê esrarkêşan, stara vandalîstan û hwd. ... Ji mirov wa bû ku piyê mirov bi rêyên bi tehlûke dikeve, rêyên ku şêniyên wan ciwanên reş li xwe kirî û tiryakkêş in. Lê em li pêşiya xwe xeml û neqşên rêyên piçûk ên xweşik dibînin ku di wan de bi dehan aşxane, bar, pirtûkfiroş û dikanên piçûk ên pîşekariyê hene. Gellek xwendekarên ji zanîngehên li pirr nêz tên, herweha profesor, întellektuel, hunermend, çepgir... û polêsên ku hejmara wan gellekî zêde hene: mêrên ciwan ku bi parastinên lingan, kask, demançe, cop û maskeyên gazê yên timî bi kembera wan ve ne, bihêz xuya dikin. Wezîrê sosyalîst ê parastina welatiyan Krîstos Papûtsîs sirr û raza xwe aşkere dike (2): "*Ez gellekî hez ji Eksarşiya dikim. Mixabin heke ev polês hemû nebûyana, xelkê Eksarşiyayê wê serî hildaba, vîtrînên li taxê bişikandana û cam bianîna xwarê, molotofkokteyl biavêtana û hwd. ...*" Fikrekî ku bi bayê bezê derew hat derxistin. Petros yek ji şêniyên taxê gotinên wezîr sererast dike: "*Ev bi tevahî ehmeqane ye! Tu kes li vir naxwaze dikanan xira bike. Ev polês li vir in daku dorê li taxê bigirin û pişta bûrjûwayan rast be ku "vandalîst" di bin kontrolê de ne*". Kitekiteke giring a cografyaya Atînayê: Kolonakî ango taxa herî dewlemend a navenda bajêr, ji "çînên bi tehlûke" yên Eksarşiyayê bi tenê bi rêyekê veqetandî ye. Di çileya pêşîna 2008'an de ev rê ango rêya Asklîpiyû hat derbaskirin û bûtîkên luks ên Kolonakiyê jî armanceke tercîhkirî ya xwepêşandêran pêk dianî. Îroj ev rê bi serî ve tijî polês e.

### Sazkirineke siyasî ya nû ya çepa radîkal… û têkçûyina di hilbijartinan de

Du salan piştî van bûyeran, gelo ji ber vê enerjiya gellekî xurt a dijber a ciwanên yûnan çi ma? Endamê Antiyeksûsiyastîkî Kînîsî – AK, *Tevgera Dijdesthilatdariyê*, yek ji gellek hêmanên anarşîzma yûnan, Vangelîs weha bersivê dide: "*him tu tişt ji ber nema û him jî gellek tişt.*" Bi gotina wî "*çend baxçeyên kollektîf û dehek avahiyên dagirkirî*" li Atînayê. Li hejmara 66'an a rêya Themîstokleyûsê ya li Eksarşiyayê, Vangelîs tevî hevalên xwe avahiyeke piçûk bi rê ve dibe ku têde barek, saloneke dersên zimên ji bo penaber û koçberan û cîhekî konferansên li ser anarşîzmê heye. Du rêyan dûrî wir parkeke kevin a wesaîtan, şêniyan ji nû ve bi dest xist û veguherandin baxçeyekî piçûk ê botanîk ku lê dezgeheke vexwarinê ya xwebixwe bi rê ve dibe heye. Guhertineke din: tiryakkêşên bi salan e qada piçûk a li navenda taxê dagir kiribûn, ji aliyê komeleyên welatiyan ve bi alîkariya komên anarşîst a carinan bi şîddet, ji deverê hatin dûrxistin. Ew niha 300 metroyî dûrî wir li ser rêya Tosîtsa dimînin, di navbera Polytechneio (zanîngeha teknolojîk) û muzexaneya arkeolojîk de. Qada piçûk bi xwe ji nû ve bû navenda komeleyî û şevê ya Eksarşiyayê. Ev hemû ji bo vê bû? Vangelîs bi bayê bezê lê zêde kir: "*lê belê beriya her tiştî, vê yekê hêvî bi me re çêkir ku utopyayên me dikarin pêk bên!*"

Çend sed metroyekî dûrî wir, ketina zanîngeha hiqûq û aboriyê bi bandrolên fireh hatiye girtin: "*ji kêmkirina nirxê dîplomayên me re, na!*" Her sendîkaya xwendekaran li wir dezgehek bi cîh kiriye û hewl dide endamên nû çêke. Aleksîs Lîkûdîs endamê sendîkaya çepa radîkal EAAK'yê (Eniaia Aneksartîtî Arîsterî Kînîsî, *Tevgera Yekbûyî ya Çepa Serbixwe*) ye. Çileya pêşîna 2008'an di xwepêşandanên li kolanan de wî bi qêrîn digot "*polês, beraz kujer*", li zanîngeha xwe ya dagirkirî radiza û beşdarî civînên giştî hemûyan dibû. Nûçegihanê taybet ê *Le Monde*'ê portreyekî wî nivîsîbû û ew di vî portreyî de "*weke neynika van ciwanên yûnan hemûyan ên ku kortejan çêdikin û xwepêşandan û meşan li dar dixin*" didît (3). Ji hingê ve gelo çi bi Aleksîs hat?

"*Di çileyê 2009'an de moralê me hinekî kêm bû. Me dixwest hikumet bikeve. Lê belê, bi lez, gellek karê me bikirana hebûn. Xwendekarên ku me qet nedîtibûn ketin nava sendîkayê. Xelkê di kollektîfên cîran de dest bi têkoşînê kir. Çileya pêşîna 2008'an bi rastî jî derfeta perwerdeyeke siyasî ya ciwanan afirand.*" Hema piştre, wê gavê, rêxistineke nû ava bû, Antarsya (Antîkapîtalîstîkî Arîsterî Sînergasiya giya tîn Anatropî: *Çepa Antîkapîtalîst a Hevkariya ji bo Têkbirina* Sîstemê) (4), di navê de troçkîst jî ji hatina cem hev a deh hebek komikên çepa radîkal pêk tê. Ji bo ku derfeteke siyasî ji têkoşîna bajarî re biafirîne, Antarsya'yê deh mehan paşê di hilbijartinên giştî de ... % 0.4'ê dengan bi dest xist. Syrîza (Synaspîsmos tîs Rîzîkîs Arîsteras, *Koalîsyona Çepa Radîkal*), koalîsyoneke din a çepa radîkal a kevintir e ku ji % 4.6'ê dengan bi dest xist û li parlemanê kursiyek ji xwe kêm kir. Aleksîs bêyî ku aciz bibe lê mikur tê: "D*em ji vê yekê re dive. Em gav bi gav bi pêş dikevin*".

Pişt re qeyrana yûnan da der. Tevahiya sala 2010'an bi grevên karker û karmendan û xwepêşandanan derbas bû. Tevahiya ciwanên Eksarşiyayê bêguman tev li van xwepêşandanan bûn, lewre li vir, çawa ku Krîstîna ya 26 salî mîmara ciwan a bêkar jî rave dike, herkes pê bawer e ku "*memorandûma*" di navbera Papandreû, Fona Pereyan a Navneteweyî (IMF) û Yekîtiya Ewropayê (YE) de hatiye mohrkirin "*dek û dolabeke nû ya kapîtalîzmê ye daku deynekî bi çînên jêr ên xelkê bide dayîn ku ev çîn ne berpirsiyarê vî deynî ne*". Xwepêşandan bi xwe, ji bilî ya 5'ê gulanê, timî bi mirovan ne mişt û himhimî bûn. Profesora psîkolojiya civakî li zanîngeha Panteion a Atînayê, Kseniya bi kelecan ji bo xwepêşandana 5'ê gulanê dibêje: "*Wê rojê, heta hingê hê min qet evqas mirov li kolanan nedîtibûn, harîqulade bû! Carekê, komekê dest bi qêrînê kir:* 'bila bişewite mîrata parlemanê!' *Û tevahiya girseyê ev slogan bi qerînê got. Ez şerm dikim bêjim, lê min bi qêrîn ev tişt got!*" Û hevala wê, birêvebira beşekê li wezareta aboriyê, Mariya van gotinan li peyva wê zêde dike: "*Ha va ye, ya diqewime ev e, dema ku mirov li kolanan bi qêrîn dibêjin bimire Parleman!*"

### Ev pêncî sal in ku desthilatdarî di destê du malbatan de ye

Ciwanên Eksarşiyayê pirrî caran tev li van xwepêşandanan bûn, lê belê gelo ew nûneriya nifşê xwe dikin? Ev yek hîç misoger nîne. Lewma ji bo ku mirov bi rastî rewşa derûnî ya ciwanên yûnan hîs bike, divê ji vê taxa geto, dûr bikeve. Tevî ku ciwanên wê yên zêde polîtîzebûyî û komên wê yên anarşîst dikarin di demên qeyranê de hêzeke girîng pêk bînin jî, Exsarşiyaya ku çapemeniyê weke hesindizekî xurt dikişîne, Yûnanistan nîne.

Her êvar barên li Psîrî, Monastîrakî û Gaziyê ku çend sed metroyekî li bakurrojavayê Akropolê ne, ji mirovên ji derdorê tên, mişt dibin. Giyorgos, Hara, Panos, Elena, Efthîniya, Mîxalîs, Peter û Lalîn hemû "çileya pêşîna 2008'an li kolanan" bûn. Ji bo ku qadehên piçûk ên rakomeloyê vexwin li ser maseyê rûniştine. Rakomelo meyek e ku di nav hingiv hatiye dakirin û germ di surahiyekî de îkrama wê tê kirin. Ev ciwan fikrên xwe bi kelecanê derdibirrin. Panos dibêje: "tevahiya dibistana min daketibû kolanan. Min jî da dûv wan". Efthîniya bi tenê "du rojan" tev li xwepêşandanan bûye, weke pirraniya hevalên xwe. Panosê xwendekar û saetê ji bo sê euro û nîvan garsoniyê dike, xwe ji bîr dike û dibêje: "*ji bo ku em nîşan bidin em li vir in, em hene. Lê belê vê yekê tu tişt neguherand! Timî heman gû ye! Ez pê dizanim ku ez ê kar peyda nekim. Li Yûnanistanê ji nîv sedsalekê û vir ve desthilatdarî di destê du malbatan de ye, mesele hemû ev e.* (5) *Ma hûn navê demokrasiyê li vê yekê dikin?*" Cîranê wî li gotinên wî zêde dike: "*hîletê min ji dê û bavên min û dapîr û bapîrên min diçe, lewre wan dengê xwe da van mirovan!*" Ji bo van ciwanan hemûyan memorandûm "*pirr zêde tevlihev e!*" Bêyî ku hewl bidin der barê naveroka wê de serwext bibin, ew pê bawer in ku ev peyman "*wê di bertîlxwarina bi salan e ji aliyê Pasok û ND'yê ve hatiye organîzekirin tu tiştî neguhere*" (6). Di 2010'an de yek ji wan jî tev li xwepêşandanan nebûye. Lalîn vê yekê weha rewa dike: "*Êdî gellekî bi tehlûkeye mirov dakevin kolanan. Û bi ser de jî ez li dijî şîddetê me*". Hevala wê Efthîniya li axaftina wê zêde dike: "*Sendîka bi her awayî firotiyî Pasok'ê ne!*" Yek ji wan jî ne endamê rêxistinekê ye. "*Muzîka me û hevalên me hene, û hew!*"

### Plana tedbîran, ma em dikarin çi li dijî wê bikin?

Çend kîlometroyan li bakur (7), li taxa Kîpselî, li ser rêya Fokiyonos Negrî bi dehan qahwexane û taverna hene, piyê tûrîstan qet bi wan nakeve. Bi tenê şêniyên taxê diçine wan, çînên navîn, karmendên dewletê yên piçûk û dikandar û herweha zarokên wan. Elena, Dîmîtrîs, Panos, Nîna, Dzîna, Elenî û hevalên wan bîrayekê vedixwin – "*yeke bi tenê, lewma bîra gellekî buha ye*" – û li dawiya maçeke fûtbolê temaşe dikin: vê êvarê Panathînaykos bi Paniyoniyos re dilîze, du komên mezin ên fûtbolê ên bajêr. Pirraniya wan tev li xwepêşandanên çileya pêşîna 2008'an nebûne. Dîmîtrîs weha dipirse: "*Aleksîs di encama qezayekê de mir: ji bo çi ez ê daketima kolanan?*" Panos îdîa dike ku "*partiyên siyasî mirina Aleksîs bi kar anî, daku êrîşê bibin ser hikumetê. Min nexwest bikevime nav vê lîstikê*". Bi tenê Elena li xwe mikur hat ku tev li xwepêşandanan bûye, "*Lê bi tenê rojekê, paşê min şîddeta vandalîstan dît û ez veqetiyam*". Sala 2010'an yek ji wan jî tev li xwepêşandanên li dijî plana siyaseta hişk a butceya dewletê nebûye. Jitaqetketî weha ji xwe dipirsin: "*hikumetê û Yekîtiya Ewropayê biryara vê planê dan, ma em dikarin çi li dijî wê bikin?*" Û hinan ji wan bi vî rengî li van gotinan zêde kir: "*Çi dibe bila bibe, ev deyn gunehê me hemûyan e. Îroj divê em vî deynî bidin.*" Çavên wî li televizyonê (Panathinaykosê hê nû bi 2 - 1 da pêşiyê) Dzîna bawer dike ku "*çapemenî ji bo hikumetê kar dike*". Mijara sohbeta me ber bi dawiyê ve hat ser koçberan: "*gellek in, divê hikumet wan bike der!*"

Mamosteyê zanîngehê yê beşa antropolojiya civakî ya zanîngeha Panteionê, Raniya Astrînakî piştrast dike û dibêje "*rast e ku pirraniya ciwanên 2008'an di 2010'an de daneketin qadan. Di 2008'an de tevlêbûna wan a xwepêşandanan û heta şîddetê gellekî xurt bû, û digihişte tebeqeyên civakî gişan. Lê belê em îroj hê jî bi tevahî pê nizanin bê ka motîvasyonên wan ên cewherî çi bûn*". Û sibe? Hatina cem hev a ciwan û mûçegiran ku di çarçoveya heman serhildanê de bûbin yek, gelo ev yek mumkin e? Di teoriyê de xuya ye ku gellek şertên ku bikin ev yek mumkin be, hatine cem hev. Li aliyê ciwanan pirsgirêkên sala 2008'an hê jî dimînin û heta xirabtir bûne: nirxê dîplomayan

www.rojnamekurdi.org

kêm e, kesên xwediyê dîplomayan dema ji zanîngehê vediqetin, karên baş peyda nakin, tişt buha dibin, polês hê jî xwe êrîşkar nîşan dide, "mûçeyê herî kêm ji bo ciwanan" êdî heye û sînorê wê 592 euro ye û ji dê û bavên xwe hindiktir pereyan distînin, lewma bandora xirab a siyaseta hişk a butceyê ya dewletê li dê û bavan bi xwe jî bûye. Lewre ji havîna 2010'an ve tesîrên van tedbîran dest pê dikin xwe baş didin hîskirin.

Li her deverê li ser rêyan, li ser camên dikanên girtî yan jî li ser deriyên avahiyan heman nivîsa li ser kaxizên zer heye: ENOYKIYAZETAY (bi kirê ye). Prîma rêûresmê ya tîrmehê ku weke mûçeyê meha sêzdehan ên li gellek welatên Ewropayê ye, îsal nedan karmendên dewletê. Buha zêde dibin, yê benzînê euroyek û nîvê zêde bû û ev yek xelkê welêt trawmatîze dike. Di sektora taybet de şîrketan dest pê kir dikan û kargehên xwe digirin yan jî peymanên xwe yên kar ên giştî di ber çavan re derbas dikin. Profesorê aboriyê û birêvebirê Înstîtûya Kar a GSEE'yê (Genîkî Sînomospondiya Ergaton Elladas, *Konfederasyona Giştî ya Karkerên Yûnanistanê*) sendîkaya sektora taybet, Savas Robolîs vê îdîayê dike: "em *baş* pê dizanin: sala 2011'an wê ji bo Yûnanistanê berbad be. Dawiya sala 2011'an hejmara bêkarên reel wê ji milyonekê bibihure ango bigihêje % 20'an, ev rêje di 2009'an de % 15.5 bû". Bi ser de jî tu kes ji rewabûna tedbîrên sererastkirina bacstendinê ya hikumetê ferz kirî, bawer nake ku bi dewixandina mejiyê mirovî re hat birêvebirin. Şîara dewixandina serê mirovan jî weha ye: "*gunehê me hemûyan e*", bertîlxwarin, karên ne li rê, hevalgirtin, deyn û hwd. gunehê me hemûyan e. Nivîskar Takîs Theodorapûlos (8) weha li sûcdaran aşkere dike: "*Ne bi tenê misêwa nelirêbûna sîstema komkirina bacan heye, lê belê herweha têkiliyên di asta herî jor de tevlihev di navbera kesên hikumetê bi rê ve dibin û çendek malbatan de hene ku bi xêra karê bi dewletê re yên di sektorên çekan, ragihandin, barguhêziya deryayî û enerjiyê de gellekî dewlemend bûn. Ev malbat qet nayên kontrolkirin, lê li aliyê din dewlet bela xwe ji welatiyên piçûk venake, yên ku hewl didin 300 euroyekî li xwe zêde bikin û deynin aliyekî daku weke* Fakelakî (9) *ya ku di demeke man û nemanê de bide doktorê xwe.*

## Tu dezgeh nînin ku bikarin nerazibûna civakî veguherînin ser muxalefeteke polîtîk

Di vê navberê de gellek astengiyên mezin pêşiyê li çûyina ber bi serhildaneke gel ve digirin. Beriya her tiştî, hê jî gellek yûnan ji bilî xaniyê lê dimînin xwediyê daîreyekê ne ku didin bi kirê yan jî erdekî wan ê piçûk heye. Ev Milk dibe ku demekê ji bo kêmkirina bandora krîzê bi kêr bên. Di warê siyasî de gellekî zêde parçebûna çepa radîkal li pêşiyê asteng e ku tevgereke girseyî ya gel bê afirandin. Li aliyê çepê yê Pasok'ê em dikarin heta bi şêst rêxistinên siyasî bijimêrin! Kevnexwendekarê mîmariyê li zanîngeha Polytechneioyê û endamê OKDE-Spartakos'ê (Organosî ton Kommûnîston Diyethnîston Elladas, *Rêxistina Komunîstên Navneteweyî yên Yûnanistanê*) baskê Înternasyonala IV. ê yûnan, Manos Skûfoglû weha poşmaniya xwe tîne zimên: "*nerazîbûna civakî dibe ku zêdetir bibe, belê tu avahiya jê bên vê nerazîbûnê veguherîne têkoşîneke siyasî nîne.*" Pîanîsta şanoya doza anarşîzmê, Marîna li xwe mikur tê: "*Çiriya pêşî ya 2009'an min dengê xwe da Syrîza'yê. Lê belê hêvî bi min re nehiştin. Dev jê bernadin, hema di qirika hev de ne û devjeniyê dikin. Êdî bes e*".

Li aliyê sendîkayan rewş ber bi immobîlîzmê ve (ji tevgerê ketin, tevizîna tevgera civakî) diçe. Sendîkavaniya yûnan, ya rastî bi tenê xwe li dora du konfederasyonan bi rêxistin dike: GSEE (Genîkî Sînomospondiya Ergaton Elladas, *Konfederasyona Giştî ya Karkerên Yûnanistanê*) ji bo sektora taybet û Adedy (*Anotatî Dioikîsî Enoseon Dîmosion Ypallîlon*, Birêvebiriya Bilind a Yekîtiyên Mûçegirên Sektora Dewletê), ji bo sektora dewletê. Herdu jî ji aliyê kadroyên bihêz ên PASOK'ê ve tên birêvebirin. Ew bi tu rengî bi tevahî betalkirina memorandûmê naxwazin, îdîa dikin ku bi organîzekirina xwepêşandan û grevên giştî hewl didin zorê li hikumetê û IMF'yê bikin daku zehmetiya plana siyaseta hişk a butceya dewletê nerm û kêm bikin.

Taybetmendiyeke yûnan a zêde heye, hebûna partiyeke komunîst (KKE, Kommûnîstîko Komma Elladas, Partiya Komûnîst a Yûnanistanê) ya hê xurt e (10) – di hilbijartinên giştî yên herî dawî de % 11'ê dengan bi dest xist – û bi rengekî tundrew li dijî tevahiya hevgirtinên bi hêzên çepê re ye. Sekretara giştî ya KKE'yê Aleka Paparîgavê (11) yekê weha rave dike: "*Heke em hevkariyê bi GSEE'yê û Adedy'yê re bikin, ev ê bibe xiyaneteke sûcdar li dijî tevgera karker, nexasim nuha ku herdu jî ya ji destê wan tê dikin daku karker tedbîrên hov û xeddar ên hikumetê qebûl bikin, bi rêya qebûlkirina fikrê, ev tedbîr neheq in lê belê pêwîst in.*" Di dema xwepêşandanên mezin de herkes baş guhdarê xwe bû ku bi yên din re tev li hev nebe: dema ku GSEE'yê û Adedy'yê banga kombûna li qada Omoniyayê dikir, KKE'yê ji bo xwepêşandanê meydana Syntagmayê dineqand û komên çepa radîkal rêya Patîssiyon ya ne dûrî anarşîstan hildibijart.

Hêmanekî din ê vê mamika bersiva wê zehmet a yûnan, girîngiya derdorên anarşîst e ku piştî Spanyayê ya herî xurt a Ewropayê ye. Endamê sendîkaya anarşîst Rossi'yê, Yannîs Andrûlîdakîs îdîa dike ku "*serhildanên sala 2008'an ên ku anarşîstan têde pêşengiya şîddetê dikir, kir ku tevger bi awayekî zêde bi lez mezin bibe ku li tevahiya welêt hejmara alîgirên tevgerê ji 5.000'an bigihîje 10.000'an.*" Bi parastina "*şîddeta li dijî şîddeta dewletê*" kêfa tevahiya civaka çep bi rengekî taybet jêre tê (12). Lê belê hebûna wan weke kêreke herdu devê wê jî tûj e: dema ku hin kes dikarin karûbara serhildaneke gel a ber bi îsyanê ve bikin, yên din ku ji bo wan tu sînorê şîddetê nîne, dikin ku xwepêşandêr ji ber kirinên wan ên kujer birevin. Weke Lalîn û hevalên wî yên ji Psîriyê, gellek ciwan êdî hew diçin xwepêşandanan "*lewre ji* kûkûloforiyan [ev kesên "rû nixumandî" yên ku camên dikanan tînin xwarê û molotofkokteylan diavêjin, nota redaksiyonê] *û gaza çavan dişewitîne ya ku polîs diavêje wan, ditirsin*".

Du salan piştî serhildanên çileya pêşîna 2008'an, siberoja rêya yûnan wê bidin ber xwe rê li ber peydabûna pêşbîniyên li hev nakin, vedike. Mîna aborîzan Kostas Vergopûlos, hin kes difikirin ku "*rewşa civakî li ber teqînê ye*, [û ku] *bûyereke mirov ne li bendê biqewime wê weke çirûskekê bike ku agir bigire herdeverî!*" Beriya van bêje Vergopûlos plana IMF'yê weke "*xelekeke şeytanî, bi nav kir, lewma bi kêmkirina hatina maddî ya xelkê, kirrîna berheman jî tê kêmkirin ku şirketan neçar dike îflas bikin, rê li ber bêkariyê vedike û kêmbûna hatina maddî zêdetir dike û hwd.*" Hineke din pirr fikaran dikin, weke nivîskar Takîs Theodorapûlos ê ku ditirse "*şêwazekî şîddetê yê nayê kontrolkirin a herkesî li dijî herkesî*". Marînaya pîanîst jî vê fikarê par ve dike: "*ez bi rastî jî ditirsim faşîzm xurt bibe. Ne dûrî Eksarşiyayê, li taxa Agiyos Pandeleymonayê komên rasta radîkal li ser rêyan êrîşî koçberan dikin*".

Îroj hema bêje herroj mûçegirên hêrsa wan rabûyî dadikevin qad û kolanên Atînayê, lê bêyî ku ji wan bê dengekî hevpar ê têra xwe xurt ji nava lodê daxwazan bidin der: ajovanên rêyan, hilberînerên mîwe û heşînayiyan, doktorên ciwan ên ku pereyên wan nehatine dayîn, karmendên wezareta sporê, xebatkarên weşanxaneyeke deriyên xwe kilîtkirî û hwd. ... Hikumet bi xwe bi polêsan dorgirtina parlemanê û tevahiya navenda bajêr firehtir dike ku êdî veguherandiye keleheke dorlêgirtî. Xwendekareke li Eksarşiyayê rewşê weha analîz dike "*Papandreû dizane ku xelk nikare barê plana siyaseta hişk a butceya dewletê hilgire. Ew dixwaze wan bitirsîne û tevahiya daxwaza wan a protestokirinê ji dest wan bigire*".

* Yek jê rojnamevan, yê din jî illustrator (şêwekarê pirtûk, rojname û kovaran) e.

1 Bixwîne: Valis Kaimaki, "Pereyan didin banqeyan, lê gava ku ciwan tên… fîşekan diyarî wan dikin", Le monde diplomatique, çileya paşîna 2009'ê

2 Ev wezareta ku bi karê polîsan alaqedar dibe, berê bi ewlekariya giştî ve dadiket. Gava ku çiriya pêşîna 2009'an dîsa desthilatdarî bi dest xistin, sosyalîstan got ku ew navê vê wezaretê bi armanca ku polîsan û xelkê li hev bînin diguherînin. Piştî vê jî ekîbine din bi navê Dias ava kirin ku ji polîsên bi motorsîklet pêk tên (du kes in, yek diajo û yek lê dixe) û ev polîs li nava bajêr digerin

3 "Alexisekî din", Elise Vincent, Le Monde, 18 çileya pêşîna 2008'an

4 Antarsya herweha tê wateya "serhildan, îsyan û raperînê" jî

5 Li hêla rast, Karamanlis ji sala 1955'an ve ye ku li ser Nea Demokratia (ND) ne. Li hêla çepê jî, ev 70 sal in ku sê nifşên Papandreu li desthilatdariya tevgera sosyalîst in

6 Pasok: Panellimio Socialistiko Kinima, tevgera sosyalîst ya hemû Yûnanistanê. ND Nea Demokratia, demokrasiya nû

7 Atîna car caran ji Parîsê firehtir e û nêzî nîviyê nifûsa welêt vedihewîne ku ji 11 milyona kesan 5 milyon li paytextê dijîn

8 L'invention de la Venus de Milo, Sabine Wespiesser, Paris, 2008

9 Di sîstema tendurustiya Yûnanistanê de, êdî bûye adet ku yê nexweşjî ji cem xwe heqdestê doktoran bide û heger bixwaze baş muayene û tedawî bibe, ev adet êdî ferz e

10 Serkevtina wê bi berxwedana wê ya li hember nanîzmê ve dikare bê girêdan, lewre ji ber qurbaniyên ku di dema şerrê sivîl de (1946-1949) dane û ji ber qehremaniyên ku li hember dîktarorên leşker kiribûn, xatirê wê li cem xelkê heye. Radîkalîzma hin pêşniyarên wê bala ciwanan dikişîne weke mînak, dixwaze ji Yekîtiya Ewropî û ji sîstema euroyê derkeve û êrîşî sîstema gendeliyê dike

11 Ew pirr kêm hevpeyvînan dide, lê belê bi awayekî awarte qebûl kir ku bersiva pirsên me bi awayekî nivîskî bide

12 Weke konsera piştgiriyê ya ji bo yekî ji wan (Simo Seikidi ku piştî ku molotofek avêtibû otobusa polîsan hatibû kuştin), bi beşdariya pênc hezar kesî, roja 26'ê îlonê li Atînayê li dar ket

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê



MAHMUT CELAYIR: **Karê hevrişîmê 3**, li ser qertonê



MAHMUT CELAYIR: **Karê hevrişîmê 4**, li ser qertonê



MAHMUT CELAYIR: **Karê hevrişîmê 5**, li ser qertonê



MAHMUT CELAYIR: **Karê hevrişîmê 6**, li ser qertonê

www.arsivakurdi.org

ÎRAN Û AMERÎKAYA LATÎN

# Ne dostanî, ne dijminahî, bi tenê berjewendî

NIKOLAS KOZLOFF *

Çileya pêşîna 2009'an, enstîtûya lêkolînan *Latin Business Chronicle*'ê diyardeyek xiste ber ronahiyê ku di pirraniya organên medyayê de nehatibû nirxandin. Ji 2007'ê heta 2008'an, bazirganiya di navbera Tehran û Amerîkaya Latîn de sê caran zêdetir lêhatibû û gihiştibû 2,9 milyar dolaran: ango meblaxeke pirr mezin ji bo danûstandinên bazirganî ku berî destpêka desthilata Mehmûd Ehmedînecadî, 3'yê tebaxa 2005'an, hema bêje qet nebûn.

Sala 2004'an, bazirganiya dualî di navbera Îran û Venezuelayê de kêmek ji yek milyon dolaran zêdetir e; piştî du salan, xwe li 51 milyonan dide. Di vê navberê de, Îranê li mala partnerê xwe yê karayîbî binkeyên îmalata bisîklet, trextor, trimbêl û çîmentoyê çend beramber zêdetir kirin. Di demekê de ku Karakasê gellek kêmasî hene di warê şarezatî û teknolojiyê de, Tehran hevkariyê pê re dike di hewlên wê yên endûstriyalîzasyonê de, bi taybetî di amadekirina şîr û hilberîna petrokîmyewî de… Herçend ji ber qeyrana navneteweyî, sala 2009'an, bazirganiya di navbera van du welatan de bi qederê 33,8% daketibe jî, Caracas û Tehranê her di heman salê de li hev kirin ku banqeyeke hevpişk a geşedanê damezrînin û qederê 70 rêkeftinên nû yên hevkariyê girêbidin (ku hejmara hemû rêkeftinan digihe 300'an). Bi her halê heyî, her du welatên navhatî ji xwe hewl û hêza xwe dikin yek di OPEC'ê (Rêxistina welatên îxrackerên petrolê) de ji bo bilindkirina nirxê kûra petrolê ku bernameyên civakî yên her du welatan jî xwe dispêrine bazirganiya petrolê. Nîşaneya lêknêzîkbûna her du welatan: ji sala 2007'an ve, heftiye carekê perwazek heye di navbera her du paytextan de ku wan bi hev ve girê dide.

Ji serê derwazeyê venezuelî pê de, têketina Îranê bo nav Amerîkaya Latîn her peyttir û qewîtir dibe. Di navbera 2007 û 2008'an de, Ekvador ji rêza heftê hat û gihişte rêza sêyê di nav partnerên bazirganiyê yên Îranê de li herêmê (piştî Brezîlya û Arjantînê). Di demekê de ku îthalata Ekvadorê di nava salekê de ji 0,01 milyon dolaran hildikişe 168,2 milyon dolaran, Quito di sala 2008'an de dibe bazara serekî bo berhemên îranî li Amerîkaya Latîn. (1) Îran bi firotinê qayîl nabe, herweha qewl dide ku bi firawanî veberhênanê jî bike li welatî, bi taybetî di sektorên enerjî, hîdroelektrîk û petrokîmyayê de. Serokdewletê Ekvadorê Rafael Correayê ku gellek şanaz bû bi seredana xwe ya bo Tehranê di çileya pêşîna 2008'an de, zêdetir ji 25 rêkeftinên du-layenî îmze kirin daku aboriya her du welatan bêtir nêzîkî hev bibe. Sala 2009'an, ticareta wê ya bi Îranê re bi %91,7 daket, lî bi vî rengî, Ekvador, piştî Venezuelayê, kete rêza çarem di nava partnerên bazirganî yên Tehranê de li Amerîkaya Latîn. Lê belê, ev welatê piçûk hêj jî li pêşiya Meksîkayê ye (rêza şeşem). Îranê ji bo veberhênanên xwe yên li Amerîkaya navendî yek milyar dolar terxan kirine û di vê çarçoveyê de dê li Nicaraguayê lîmaneke li avên kûr(le port en eau profonde) ava bike û herweha deyn bide welatê navhatî ji bo avakirina binkeyeke duristkirina enerjiya hîdro-elektrîk. Li Bolîvyayê, Tehran dixwaze alîkariyê bike ji bo çêtir emelkirina xaza xwezayî. Herweha amade ye beşdariyê bike di wan lêkolînên pêşekî de li ser çavkaniyên berfireh ên lîtyûma (2) herêmên Andê.

Lê belê, halê heyî, % 94'ê danûstandinên di navbera Îran û Amerîkaya Latîn de –sercem 2,4 milyar dolar di sala 2009'an de– digel Arjantîn û Brezîlyayê ne. (3) Brezîlya –ku xwedanê bazareke 200 milyon kesî ye û xwedanê aboriyekê ye ku sêkiyê [ji sêyan yek] Hasilaya xeyrî-safî ya navxweyî (HXN) ya herêmî di destê wê de ye– herweha tenya welat e ku sala 2009'an jî bazirganiya wê digel Îranê zêdetir kir (+ % 4, piştî + % 80 di 2008'an de), û gihişt 1,297 milyar dolaran. Ev hêj pirr kêm e : di serdana Mehmûd Ehmedînecad a Bezîlyayê de, Ehmedînecad û Luiz Inacio Lula da Silva li hev kirin ku heta 2014'an danûstendinên xwe yên bazirganî bigihînin 10 milyar dolaran bi saya *"hewlên karsazên her du welatan"*. (4)

Lê belê, xuya ye ku vê valsa dolaran, piştî cîbicîbûna hindek sazkariyên îdarî awazê xwe peyda kir. Chávez neh caran çû Tehranê, herweha Tehranê mazûvanî li Correa, Luiz Inácio Lula da Silva, Evo Morales û Daniel Ortega jî kir –bi rêzê serokdewletên Ekvador, Brezîlya, Bolîvya û Nikaraguayê– ku hemûyan bersiva nezaketa mazûvanê xwe da. Ji bilî sefaretên heyî li Arjantîn, Brezîlya, Kuba, Meksîka û Venezuelayê, Ehmedînecadî sefaretên nû vekirin li Bolîvya, Şîlî, Kolombiya, Nicaragua û Uruguayê. Li rexê xwe ve, Bolîvyayê tenya sefareta xwe ya li Rojhilata Navîn, ji Qahireyê bar kir Tehranê.

Derbirîneke kêm û kêmas e ku mirov bêje ev danûstandin li Washingtonê cihê nerzaîbûneke mezin in. 11'ê çileya pêşîna 2009'an, Hilary Clintona wezîra karên derve ya Dewletên Yekgirtî, îxtar dikir ku her çi lêknêzîkbûna digel Îranê *"fikreke pirr xerab"* e, lewre Tehran *"piştgiriya terorîzmê dike, terorîzmê bi pêş ve dixe û dişîne derve"*. Clintonê muxatabên xwe yên nenavkirî hişyar dikirin û digot : *"heke hindek bixwazin flortê digel Îranê bikin, çêtir e ku pêşiyê baş li ser netîceyên vê yekê bifikirin. Dewletên Yekgirtî hêvî dike ku ew* [yên ku digel Îranê flortê dikin] *dê du caran li ser vê xalê bifikirin"*. Lê Ehmedînecad vê lêknêzîkbûnê bi tenê wek encamên braderiyeke durist dibîne, lewre weha kurt lê dixist di 24'ê çiriya pêşîn a 2009'an de : *"di têkiliyên xwe yên bi dostan re em tu tixûban nas nakin"*. Digel vê hindê jî, herçend ev têkiliyeke *"dostanî"* jî be, ev pendê pêşîneyan cewherê rastî yê xwezaya têkiliyê rohn dike : *"dijminê dijminê min dostê min e"*. De em binêrin ka bi rastî jî wisa ye. Sala 2002'yan, Chavez ji derbeyeke leşkerî filitî ku li jêr aqilmendî û piştgiriya Washingotonê bi rê ve çûbû. Sala 2009'an, Correa bû binas û armanca hêrs û xezeba Qesra Spî ji ber biryara xwe ya nûnekirina îmtiyaza binkeya leşkerî ya amerîkayî ya Mantayê (li ser erdê welatê xwe) ku 18'ê çiriya pêşîn a 2009'an bi dawî dibû. 5'ê tebaxa 2010'an, serokdewletê Bolîvyayê diyar dikir ku Dewletên Yekgirtî *"li behaneyên wekî terorîzm û narkotrafîkê digere"* daku têkeve Amerîkaya Latîn û cext lê dikir ku *"armanca bingehî di vê dexaletê de ew e ku DYA dixwaze saman û çavkaniyên me yên xwezayî bixe jêr dest û desthilata xwe"*. (5) Bêguman DYA nerihet û bifikar e li ber siyaseta hikumetên çepgir ên latîn-amerîkayî ku hewl didin tesîr û nufûza aborî ya şirketên pirr-neteweyeî kêm bikin (carinan dudiliyê lê nakin ku wan biqewirînin jî) û serweriya neteweyî teqez bikin di warê samanên xwezayî de. Li rexê xwe ve, Tehran pê dizane ku di bernameya Dewletên Yekgirtî de pîlana êrîşbirina ser Îrana heye ku xwediyê sêyemîn mezintirîn rezervên petrolê ye (6) ku ji xwe amîral Michael Mullen di 1'ê tebaxa 2010'an de ev yek bi aşkereyî diyar dikir.

Di van şertan de, wisa diyar e ku siyaseta derveyîn ya rêveberên Amerîkaya Latîn gefa tepeseriya Dewletên Yekgirtî zêde bi ciddî nagire, lewre Chavez xwe û hevkarên xwe wek *"gladyatorê(n) antî-emperyalîst"* û *"hevrêyê(n) têkoşînê"* dibîne. Li rexê xwe ve, Ehmedînecad di hezîrana 2009'an de weha aşkere dikir mentiqa di bingehê siyaseta xwe ya derveyîn de : *"Di demekê de ku welatên rojavayî hewl didin me veder bikin û bi tenê bihêlin, em çûn ketine dû piştgiriya [welatên li] pişthewşa DYA'yê"* (7).

DYA'yê fîloya IV'emîn ku di sertaserê peravên Atlantîkê yên Amerîkaya Latîn re derbas dibe, dîsa bi kar xist. Bi hejmareke zêde binkeyên wê yên leşkerî hene li Amerîkaya Latîn û li ser hidûdên Îranê. Caracasê hay ji vê yekê heye û lewma biryarê digire ku bernameyên xwe yên hevkariya leşkerî digel Tehranê berfirehtir bike, bi taybetî di warê perwerdekirina personelan û îmalkirina çek û alavên şerrî de. Nîsana 2009'an, wezîrê parastinê yê Îranê Mustafa Muhammed-Necar aşkere dikir ku *"amade ne her cûre piştgiriyekê bidin ji bo duristkirin û çakkirina şiyana leşkerî ya Venezuelayê di nava çarçoveya rêkeftinên parastina dualî de"*. (8) Bêguman yek ji sebebên vê hevkariyê ew e ku Dewletên Yekgirtî razî nebû çekan bifiroşe Venezuelayê, lê belê, Bill Samiiyê lêkolînerê ji Navenda tehlîlên analîzên deryayî ya Virginiayê wisa bawer dike ku *"Îran hewl dide hevsengiya jeopolîtîk digel Dewletên Yekgirtî vesaz bike"*, ango bi awayekî dibêje : *"Em jî dikarin bên û hespê xwe bibezînin li ser erdê goşeya we ya dunyayê"*. (9)

Hevgirtina "antî-emperyalîst" ne tenê bi qada leşkerî ve sînorkirî ye. Herweha şermezarkirina wan "manewrayan" jî tê de ye ku li mala hevpeymanan diqewimin û ku ihtimal e tesîrekê li wan bi xwe jî bikin. Bi vî rengî, hevpeymanan hewlên DYA'yê yên têkdana hevsengiyê li Îranê di dema hilbijartinên binavûbang ên munaqeşebar de şermezar kirin. Diyar e bi vê mentiqa behskirî bû ku di hezîrana 2009'an de, Brezîlya, Nicaragua, Ekvador, Bolîvya û Venezuelayê –ku li van welatan çavdêrên navneteweyî hergav şanaziya xwe derbirîne li pêş şefafiya hilbijartinan– bê şert û merc piştgirî dane Ehmedînecad di dema hilbijartinên serokdewletiyê de li Îranê ku DYA'yê bi rengekî qet'î birêveçûna hilbijartinan şermezar kiribû. Chavez heta wê dereceyê çû ku bêyî ku delîlekê dabîn bike, îdia kir ku CIA'yê dexalet di hilbijartinan de kiriye û nerihetiya xwe derbirî li pêş vê yekê. Lêkguhorîna nezaket û rêzgiriyê : çepa latîno-amerîkayî ku nelihev û neyar e digel şûrê Qesra Spî û li jêr êrîşên tevgerên muxalefetê yên li welatên xwe ne –ku pirraniya wan meyldarên Washingtonê ne–, 7'ê adara 2009'an, bi gotinên Correa, serfiraziya xwe derdibirîn ku Îran bûbû "dost û hevpeymanekî" wan. (10)

Lula da Silvayê kêmtir "radîkal", agirê "antî-emperyalîst" yê bereya xwe siviktir dike. Ji xwe Lula da Silva şanaziya xwe derdibire ku hem digel George W. Bush û hem jî digel Chavez li hev dike. Lê belê, digel vê hindê jî, Dewletên Yekgirtî payeya xwe ya partnerê bazirganî yê serekî yê Brezîlyayê ji Çînê re hişt. Brezîlyaya ku qît û qewî ye bi mezinbûna aboriya xwe ya rebît, hewl dide dengê xwe di civata neteweyan de bide bihîstin : Lulayê ku nema dide dû mentiqa mexsûs bi xeleka "Elizabeth Arden" a dîplomasiya edetî ya brezîlî (ku bi tenê bala xwe dida Roma, Parîs, London û Washingtonê), êdî berê xwe daye welatên başûrî ji bo bidestxistina piştgiriya navneteweyî (û ji bo bidestxistina kursiyekê di Konseya Ewlekariyê ya Neteweyên Yekgirtî de) ku ji bo welatê xwe çav li bin kutan e. Bêguman, rêya vê yekê di wê hindê re derbas dibe ka Brezîlya dikare şiyana xwe ya berhelistîkirina digel Bakur nîşan bide an na.

Di vê çarçoveyê de, gulana 2010'an, Lula da Silva, bi piştrgiriya serokwezîrê Tirkiyeyê Recep Tayyip Erdogan, alternatîfek bi pêş xist li hember mueyyideyên Neteweyên Yekgirtî yên li dijî Îranê: rêkeftinek bo pevguhorîna ûranyûm û sotemeniya nûkleer. Wê heyamê, Elî Ekber Salehiyê serekê Rêxistina enerjiya atomî ya Îranê û herweha cîgirê serokwezîr, diyar kiribû ku bo cara yekem, aşkere bûbû ku êdî divê welatên rojavayî têbigihin ku *"welatên li ser rêya geşedanê jî dikarin mafên xwe biparêzin li ser sehneya navneteweyî bêyî ku wan pêdivî bi hêzên mezin hebe"* û bi weha bi dawî kiribû axavtina xwe: *"Pejirandina vê yekê zehmet e ji wan re"*. (11)

Bêguman, çalakvaniya wan bi têkçûnê bi dawî hat, lewre Brezîlyayê, di 10'ê tebaxa 2010'an de, ew mueyyîde pesend kirin ku Konseya ewlekariya Neteweyên Yekgirtî li dijî Îranê biryar pê dabûn. Bi ya parêzvanên wê, vê hewlê heta dereceyekê perspektîfa boçûneke kêmtir li jêr tesîr û kontrola Washingtonê dabîn kir û, di heman demê de, piştrast kir ku mafê her neteweyekê ye ku bernameya xwe ya nûkleer a sîvîl bi rê ve bibe, ango mafê ku Chavez û Lula da Silva ji bo welatê xwe dozê lê dikin.

Bi qasî ku xuya ye, ji xwe Xatûn Clinton bi aşkereyî radigihîne, hevgirtineke jeopolîtîk a bi wî rengî pirr zehmet e piştgiriyeke aborî ji aliyê Washingtonê wergire. Bi dîtina serok Correa, *"siyaseteke derveyîn ya hevaheng"*, piştî qutbûna pêwendiyên bazirganî digel Dewletên Yekgirtî, divê bikeve hewla *"vekirina bazarên nû, girêdana temasên nû, bicihkirina pêwendiyan digel welatên ku bi xweşbînî û hevbîr li pêvajoya latîno-amerîkayî dinihêrin"*. (12) Diyar e ev "hevahengî"ya vê hevkariya jeopolîtîk e di bingehê zêdebûna bazirganiya di navbera Îran û Amerîkaya Latîn de, lewre bi ya Pervîz Davudiyê yekemîn cîgirê serokdewletê Îranê, *"aboriyên Îran û Amerîkaya Latîn dikarin hev û du bihêz bikin"*. (13)

Hindek kesên mîna kandîdatê serokdewletiya Îranê Mîr-Huseyîn Mûsevî jî bi rexê xwe ve diheyirin ku *"li şûna ku razemeniyê li welatên cîranên Îranê bike, hikumet radibe hemû wext û hêza xwe dide ser rijandina pere li welatên Amerîkaya Latîn"*. (14) Diyar e nabînin ku veberhênanên Îranê li Amerîkaya Latîn dihêlin ku Îran sîstema xwe ya aborî bi rengekî azad, û tevî mueyyîdeyên aborî yên li ser Tehranê, saxlem û piştrast ragire, bi taybetî jî di van sektorên endûstriyê yên pêşketî de : senayiya balafirsaziyê, emelkirina petrol û xazê, îmalata trimbêlan… Ehmedînecadî ji bo bazarkirina trimbêlan reklamvanekî bêqusûr peyda kiriye ji xwe re : Chavez. Navborî van heyamên dawî derheqê başiya modêleke îranî de ku li Venezuelayê tê çêkirin û firotin, bi navê Cantauro, weha axivî: *"ev wesayiteke pirr bi qalîte û erzan e (…) Bihayê wê nêzîkî 76 000 bolîvar in* [13 400 euros]. *Heke we bivê modêleke mîna wê bikirin, bo nimûne Toyota Corolla, hûn ji 162 000 bolîvaran* [28 500 euros] *erzantir bi dest naxin… Ferqê dibînin ? Du caran jê zêdetir !"* (15) Reza Hamzehlouyê midûrê Şirketa bazirganiya petrokîmyayî ya Îranê, 18'ê çiriya paşîn a 2010'an, tevî ku ne dilniya ye jî ku dikare pişta xwe bispêre bazirganên ewqas behredar –lê belê ji ber pêdiviya *"zêdetirkirin û cihêrengkirina bazarên xwe"* têketiyê–, şanaziya xwe derdibirî ku du muşteriyên potansiyel ên nû peyda kiribûn : Brezîlya û Arjantîn. (16)

Diyar e, li ser bingehê gotineke wisa, gellek xwezayî be ku îro Îran xwedanê statuya çavdêriyê (17) ye di Hevpeymaniya bolîvaryen ji bo gelên Amerîkaya me (ALBA) ku welatên Bolîvya, Ekvador, Venezuela û hindekên din bi xwe ve digire. Lê belê ALBA xwe bi hevkarî û rêkeftina dîplomatîk û aborî bi sînor nake. Ji cerga avabûna xwe, hemû hêz û hewla xwe daye ser parastina proje-siyasiyeke azadiya civakî ku kêm bernameyên siyasî heta niha

doza azadiyeke ewqas berfireh kirine. Reng e nakokiyên herî beloq ên hevkarî û hevpeymaniya digel Îranê di vî warî de aşkere dibin ku ji xwe rastgirên Amerîkaya Latîn bi têra xwe îstîfadeyê jê dikin.

25'ê çiriya paşîna 2009'an, heynê seredaneke Ehmedînecad a li Caracasê, nûnerên muxalefetê ku li dor Koordînasyona yekîtiya demokratîk (MUD) berhev bûbûn, xwepêşandanek bi rê ve birin : bi yekdengî digotin, *"şert e rêz li hemû benî-ademan bê girtin, li jinên îranî, li jinên Venezuelî û li hemû mirovatiyê"*, û weha lê zêde dikirin : *"Li vir, me bawerî bi demokrasiyê tê, bi yeksaniya mafên jin û mêran"*. (18) Nakokî ? Li Venezuelayê, tu caran bi qasî piştî destpêka desthilatdariya Chavez pêşketin çênebûbûn di warê mafên jinan de.

Bo cara yekem, destûra 1999'an karê bermaliyan wekî karekî biheqdest nas dike. Deqa destûrê herweha her çi awayekî cudakarî û tacîza cinsî li dijî jinê şermezar dike û yeksaniya jin û mêran li kargehan wek şert destnîşan dike. Bi heman rengî, halê hazir projeyeke yasayê tê munaqeşekirin ku heta 12 heftiyan îcazeyê dide kûrtajê –lê belê rêveberiya Chavez hêj nekariye vê sazkariyê bide pejirandin. Brezîlya endamê ALBA'yê nîne ; lê belê dîsa jî pêşketinên di warê mafên jinan de ku di nav van çend salên dawî de hatine bicihkirin, qet ne kêm in. Dîsa jî heyama kampanyayên hilbijartinên serokdewletiya Brezîlyayê xuya bû ku civak û çîna siyasî ya brezîliyayî, bi pirranî, li dijî kûrtajê ne. Sala 2004'an, yasayekê li partiye-siyasiyan mecbûr kir ku sedî sî ji kandîdatên wan ji jinan pêk bên. Herweha, yasayên Brezîlyayê ferqan danayne di navbera jin û mêran de : li aliyê Îranê rewş weha ber bi başiyê ve naçe, berevajî Amerîkaya Latîn, Îran di vî warî de her bêtir bi paş dikeve.

Tehran dixwaze pirr-jiniyê bîne, ango bihêle ku mêr di heman demê de bi du an zêdetir jinan re zewicî bin, lê belê diyar e fikra wê hindê nake ku çepera vê yasayê fireh bike ku jin jî bikarin bi du an zêdetir mêran re bizewicin. "Polîsê exlaqê" yê rejîma Îranê, wan keçên ciwan destgîr dike û tundiyê li wan dike ku tenya guneha wan geriyana bi hezkiriyên xwe re ye. Gava bi sedan kes kom dibin daku roja cîhanî ya jinê, 8'ê adarê, pîroz bikin, ajanên polîsan, bi cilûbergên sîvîl, bi jop û tîrikan didine ser girseya xwepêşandêr.

Bi pêçevane digel têgihiştina belave ku belê Amerîkaya Latîn hêj jî xwedanê çandeke maçîst û homofob e, li herêmê pêşketinên girîng pêkhatin di vî warî de. Herçend homoseksuel hêj jî tûşî cudakariyan bibin jî, Brezîlya yek ji xweşbîntirîn welatên Amerîkaya Latîn e. São Paulo "parade gay"a [meşa geyan] herî girîng a li cîhanê bi rêk dixe ku her sal bi milyonan kes beşdariyê lê dikin. Hindek welatên herêmê izinê didine zewaca homoseksuelan. Herweha, Dilma Rousseffa serokdewleta nû ya Brezîlyayê her wekî Jose Serra, reqîbê wê yê serekî di hilbijartinên çiriya paşîn a 2010'an de, mafê zewaca homoseksuelan diparêzin. Sala 2008'an, Uruguayê û paşê jî Ekvadorê destûr dane paksa [peymaneke medenî di navbera du kesan de, mîna zewacê, ji bo parastina berjewendiyên hevbeş ên kesên ku bi hev re dijîn] di navbera homoseksuelan de.

Hetta Kuba jî di vî warî de pêş dikeve ku li Kubayê heya heyamên dawî jî gellek caran homoseksuel dihatine destgîrkirin, hepskirin û dibûne qurbaniyên cudakariyên cûr bi cûr. Mariela Castroya keça serokdewlet Raul Castro, ya ku rêvebera Navenda neteweyî bo perwerdeya cinsî ye, wisa bawer dike ku "nasname û meyla cinsî mafekî mirovî ye" (19) û doza wergirtina ra û piştgiriya bavê xwe dike di vê meseleyê de. Tevî vê, ji ber muxalefeta Dêra katolîk û pareke hikumetê, mecbûr ma dest ji soza xwe ya yasayîkirina paksa homoseksuelan bikêşe.

Arjantînê di hezîrana 2010'an de zewaca kesên ji heman cinsî bi yasayê pejirand û bi vî rengî bû yekemîn welatê latîno-amerîkayî ku yasayeke weha qebûl kir. Li hember muxalefeta Dêra katolîk, serok Cristina Kirchnerê di rexneyên xwe de *"serdema engîzîsyonê"* bi bîr dixist. (20) Li rexê xwe ve Ehmedînecadî li Îranê aşkere kir ku *"homoseksuelî li dijî tebîetê mirovî ye"*.

Gava mirov di perspektîfa Bolîvyayê re li meseleyê binêre, hevpeymaniya Bolîvya û Îranê cihê heyirînê ye, lewre Moralesê ku li esl û binyadê xwe yê Aymara xwedan dibe, berevajî Ehmedînecad, hergav mafê kêmîneyên li welatê xwe parastiye. Ehmedînecad siyaseteke tepeserkirina wan kêmîneyên etnîk ên eyaletên li qeraxên welatî da ber xwe ku bi têkdana nizama li welatî dihatine tawanbarkirin. Bi vî rengî, li Îranê, Kurd, Ereb, Turkemen, Azerî, Belûcî û kêmîneyên din ên ne-fars nêzîkî nîvê nufûsa welatî ne. Bo nimûne, li nav Belûciyan navîniya temenê mirovan û rêjeya xwendewariyê gellek nizmtir e ji navîniya welatî.

Di warê mafên karkeran de jî dîsa nakokiyeke bi heman rengî xwe dide der. Li Amerîkaya Latîn, hikumetên çepgir di babetên şertên karkirinê û naskirina mafên mûçegiran de, bi rêje û dereceyên cuda, rewş gellek baştir kirine. Lula da Silva û Morales her du jî berê endamên sendîkayên progresîst bûn. Li Îranê, hikumet muameleyeke pirr xerab dike bi tevgerên civakî û sendîkayan re. Lewma, gava şifêrên otobêsan li Tehranê dest avêtine grevê ji bo derbirrîna nerihetiya xwe ji şertên karkirinê, hêzên ewleyiyê ew bi hejmarên zêde destgîr kirin, û bi vî rengî, 23'ê adara 2009'an, bûn binasê protestoya karkerên brezîlyayî li ber Jûra bazirganiya îranî-brezîlyayî.

"Hevpeymaniya" şert û berjewendiyan di navbera Îran û Amerîkaya Latîn de li ser bingehê nakokiyên siyasî bi rê ve diçe, lewma, herçend li rûyê jeopolotîk ve hewl û boçûneke mentiqî jî be, nakokiyên destnîşankirî dibe ku pêdaçûn û berfirehbûna hevpeymaniyê bixine xeterê. Amerîkaya Latîn ku hewl dide hovîtî û zêderoyiyên dîktatorên xwe yên salên 1960 û 1980'yan bixe ber ronahiyê, bi çavekî xerab li helwêsta Îranê ya digel muxalefeta xwe dinêre: bo nimûne, piştî çalakiyên hilbijartinên 2009'an, bi hezaran xwepêşander hatibûne hepsîkirin. Li Tehranê gellek asayî ye ku kombûn û xwepêşandanên aştiyane yên dijberan an jî jinan bi awayekî hovane bêne serkutkirin.

Bi heman rengî, beyanên Ehmedînecad ên derbarê qirana cihûyan de li wî aliyê Atlantîkê dibin sebebê nerihetî û hêvîşkestinan. 22'yê çiriya paşîna 2009'an, gava serokê Îranê bi seredaneke resmî çû Brezîlyayê, çalakvanên homoseksuel, nûnerên civata cihûyan û saxmayên ji tehcîrê, li ser plaja Ipanemayê, li Rio de Janerioyê li hev kom bûn daku hatina Ehmedînecad şermezar bikin… Ji vê yekê xerabtir : beyanên rêveberê îranî keresteyê êrîşkirinê dane destê muxalefeta Venezuelayê, lewre rayedarên muxalefetê diyar dikin ku Chavez diçe destê hevpîşeyê xwe yê îranî û lewma *"ew bi xwe jî"* antîsemît e.

Li ber vê dîmenê, tu kes ji xwe napirse ku gava Barack Obama destê serok Lula digire û jê re dibêje *"siyasetmedarê herî xweşdivî li ser rûyê dunyayê"* (21), bi vê yekê piştgiriya xwe nîşan dide ji bo siyaseta brezîlyayê ya qedexekirina kurtaja ne ji ber sebebên tenduristî. Gelo heta dereceyekê kawikî nîne ku mirov pê biheyire ku hikumetên çepgir xwe nêzîkî wan welatan jî dikin ku cîhanbînbîniyên wan ji hev cuda ne ? Ji xwe li vê meydanê pragmatîzm/faydexwazî hertim li kar bûye : çi pêwendiyên di navbera Yekîtiya Sovyetê û wan welatên erebî de bin ku qirana komûnîstan radikirin, çi ew pêwendî bin ku Çîna Maoyî tîne ba Şîlîya Pinochet, an jî bila hevpeymaniya Dewletên-Yekgirtî ya digel Erebistana Suûdî be. Ev gotina Lord Palmerstonê serokwezîrê Keybanû Victoriayê (ji 1855'ê heta 1858'an û ji 1859'ê heta 1865'an), herî zêde li şanê siyaseta derveyîn dikeve: *"tu hevalên min nînin, tu dijminên min nînin, her ez im û berjewendiyên xwe"*.

* Rojnameger

1 "Latin America: Iran Trade Triples", *Latin Business Chronicle*, Coral Gables (DYA), 2 çileya pêşîna 2009'an

2 Lîtyûm metalek e ku di çêkirina bateriyan de, bi taybetî di bateriyên trimbêlan de, tê bikaranîn. Bolîvya xwediyê nîvê rezervên lîtyûmê yên li hemû dunyayê ye

3 "Brasil-Iran Trade Grows", *Latin Business Chronicle,* 6'ê çiriya paşîna 2010'an

4 "Iran-Brazil trade will amount to dlrs 10bn in five years", *Iran trade news,* Tehran, 12'yê çileya pêşîna 2009'an

5 "Evo denuncia a Washington por los ataques a Sudamérica", *AFP*, 6'ê tebaxa 2010'an

6 "US Military Chief Admits to Iran Attack Plan", *AFP*, 1'ê tebaxa 2010'an

7 "Israel and Iran compete to expand influence in Latin America", *The Sunday Times*, London, 12'yê çiriya paşîna 2009'an

8 Danielle Kurtzleben, "Alliance Problematic for the U.S., But Not Threatening", *Inter-Press Services*, 10'ê tebaxa 2009'an

9 Bi neqlkirina Brian Ellsworth tê de: "Latin America warms to Iran amid anti-U.S. sentiment", *Reuters*, 29'ê tebaxa 2007'an

10 "Ecuador destaca inversión iraní y china en desarrollo de proyectos", *Hoy*, Quito, 7'ê adara 2009'an

11 "Le Brésil et la Turquie demandent au Conseil de sécurité de l'ONU de ne pas sanctionner l'Iran", *AFP*, 20'ê gulanê

12 *Hoy*, *h. b.*

13 Beyana 21'ê çileya pêşîna 2008'an, li Tehranê

14 "Ahmadinejad foreign policy 'rattled' Iran foes", *Presstv.ir*, 25'ê tebaxa 2009'an

15 "Chávez: 'Los coches iraníes son mejores que los Toyota'", *El Mundo*, Madrid, 24'ê hezîrana 2010'an

16 "Iran targets South America for petchem exports", *Tehran Times*, Tehran, 18'yê çiriya paşîna 2010'an

17 Her wekî Haîtî, Paraguay, Uruguay û, piştî seredana Chávez bo Şamê, çiriya paşîna 2010'an, Sûriye jî

18 Lenny Durán û Anna Teres Pozzolungo, "Gobiernos de Venezuela e Irán sellan pacto contra imperialismo", *El Tiempo* (Venezuela), 26'ê çiriya paşîna 2009'an

19 Luisita Lopez Torregrosa, "In Latin America, a Harbinger of Women's Rights", *The New York Times*, 27'ê tîrmeha 2010'an

20 Tom Hennigan, "Argentina legalises gay marriage", *The Irish Times*, Dublin, 16'ê tîrmeha 2010'an

21 "Obama: Lula Is 'Most Popular Politician On Earth'", *The Huffington Post*, 2'yê nîsana 2009'an

Wergera ji fransî: Ergîn Opengîn

## CEZAYÎR

# Bajarvanî: şerrekî Cezayirê yê din

ALLAN POPELARD û PAUL VANNIER *

Piştî seet 20'an, bajarê Cezayirê dimire. Berkarên qehwexaneyan kursî û maseyan ji kepiran radihêjin; dukandar perdeyên dukanên xwe digirin. Di valahiya navenda bajêr de, bi tenê barajên polîsan hê jî dimînin, ew ajotvanan kontrol dikin. Terora salên reş, yên erebeyên bombebarkirî di kolanan de û teqînên li ber sînemayan, hê jî di hemû bîran de ye. (1) Bajar hîn di bin rewşa awarte de dijî û kombûn û li hev civîn qedexe ye. Heçî rawestandina îslamperestiyê, dewlet hin daxwaziyên wê pejirandin, daku wê bêhtir kontrol bike. Li Cezayirê, di navbera salên 2006 û 2008'ê de, hezar û du sed dukanên alkolfiroş bi biryara îdarî hatin girtin. (2) Her ku diçe, şûn û warên giştî kêm dibin. Hêdî hêdî, qada kêf û xweşî ya tenê dibe hindûrê xaniyan. Li ser şaneşînan, antênên satelîtê xuya ne.

Helbet, aşxaneyên erzan hê jî mahalleyên navenda bajêr yên weke Bab El Oued an Belcourt'ê geş dikin. Lê belê, bi hatina şevê re, bi tenê otelên mezin û qlûbên bijarte yên taxên dewlemend vekirî dimînin. Wî çaxî, bi tenê burjuwazî dikare kom bibe; wê bi xwe qadên xwe yên kêfê - û ferdî - îlan kirin. Li Sîdî Yahya'yê, di binê taxa zengîn a Hydra'yê de, dukanên navdar û eywanên qahwexaneyên şêwazdar li cem hev rêz dibin ku kurr û keç tê de dikarin hev û du bibînin - kepirên navenda bajêr û mahalleyên gelî, hema bêje, ji bo mêran veqetandî ne. Bi riya înîsyatîvên ferdî, ev cîhê çemê miçiqî ku beriya demeke kin, bi tenê çend xaniyan tê de hebûn, bi seranpê hatiye guhertin. Sîdî Yahya weha ji bo ciwanên zengîn ên Cezayirê bûye cîhekî hevdîtinê yê bijarte. Herçî taxên gelî, ew berdayî tên hiştin. Kasbah jî nîşan û pêşana vê bêhaliyê ye.

Navenda dîrokî ya bajarê Cezayirê ku di sala 1992'ê de li mîrata dunyayî ya Unesco'yê qeyd bû, anuha diherrife. Komên ber û keviran şûna avahiyan girt. Îskeleyên înşaatê, gelenderên maddenî, çarçoveyên ji darî çêkirî, piştevaniya dîwarên derizî dikin. Bînayên taxê weha çêbûbûn ku çavên xelk û cîranan nekeve ser kêliyên ferdî yên rojên digel malbatê derbasbûyî, bes nuha, zikê qulbûyî yê hin xaniyan weke kuneke bêedeb dixuye. Ferfûriyên şikestî, darê dîwaran ê çirandî: xirabûna hewşan firehiya bobelatê dide fêmkirin.

Tu kes di vê labîrenta pêpelok û kûçeyan de rêya xwe şaş nake. Ji gellek Cezayiriyan re, Kasbah mîna erdekî nedîtî ye. Bi pey serxwebûnê re (3), pirraniya malbatên niştecîh terka taxê kir û di lojmanên Ewropiyan ên hemdemtir û rihettir de bi cîh bûn. Kesên din Kasbah dagirt jî hebûn. Ew cotyarên koçber bûn, wan deriyên xaniyên valahiştî bi darê zorê şikandin daku di xaniyan de bimînin. Kasbah bûye weke navbereke di jiyanê de, û xelk lê rûdine beriya ku cîhekî çêtir ji xwe re bibîne.

Bi çûyîna malbatên kevn, dilê dîrokî yê paytextê rûxiya. Beşekî ji niştecîhên nû malên xwe kambax dikin, daku ji pêvajoyên îkametdayînê sûdê werbigrin. Lehiyên sexte awayê herî belav in. Li gorî Lahsen Beg, endamê Weqfa Kasbah'ê, komeleyeke ku ji bo tamîrkirina mîrata vê mahallayê di nav hewldanan de ye, dibe ku sê sed û pencî xanî bi vî rengî hatibin xirakirin. Li derveyî nûkirina hin avahiyên weke Qesra Mistefa Paşa (4), rayedarên cezayirî pê mijûl nabin jî.

Lê belê, ji bo niştecîhan û ji bo xelkê gerok jî, Cezayir li vir e, li meydana Şehîdan, di Kasbaha jêrîn de ye. Di vî bajarî de, yê ku ji hêla dagirker ve hat çêkirin, yê ku berê hatina şevê, kengî rengekî boz li pêşiya xaniyên wî yên spî dikeve, pirr mîna Parîsê dixuye jî, ev Kasbah, bermayiya tenê ya bajarê ereb û osmanî ye. Çawa dibe ku dewlet tu payeyê nadiyê?

Sedemeke vê yekê jî ev e ku Kasbah her demî weke şûn û warê kiryarên eyb û heram hat dîtin. Şûna kirrîn û firotina tiryakan, warê fihûşe, yê ku tu carî ji ya xwe daneket, tevî axaftinên exlaqdêr ên hukumet û îslamperestiyan ku her fersendeke pijandina reseniya xelkê cotyarî li hemberî sivikbûna exlaqê bajarî bi kar tînin. Lê belê, ne asayiya vê rewşê bêhtir bi têgihîştina ka çawa karbidestên Eniya Rizgariya Neteweyî (FLN) (5), ji dema şerrê Cezayirê ve, çarçoveya rewayiya xwe ya siyasî fikirîn û bi cîh kir.

Wan ev rewayî, bi rengekî demoqratîk û li ser esasa hilbijartinên pirralî çênekir. Ev rewayiyeke dîrokî ye û kokên wê di şerrê serxwebûnê de ne. Tevî ku berxwedêrên Kasbah'ê beşdarî vê kêliyê damezrîner bûbûn jî, di dema Şerrê Cezayirê yê 1957'ê de, paraşutvanên generalê Massu'yê berxwedana hindûrîn ji hev dirandibû û wê tenê bi pey du salên hewldanan re karîbû xwe ji nû ve rêxistin bike. Yanî Kasbah, şûna têkçûneke leşkerî ye.

Digel ku di warê siyasî de, Cezayiriyan şerrê Cezayirê qezenc kiribin jî, rewşa leşkerî bi rengekî din bû. Paşê darbeya albayê Houari Boumediene'yî ya 1965'ê, rayedarên leşkerî ev rastî ha nixumand. (6) Weke mînak, tê dîtin ku tu pîrozbahiyên ji bo vî cengî tune ne, lê xwepêşandanên Cezayirê yên berfanbara 1960'î tên bibîranîn. Di warê dîroka neteweyî de, Kasbah'ê hê jî şûna xwe nedît. Pêvajoyeke rewakirina siyasî ev paşdeavêtin, ev qeyba bîrê bi xwe re anîn.

"Qezenckirina bajarê Cezayirê, qezenckirina welatê Cezayirê bû. Hemû komên dijber ji bo kontrolkirina paytextî li dij hev şerr kirin", Benjamin Storayê dîroknas binxêz dike. Dema ku xelkê Cezayirê tanqên Boumediene'yê dîtin, pêşî bawer kirin ku weke herroj, Gillo Pontecorvo, derhênêrê La Bataille d'Alger ("Şerrê Cezayirê") (7), hatibû û fîlmê xwe dikişand. Wan weha got qey tanqên fransî biribûn cîhê kişandinê ji bo velîstinekê. Paşê

ew têgihîştin ku ev tanq Cezayirî ne û leşkerên rasteqîn bi xwe re tînin. Cengekî dîtir weha li Cezayirê qewimî; ku kêmtir bi şîddet bû bes, ji bo pêşeroja welêt, bi qasî cengê bajarê Cezayirê yê pêşîn biryardêr bû. Di mehên paşê serxwebûnê de, yên derveyî, bi ser yên hindûrî de ketin. Siftê ew ji ser desthilatê derxistin, û bi dû re jî, ew ji kitêbên dîrokê xiş kirin.


"Çima dihêlin ku Kasbah xira bibe?", kevneberxwedêrekî ku naxwaze navê xwe diyar bike dipirse. "Ji serxwebûnê ve, pirraniya karbidestên desthilatê şoreşê nekir. Feydaya rêzgirtina, bi



MAHMUT CELAYIR: **Pekerun**, Diptycon, boyaxa rûnî ya ser tûwalê, 150 x 250 cm



MAHMUT CELAYIR: **Dîmena havînê**, Diptycon, boyaxa rûnî ya ser tûwalê, 150 x 250 cm



MAHMUT CELAYIR: **Dîmena havînê**, Diptycon, akrîlboyaxa ser tûwalê, 150 x 260 cm

mînaka Kasbah'ê, ji kesên ku bi rastî tev li şoreşê bûn, ji wan re nayê !" Ev elîpsa coxrafyayî ya vegotineke dîrokî ye, û ew "nîşaneke rûreş e ku di ber re darbeya 1965'ê û kokên nerewa yên dewleta Cezayirî bi bîr tîne."

Rûxandî, heta kenarên bajêr û bîrê paşxistî, Kasbah pêşan e ji bo mesafeya navbera Cezayira salên 1950'î û 1960'î, ya ku ji bo gelên Dunyaya Sêyemîn qeleyeke rizgarkirinê bû, û Cezayira nuha, paytextê esîrê olîgarşiya serkaran.

Bergeh û dirûvên paytêxt, nîşanên şûnûwarî yên siyaseteke buroqratîk in. Bajar belav dibe. Li nava lojmanên qeraxa bajêr ku bi tenê bi kêrî nivînê tên, xaniyên nû erdên boş ên Mîtîca'yê îşgal dikin. Di bizaveke firehbûnê de, nifûsa navenda bajêr di dorbajaran de rijiyaye. Xelkê zengîn derûdorên Postaxaneya Mezin û kolana Dîdûş Mûrat (ku berê weke kolana Michelet'ê dihat nasîn) diterkînin û diçin li taxên dewlemend ên bilindahiya bajêr bi cîh dibin. Anuha, gelê şerpêze an di qûleyan de, an jî li taxên feqîr ên kenara bajêr dimînin.

Her weke ji bo hatinên neftê, paşê serxwebûnê dewletê yekser di vedabeşkirina hatinên bajarsaziyê de kaniyeke rewabûnê dît. Madanî Safar Zîtûn, civaknasê zanîngehê Alger'ê, weha bi bîr tîne ku di sala 1962'ê de, lojmanên ku ji hêla "pêyên reş" (8) ve vala hatibûn hiştin, mîna "xezîneyeke şerrê li dij dagirkeran" bûn, û desthilatê ev xezîne di nava gelî de parve kir. Ji vê parvekirinê, "peymaneke negotî" di navbera her du aliyan de derket.

"Digel ku em di dewleteke tundrew de ne jî, ew li gorî mînaka Tunus an Fasê naxebite. Li vir, muşterîperestî her tîşt e". Civaknas dewam dike: "Dewlet hin mal û mulkên xwe difiroşe digel pergalên alîkariyê yên ku heta % 50 buhaya apartmanekê digihîjîn, û bi vî rengî jî aştiya civakî distîne. Bi heman awayî, tevî ku % 70 kiradarên îkametên civakî pereyê kirayên xwe nedinê jî, dewlet vî pereyî ji wan naxwaze! Ev îdareya gelperest a lojmanan, diziya berdewamiya desthilatdariyê ye. Herkes jî pê razî ye."

Mihemedê 50 salî li ser sekûka apartmana xwe ya "digel du odeyan û mutfaqekê" pêşwazî me dike. Ew bi serbilindî vê çîrokê vedibêje ka wî çawa bi destên xwe ev xanî çêkir ku ew nuha bi jin û pênc zarokên xwe re tê de dijî. Erdê çîmentokirî, baniyên madenê, dîwarên acûran, ceyran û qlîma: "Her tişt hemdem e", ew binxêz dike. Di axaftina wî de nîşaneke nerazîbûnê tune, bes, li çarhêlên xaniyê wî, di labîrenteka kûçeyan de, taxeke pirr feqîr belav dibe.

Ev mahalleya neresmî, di salên 1990'î de, li navenda Bab Ezzouar'ê, dorbajareke rojhilatê Cezayirê, hat çêkirin; nuha sê sed û pêncî kes lê dimînin. Li cem rijandina coyeke avên pîs, sergoyek xuya dike. Li paşxanê, holikên lerizok, bi wextê re bûne bînayên qalind. Hin ji wan bi qasî du qat bilind in û mîna xaniyên piçûk in. Malbatên ku zarokên wan pirr in, di odeyên piçûk de li ser hev dimînin. Ew kevnecotyar in ku ji rebeniya çolistanan reviyan, lê ew jî endamên sinifa navîn a Cezayirê ne: dukandar, mamoste, an polîs, weke Mihemedî. Di van warên xizan ên ji bo memûran de, "ne ji ber xizaniyê meriv bi cîh dibe. Li otoparkê binihêrin, çiqas erebeyên xweş hene !".

Çend sal berê, Mihemed hê jî li cem dê û bavê xwe dima, lê digel heft bira û jin û zarokên wan, "nebû ku em hemî lê bimînin". Pirr kesên bê hal, nemase jin û mêr ku bes pereyê wan ji bo kirrîn an kirakirina apartmenekê tune ye (kiraya apartmeneke du odeyan a dorbajareke gelî bi qasî meaşa asgarî ye), mecbûr dimînin ku "riya bijarte" ya taxên xizanan hilbijêrin. Bi rastî jî, wexta naverast a bidestxistina lojmaneke civakî bîst salî ye, bes digel çalakiyên vebicîhkirinê, pênc sal ji niştecihên taxên qeçex re bes in. Li gorî hejmara îkametên bajêr, xaniyên neresmî firehiyeke pirr piçûk digrin. Lê belê ew ji ber vê dewra ku hemû Cezayirî pê dinasin, bêhtir belav bûn.
Cezayir qeyrana lojmanê ku mîrata dagirkeriyê bû, hel nekir. Beriya şerrê serxwebûnê, sed û bist û pênc hezar "fransiyên misilman" ji xwe di taxên xizanan de dijiyan. (9) Ji wê demê û vir de, rewş hîn girantir bû. Bajarvanî pê li bazara lojmanê kir, û di çil salî de, nifûsa bajarê Cezayirê sê qat bilindtir bû. Li sirgûna çolan û mezinbûna xwezayî, "koçberiya ewlehiyê" zêde bû. Deh salên şîddetê (1991-2001) hejmareke mezin a Cezayiriyan xiste stargeha paytêxt.

Salên reş - bajarsaziya şerrê hindûrîn - kiryara herêmî ya muşterîperestî belav kir. Eniya îslamperest a rizgariyê (FIS, Front Islamique du Salut) û FLN li dij hev şerrekî aloz kir ji bo berbendiya bajêr û niştecihên wê. Wan xwest ku ji zêdebûna yekserî ya îkametên pêwîst, sûdekî siyasî werbigrin.

Nûnerên FIS'ê ku di hilbijartinên şaredariyan a xezîrana 1990'ê de, bi awayekî berfireh hatin bijartin, dihişt ku xaniyên xweçêkirî ji holê derkevin, bê tapû û destûra çêkirinê. Herçî yên Bab Ezzouar'ê, meriv dibêje qey ji fîlmeke kowboyan derketin: kûçeyên piçûk ên ku bablîsok di wan re tê. Tutişt, tukes tune ye. Bi tenê nanpêjxaneyek digel înşaata mizgeftekê heye, û çend avahiyên piçûk ên pişt-hemdem ku rengên Amerîka latînî û stûnên yewnanî tevlihev dikin.

Di sala 1992'ê de, paşê sekinandina pêvajoya hilbijartinî, cîgirên kiryardar ên bajaran, memûrên dewletê, heman pergal dubarekirin. Di vê heyama şîddetê de, wan dewam kir û erdên nû ji niştecihên muşterî re veqetandin, daku piştgiriya wan mîsoger bikin. Ev şerta saxbûna wan a siyasî bû; saxbûna wan a bedenî jî.

Ji dawiya şerrê hindûrîn ve, hatinên bajarvaniyê bi awayekî sereke ji gelî re nayên veqetandin. Rast e ku Abdelazîz Bouteflîka (serokkomarê Cezayirê), aynî strana hemû serokkomarên berê jî got. Wî sond xwar ku ew ê berî pênc salan, mîlyoneke lojmanan bide çêkirin, û wî, di sala 2009'ê de, "tunekirina îkametên xizan" weke noqteyeke girîng a berbijariya serokkomarî ya xwe îlan kir. (10) Taxê Bab Ezzouar weha di tîrmeha 2010'ê de hat xirakirin û niştecîhên wî, di lojmanên nû yên kenara bajêr de bi cîh bûn. Le belê, li rojavaya paytêxt, li ser bilindahiyên Bologhîne'yê, hê jî taxeke weha heye ku weke favelayên Brazîlyayê xuya dike û, li milê zinarekî, bi hezaran kes lê dijîn. Ji bo wan planek tune ye, û lehiya nûhatiyan napengîne.

Serhildan ku daîmî di taxên feqîr de derdikevin holê, pêşaneke xirabûna "peyama" neteweyî ne ku sinifa siyasî bi gelê Cezayirê ve girêda. Li gorî Nordine Grim, rojnamevanê El Watan'ê, ji nehevsengiya xwestin û dayînê bêhtir, qeyrana lojmanê ji bêmantiqiya desthilatdariyê tê. Ew fikira xwe weha rave dike: "Li Cezayirê 7.2 mîlyon lojman û 34 mîlyon niştecihan hene. Maleke naverast ji pênc kesan pêk tê, li gorî wê, pêkan e ku digel rêjeyeke baş a bicîhkirinê, xelkê Cezayirî hemû bê rûniştandin. Qeyrana lojmanê, ne tenê pirsgirêka peydayiya îkametan e. Di serî de, pirsgirêka dabeşkirinê ye. Li vir, mişqula rasteqîn muşterîperestî û karên nelirê ye."

Di nava birêvebiriyê de, şebekeyên bi desthilatdariyê ve girêdayî, ji bo bidestxistina hatinên bajarsaziyê li dij hev reqabetê dikin. Di vî warî de, Mohamed Larbî Merhoum xwediyê tecrubeyeke tahl e. Xelatê neteweyî yê mîmariyê, wî, di sala 2007'ê de, ji bo sazkirina qutbeyeke zanîngehî li bajarê Cezayirê projeyekê pêşkêş kiribû. Projeya wî di îmtîhana teknîkî de ketibû rêza yekem, bes di dewra duyemîn de, ya li ser şert û mercên fînansmanê, projeya wî hat redkirin. Lê belê, li vir hêjayî gotinê ye ku Merhoum ji projeya bijartî ya dezgeheke tunusî sê qat erzantir e.

"Ferqa navbera min û wan çi ye? Wan dixwest ku ew bi dovîzan re û li derveyî welêt heqê wan bê dayîn. Min dînar li Cezayirê dixwestin." Li derveyî welêt, çavdêriya tevgerên pereyê zehmettir e. Tê gotin ku beşeke ji pereyê dayî, ji bo bertîlan tê veqetandin û bi dirûva retro-komîsyonan vedigere Cezayirê. Merhoumê ku tunebûna destûra fermî ya dezgeha tunusî di welatê wê de îspat kir, karî serî li Komîsyona neteweyî ya bazaran bide. Reqabet dîsa vebû, lê ew di pratîkê de derveyî wê hat hiştin. Di sala 2009'ê de, dezgeheke lêkolînê ya başûr-koreyî ji bo projeyê hat bijartin. Daxwazên wê yên aboriyê, ji yên mîmarê Cezayirî du qat bilindtir in.

Çavên birçî hemû li hatinên bajarsaziyê ne. Jeopolîtîkeke hindûrîn li ser wê tê meşandin ku bi rehetî nayê famkirin, nemase ji ber diyarnekirina berpirsyariyên plansaziyê. Merhoum rewşê weha dinirxîne: "Di warê plansaziyê de, sê heb saziyên cuda xwedîparê berpirsyariyê ne, Wezareta Plansaziya Erdê, Wezareta Bajarsaziyê û Walîtî. Rêgehên wan, hedefên wan ên şexsî, şiyana wan a bangkirina şebekeyên wan, ev insûr hane, ji bo meşandina projeyên bajarê Cezayirê, pirr bi bandor in."

Ji bo bidestxistina vî erdê ku mîsogeriya desthilatdarî û qezencan e, dijberiya kiryarên cuda, sewiyeyên weha bilind digihîje ku hin înşaat nivcomayî tên hiştin. Herçî hilbijartiyên herêmî, "an derveyî tên hiştin, an jî tiliyên wan di kiryarên vêşartî de hene, lewre jî nikarin mîna dij-desthilatê bixebitin."

Di kolana Larbi Ben M'hidi'yê de (kevnekolana Isly), di navbera sînematek û şanoya neteweyî de, bînaya nîvcohiştî ya Muzeya Hûnera Hemdem a Cezayirê (MAMA, Musée d'art moderne d'Alger) pêşana vê yekê ye ka çawa sinifa desthilatdar, siyaseta bajarsaziyê ji bo menfeetên xwe yên ferdî bi kar tîne. Di destpêka sala 2006'ê de, hukumet biryar dide ku ew ê muzeyeke hûnera hemdem - ya pêşîn li Cezayirê, ya duyem li Afrîqayê - di kevnegaleriyên Fransayê de, avahiyeke nû-maurî ya ji destpêka sedsaliya 20emîn, veke.

Ji bo sazkirina wê, reqabeteke neteweyî tê lidarxistin. Halim Faidi, mîmarê bajarê Cezayirê û xelatgirê Akademiya fransî ya mîmariyê, di vê reqabetê de bi ser dikeve. Di sala 2007'ê de, Cezayir dibe paytextê çanda ereb û wezareta çandê ji Faidi'yî bînayeke nedaîmî dixwaze. Hukumet soz dide ku dê proje pişt re bê tevakirin. Faidiyê mîmar dest bi karê xwe dike û projeya ji bo tevahiya bînayê di dolabên wî de dimîne. Bes, bi pey îlankirinê re, înşaat dîsa dest pê nake. "Anuha di bînaya nîvcomayî de, heta dezgeheke ji bo serokê muzeyê û cîheke ji bo hiştina berheman tune ye. Rêbazên ewlehiyê nayên bicîhkirin ku şewat derkeve, dê çi tofan biqewime? Di bin van mercan de, em ê çawa koleksiyonên ji muzeyên biyanî li vir pêşkêş bikin? Wezaret bi Cezayiriyan dide bawerkirin ku MAMA bi rastî muze ye, bes herî zêde galeriyek e ! Ev hemû xuyanî û xapandin e."

Cezayira spî bûye sahneya şanoyeke siyayan. Di pişt perdeya pak a Şoreşê de, olîgarşiya desthilatê tayên qûmasa bajêr yek bi yek kişandin, û di dawiyê de qumas dirrandine.

* Coxrafyanas

1 Di roja 11'ê berfanbara 2007'ê de, du heb erebeyên bombebarkirî li navenda KBP'ê (Komîseriya Bilind a Pênaberan) û Dadgeha Bilind teqiyabûn û bûbûn sedema mirina bi dehan kesan li Ben Aknûn'ê, bajarokeke wîlayeta Cezayirê

2 El Watan (rojnameyeke rojane ya cezayirî), 1'ê çileya paşîna 2008'ê

3 Cezayir di sala 1962'ê de, piştî heşt salên şerrî yên bi Fransayê re, bû welatekî serbixwe. (Têbiniya wergêr)

4 Ev qesr ji hêla Mistefa Paşayê waliyê Cezayirê, di sala 1787'ê de hat çêkirin. (Têbiniya wergêr)

5 Eniya Rizgariya Neteweyî (bi fransî: Front de Libération Nationale, an jî FLN) di sala 1954'ê de hat damezrandin û di navbera salên 1954 û 1962'ê de, ji bo serxwebûna Cezayirê, li dijî artêşa fransî şerr kir. (Têbiniya wergêr)

6 Benjamin Stora, La Gangrène et l'oubli ("Rareş û jibîrkirin"), Parîs, La Découverte, 1998, p. 228

7 La Bataille d'Alger ("Şerrê Cezayirê") fîlmekî fransî ye ku ji hêla Gillo Pontecorvo ve, di sala 1965'ê de hat deranîn. (Têbiniya wergêr)

8 Niştecihên fransî yên Cezayirê ku piştî serxwebûnê ji mecbûriyetê vegeriyane Fransayê, bi navê "pêyên reş" tên nasîn. (Têbiniya wergêr)

9 Ev texmînên Jacques Chevalier'î ne, ku kevneşaredarê Cezayirê ye. Benjamin Stora, Le nationalisme algérien avant 1954 ("Netewparêziya Cezayirî ya berê 1954'ê"), CNRS Editions, Paris, 2010, r.192

10 www.mhu.gov.dz/pdf/pq.pdf

Wergera ji fransî: Simko Destan

# Krîza Siyasî ya li Iraqê û rola Kurdan (dewama rûpela 1.)

Ger mirov bala xwe bide rewş û pozîsyonên wê demê, federalîzm ji bo Kurdan lihevhatineke bi êş bû. Piştî Enfalê gellek Kurd difikirîn ku li Iraqê, ne mimkun e ku Kurd û Ereb bi hev re bijîn. (3)

Êdî federalîzm ger weha bê gotin di çarçoveyeke dîrokî de tê gengêşîkirin. Hêzên siyasî yên erebî- iraqî ku di sala 2005´an de federalîzm pejirandibûn, xwe ji avakirineke federalî bi dûr dixînin, ev yek ji bo wan tê maneya parçebûyinê (4). Têgeha erebî ji aliyê dîrokî ve xwediyê bangeke nerênî ye. Ev têgeha dabeşkirinê, parçekirina Filistînê tîne bîra Ereban. Dijberên sîstema Iraqa federal bi zanistî vê têgehê bi kar tînin, ji dêleva têgehên al-fideraliya (federalizm) yan jî al-nizam al-itihadi (sîstema federal). (5)

Ji ber ku parçebûyin li holê ye, red dikin ku xala 140'ê pêk bê. Herêmên li ser wan tên gengêşîkirin di fiîliyatê, di bin kontrola Kurdan de ne. Ji aliyê hiqûqî ve li derveyî Herêma Federal ya Kurdistan de ne û nikarin ji aliyê hikumeta herêmî ya kurd ve bên îdarekirin.

Pirsgirêka statuya saziyên leşkerî yên kurd ku tenê hin beşên wan ji butçeya hikumeta navendî tên fînansekirin, wisa dixuyê ku heta di hemû pirsan de plan pêk bê, Kurd dikarin bi hêza nuha heyî dewam bikin. Wekî din, argumenta Kurdan ew e ku hejmara pêşmerge kêm bin, ev dikare bê wateya xetereyeke terorîzmeke hîn bilindtir. (6)



MAHMUT CELAYIR: **Rêya Melîkî**, akrîlboyaxa ser tûwalê, 140 x 200 cm

Her çi pirsa karakterê multî-etnîk ya Iraqê ye, dixwazim çend têbîniyan bînim zimên:

1- Bala mirov dikşîne ku pêvebûn û girêdanên etnîk-mezhebî hêdî hêdî jar û sist dibin. Eger pêvejoya netewebûnê serkeftîtir bûya û eger mudaxeleya dewletên cîran jî sisttir bibûya, wê demê dê mezheb û etnîzekirin ji bo berjewendiya sîstemeke siyasî ya bi bikêrhatî baş bibûya û cîhekî piçûk werbigirta.

2- Îroj di navbera yek bi yek mezheban û komên etnîk de cudahiyek xwe nîşan dide. Weke mînak Şîiyan nikaribûn li ser damezrandina hikumetê li hev bikin û bêyî zexta Îranê jî, Malikî û Sadr nikaribûn li hev bihatana. Di nav refên Kurdan de jî ferqeke zelal hatiye holê. Tevgera Goran xwe weke tevgereke muxalif li hember her du partiyên serdest (PDK û YNK) diyar dike.

Di nav refên Sunniyan de ku ew jî zêde di bin bandora dewletên cîran de dimînin, cudahî xwe nîşan didin; ji aliyê siyasî ve, Sunnî ji Şîî û Kurdan hîn zêdetir parçebûyî ne.

3- Ev ferqên ku hatine nivîsandin di krîzên nuha li Iraqê heyî de muhtemel faktorên girîng in. Şîî blokeke yekpare pêk naynin, herwekî Kurd û Sunnî jî bi heman pirsê ve rûbirû ne.

## Aktorên Kurd

PDK û YNK di dema berê de hertim li dijî hev radiwestiyan. Ji dema veqetîna ji PDK'ya destpêkê ve, 1964, Celal Talabanî û Serokê PDK'yê Mele Mistefa Barzanî reqîbê hev bûn.

Di salên 70, 80 û 90'î de jî, gava ku herêma parastinê ya Neteweyên Yekbûyî (NY) hat avakirin, her du hêzan şerrên bi xwîn dimeşandin. Di navê de demên aram û lihevhatin çêdibûn, lê cudahiya heyî nikaribû bihataya telafîkirin.

Cudahî pirrcureyî bûn û tenê yek sedema siyasî yan ya civakî nikare têrahiya pêşveçûnên dîrokî ji 1964'ê heta 1998'ê bike (7). YNK di destpêkê de cîhê civaka çînên kurd yên bajarî bû. Di demên paş de PDK'yê jî bandor li ser bajaran dikir. Bandora Talabanî jî paşê li ser refên eşîrên kurd çêbû.

PDK hertim di bin hakimiyeta Barzaniyan de bû û hîn jî ev yek weha ye. Talabanî nikaribû di eynî giraniyê partiya xwe ku êdî piştî veqetandina herêma kurd 1994-2003 ew jî bûye "partiya hikumetê", bixe bin kontrola xwe. Navçeya Soran ku navçeya di bin bandora Talabanî de ye, ji aliyê civakî ji navçeya Behdînan, cîhê ku PDK lê serdest e, cudatir bû û hîn jî cudatir e.

Dîsa jî her du serok, Barzanî û Talabanî hewl didin ku bi awayekî li ser kevnemîrasa xwe hikumdariyeke nû ava bikin. Di rastiyê de partiyên wan ew pergal in ku hikumdariya bi kesayetiya wan ve girêdayî ye li ser piyan bihêlin. Strukturên teqawidî yên welatê petrolê Iraq, rê dide hikumdariya bi vî awayî. Paşê, piştî sala 2003'yan herêma kurd beşek ji hatinên petrolê wergirt (%17 ji hatina petrola Iraqê) û partiyên kurd hikumdariya siyasî wekî *Rentseeking*-Instrument (li hember dewletê mafperestiya kar û bazara kapîtal) bi kar anîn. Tahsîsa qezenca petrolê di xizmeta çînên kurd yên siyasî de ye (serok û birêvebirên partiyên herî girîng yên kurd). Li gorî qaîdeya edetî ya Iraqê, niştecîhên li Kurdistanê mafê bingehîn ji bo jiyanê werdigirin.

Hikumdariya PDK ji ber gellek sedeman bi hêz ma. YNK cîhê gellek hêzên ji hev cuda bû. Ew ji navendên bajaran dihatin û armanca wan guhertina civaka kurd bû.

Gava ku Talabanî xwest strukturekê mîna ya Barzaniyan ava bike, partiyê serî li dij hilda. Reqabet û paşê şerrê kurd bi kurd yê 1994-1998'an û gellek tehdîtên pirralî ji aliyê Saddam û Tirkiyeyê ve, rê nedan dijberiyên nav partiyê bi xwe. Piştî 2003'an, dijberiyê di nav partiyê de dest pê kir. Di sala 1996´an de Noşîrwan Mustafa ku hêviya Talabanî bû, wekî rexnegir ji nav partî derket. Di 2007´an de şirketa peywendî û agahdarî Wuşe (peyv) û paşê di 2008´an de koma xwe Goran (guherîn) damezirand. Di 2010´an de ev kom kete hilbijartinan û di nav sîstema partiyên kurd de bû partiya sêyem.

Piştî gengêşiyên dûredirêj partiyên kurd amade bûn ku wekî bereya kurd tev bigerin.

## Neteweperestên ereb û pêşniyaza wan ji bo çareseriya pirsa kurd

Wisa dixuyê ku sunniyên ereb di hemû pêşniyazên xwe yên weşandî de Iraqeke erebî û navendî tînin zimên. Sunnî ji bo çareseriya pirsa kurd xwediyê hin fikran in ku ew ji fikrên hikumeta Baas ya berê ne dûr in. (8)

Avasaziya federal di wan reşnivîsan de naxuyê. Ji dêleva vê yekê, herêmeke otonom ku bi hikumeta navendî re ji nêzîk ve girêdayî ye teklîf dikin. Dijberiyên derbarê Kerkukê û navçeyên xwedêgiravî cîhê gengêşiyê ne û li gor qanûna bingehîn garantiyên ji bo Kurdan nayên zimên.

Şansên ku fikirên weha bikevin jiyanê, mirov nikare xeyal jî bike.

## Çareya derketina ji krîza nuha û perspektîf ji bo Iraq

Şik tê de nîne ku dê hikumeteke iraqî di demeke nêzîk de bê avakirin. Mirov nikare lê bifikire ku guhertineke bingehîn ya qaîde û prensîbên piştî 2003'an pêk bê. Dewleteke navendî-ereb muhtemel wê ne xwedîşansê vegerê be û eger bibe, tenê weke çareyeke piçûk ya iraqî be, di maneya Iraqeke sunnî-ereb.

Pêwîstiya qanûna bingehîn pê heye ku di bin çavan re bê derbaskirin. Li tenişta pirsgirêkên usûlane ku divê bên sererastkirin (wekî din demek ji bo avakirina hikumeteke nû û zelaliyek li ser wezîfeya avakirina hikumetekê), wê di pêşerojê de mijarên mezin yên struktura federalîzmê weke noqteyên gengêşiyê xwe derxin pêş.

Kurdan federasyon pêşniyar kir ji ber ku şansê çareseriyeke hîn mezintir mimkun nedidîtin.

Lê wê yekê jî xwe îspat kir ku herêmên ereb û niştecîhên ereb federasyonê red dike, lê belkî tenê hêzên siyasî yên ereb ji ber sedemên siyaseta derveyîn û hindurîn vê yekê red dikin.

Weke prensîp du çareserî hene. Rakirina struktura federal, guhertina wê bi strukturek konfederal bi du komarên hevbeş. Ev yek dê ji aliyê hêzên siyasî yên ereb ve, bê şik, bê redkirin. Dewletên cîran jî dê vê opsiyonê bi dilxweşî pêşwazî nekin. Ji bo lihevhatinê dikare berhevanîna qanûnane bê holê ku ev herêma Kurdan wekî herêmeke taybetî bê îlankirin. Çarçoveya mafên heyî jî divê mîna îroj bimîne. Di derbarê tiştên ku strukturên bingehîn yên herêma wan eleqder dikin de, Kurd mafê redkirinê werdigirin. Ev dibe weke zewaceke mentiqî.

Zanayê civakî Karl W. Deutsch (9) ku di sala 1990´î de miriye dê weha bigota ku derenceya komunîkasyonê gihiştiye asta herî jêr. Iraq karîbû ji hev biketaya. Polîtologê tirk Ali Kazancigil beriya 25 salan nivîsiye ku dewleta xwedêgiravî di dunyaya sêyemîn de, mirov dikare bi xwedayê yûnanî yê bi du rûyan Janus re bide ber hev ku pirranî ji der ve tê piştevanîkirin, carna jî tê ruxandin. (10)

1 Li gorî serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî, birêvebiriya Obama zext daye ser partiyên kurd ku cîhê serokdewletiyê ji siyasetmedarekî ereb-sunnî re bihêlin. Kurdan ev yek nepejirand û li dij rawestiyan, ji ber ku hebûna Kurdekî xwedîmaneya sembolîk û siyasî ye, b. Elaph ji 11 çiriya paşîn 2010, www.elaph.com/webForum

2 Yekemîn car partiyên muxalif yên iraqî ku di zivistana 2002'an de li Londonê civiyabûn, daxwaza eniya Kurdistanê ya li ser sîstemeke federal pejirandin

3 Serokê nuha yê koma muxalif ya Kurd, Goran, Noşîrwan Mustafa ji dawiya salên 80'î ve bê tawîz mafê çarenûsê diparast

4 Binêre li ser vê pirsê: Naeem, Naseef, *Sîstema dewletî ya nû ya Iraqa Federala Yekgirtî*, Frankfurt am Main: Peter Lang 2007

5 Bi taybetî rojnameya *al-Mustaqbal al-Arabi* ku li derdora akademîsyenên ereb yên neteweperest xwedî bandor e û ji aliyê *Centre for Arab Unity Studies* (CAUS) ve (Navenda ji bo Lekolînên li ser Yekîtiya Ereb) li Beyrûdê tê derxistin, xwe wekî saziyeke girîng daye nasandin, sîstema federal li Iraqê red dike

6 Di vê xalê de jî wisa dixuyê ku Serokatiya Obama bi temamî yekbûn-helandina komên kurd di nav artêşa Iraqê de daxwaz dike. Ev yek dê pirsgirêkên qanûnî bîne holê, ji ber ku li gor qanûna bingehîn bicîhkirina leşkerên iraqî di nav herêmeke federal de, destûra parlamentoya federal pêwîst dibîne. *al-Hayat*, 28 çiriya paşîn 2010

7 Ji bo vê yekê, binêre: David McDowell, *A Modern History of the Kurds*. London 2004. (Dîrokeke Nûjen ya Kurd)

8 Markaz Dirasat al-wada al-´arabiya: Birnamaj limustaqbal al-´Iraq ba´da intiha` al-Ihtilal (Navenda Yekîtiya Ereb: Bernameyek ji bo dahatuya Iraq piştî dawîlêanîna dagirkeriyê) 2005

9 Karl W. Deutsch, *Nationalism and Social Communication*. An Inquiry into the Foundations of Nationality, Cambridge/London 1953 (Neteweperestî û Peywendiya Civakî, Lêgerîneke li ser Bingehên Neteweperestiyê)

10 Ali Kazancigil (ed.), *The State in global perspective*. Paris 1986 (ji Perspektîva Globalîzmê ve Dewlet)

Wergera ji Almanî: Hüseyin Kartal



Nîsan 1977

# Herêma otonom a Kurdistanê û meşa dirêj ber bi otonomiyê ve

PHILIPPE RONDOT

## ARŞÎVA BÎRA KURDAN

Piştî têkçûyina şoreşê û Peymana Cezayirê (1975), Li Başûrê Kurdistanê hêviyên Kurdan jî têk çûbûn û pişta tevgera kurdî hatibû şikandin. Berpirsên tevgerê ji mecbûrî derketibûn derveyî welêt û bêdengiyek di nava civaka kurd de bi cîh bûbû, digel ku li çiyayên Kurdistanê şerrê pêşmergeyan dewam dikir.

Philippe Rondot yek ji pisporên Rojhilata Navîn yê weha ye ku him di vî warî de gellekî nivîsiye û him jî bi agahî û şîroveyên xwe ve alîkariya siyaseta fransî jî kiriye. Di eslê xwe de ew generalekî navdar yê artêşa fransî ye, doktorekî sosyolojiya siyasetê ye, lê herweha di îstixbarata fransî de jî berpirsekî bilind bû û heta teqawîtiya xwe ya sala 2000'ê jî xebitî. Philippe Rondot weke bavê xwe Pierre Rondot dostekî Kurdan bû û di vê nivîsa xwe de raporeke berfireh li ser kronolojiya şoreşa kurdî ya salên heftêyî derdixe.

Di nivîsa duyem de jî, Babakr El Bachadari nîşan dide bê peymana 11'ê adara 1970'yê deriyên çawa li ber geşedana çand û zimanê kurdî vekirin. Ji hêlekê ve, di vê nivîsê de behs dibe bê ji bo herêma otonom û çanda wê çi hatiye kirin û ji hêla din ve jî, nivîsa Philippe Rondot çirçoveya siyasî ya têkçûyina vê peymanê destnîşan dike. Ji ber wê, ev her du nivîsên ku nîsana 1977'an, di heman hejmara Le Monde diplomatique'ê de hatine weşandin, dikarin weke du nivîsên ku hevdu temam dikin jî werin xwendin.

LM*d*kurdî

Kurdistan mîna heyva nû ya di navbera herêma Kurd-Dax a ne dûrî kendava Îskenderûnê û kendava Bextiyar a li bakurê kendava Besrayê erdekî fireh ê çiyayî ye ku mezinahiya wî nêzî 500 000 kîlometro kareyî ye. Di dawiya Şerrê Cîhanê yê Yekemîn de bi daxwaza hêzên mezin ev welat di navbera Tirkiye, Îran, Iraq û Sûriyê de hat parçekirin. Kurdên ku serjimara wan weke deh milyonekî tê texmînkirin, çarenûsa wan li gorî siyaseta desthilatdariya navendî ya dewletên Kurdistan parçekirî ya beramberî Kurdan, diguhere.

Di demeke kurt de Bexda bi tişta ku wê veguheriya "pirsgirêka kurd" re rûbirû bimaya ku bûyerên wê, dê qismî pêkhatina şoreşa tîrmeha 1958'an hêsan bikira. Pişt re jî ev pirsgirêk navenda mijûlî û karûbarên hikumetê ma. Hê nû adara 1975'an di encama peymaneke bi Îranê re ji Iraqê hat ku di pratîkê de serhildanê kontrol bike. Bi neteweparêziyeke bi salên têkoşînê xurtkirî, ruh bi vê serhildanê dihat. Neteweyên Yekbûyî bi xwe, li aliyê xwe qet serê xwe pê nediêşandin ku dawiyê li vî şerrî bînin.

Bi destpêka desthilatdariya general Qasim di tîrmeha 1958'an de Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK) jî xebatên xwe êdî aşkere dimeşandin. Mele Mistefa Barzanî jî ji penaberiyê vegeriya û birêveberiya partiyê girte dest xwe. Îsyaneke nasirî ya li dijî Qasim ku ji Musilê dest pê kir, bi xêra destwerdana Kurdan tesîra wê kêm bû. Lê belê mafê Kurdan û herweha partiyên din di heman demê de têra xwe hatin kêmkirin. Tevgereke serhildêr ji îlona 1961'ê û pê ve li Kurdistanê bi pêş ket. Piştî ku Mele Mistefa Barzanî tevî PDK'yê birêveberiya vê tevgerê girte destê xwe, di encama vê serhildanê de kontrola tevahiya herêma sînorê wê bi Îranê re heyî, kete destê serhildêran.
Di 8'ê sibata 1963'an de general Abdel Selam Arif dawî li desthilatdariya Qasim anî. Vê yekê kir ku Mele Mistefa Barzanî aliyê rejîma nû ya ku "mafê neteweyî yên gelê kurd qebûl dikirin" bigire. Ji bo ku danezaneke siyasî ya der barê daxwazên xwe yên der barê otonomiyê de ku serjimara Kurdan û erdên Kurd lê dimînin jî wê li ber çavan bigire amade bike, PDK'yê ji vê konjonktura bikêrhatî sûd wergirt. General Arif ev pêşniyar red kirin û piştî ultîmatomekê eskerên xwe derxistin operasyonên nû. Piştî ku wî Partiya Baas tesfiye kir hê nû di 10'ê sibata 1963'an de lihevkirineke agirbestê mohr kir. Hevdîtinên destpêkirî, zêde dirêj kirin. Li ser vê Mele Mistefa Barzanî "danezaneke din a siyasî li ser mafên neteweyî yên gelê kurd ê li Iraqê" da Bexdayê û têkoşîna gerîla li bakurê welêt ji nû ve da destpêkirin. Di nîsana 1966'an de general Arif mir û birayê wî Abdel Rehman li şûna wî bû desthilatdar, lê belê vê yekê dawî li şerrê ku şîddeta wî û firehiya qada wî zêde dibû, neanî. Hikumeta Abdel Rehman Bezzaz ku di pratîkê de xitimî û hew karîbû kar bike, neçar ma ku bi Mele Mistefa Barzanî re peymanekê mohr bike. Li gorî vê peymanê, mafên Kurdan bi awayekî fermî di destûra bingehîn a Iraqê de dihatin qebûlkirin û peymanê desantralîzasyoneke berfireh pêk dianî: êdî behsa otonomiyê nayê kirin. Ev peymana 29'ê hezîrana 1966'an bi ragihandina agirbestê di tîrmehê de piştrast bû.

Darbeya eskerî ya ku sala 1968'an li Iraqê Baas kire desthilatdar, yek ji biryarên wê yên pêşî hewldana rêzgirtina ji peymanên bi PDK'yê re hatin mohrkirin bû. Serokdewlet Ehmed Hesen El-Bekr 5'ê têbaxê efûyeke giştî aşkere kir. Lê belê Kurdan pêkanîna peymanên li jor behsa wan hat kirin, weke zêde hêdî nirxand û gulana 1969'an ji nû ve dest bi şerrê çekdarî kirin. Hikumeta Iraqê ya ku hê kêm bi desthilatdariya xwe piştrast bû, dest bi hevdîtinan kir ku zehmet jî be 11'ê adara 1970'yî bi lihevkirina li ser 11 xalan bi encam bûn. Mafê Kurdan ên sereke hatin qebûlkirin û di çarçoveya Komara Iraqê de wan otonomî bi dest xist. Li gorî lihevhatinê kurdek wê bibûya cîhgirê serokdewletê Iraqê jî. Planeke pêşxistina civakî û aborî hate amadekirin û qanûneke der barê reforma cotkariyê de ji bo herêma Kurdistanê hat derxistin. Serokdewlet Bekr ji bo ku bike pênc wezîrên kurd jî cîhê xwe têde bigirin, ji nû ve şikil da hikumetê. Bekr destûra bingehîn a Iraqê guherand. Yekem car bû ku destûrekê tesbît dikir ku gelê Iraqê ji du neteweyên sereke pêk tê: ereb û kurd. Zimanê kurdî di asta zimanê erebî de li herêma Kurdan bû zimanê fermî. Ev şert û mercên ku Kurdên Îranê, Tirkiyê û Sûriyê newêriyan xeyal jî bikin, têrê nekirin ku têkiliyên aloz ên di navbera desthilatdariya navendî û PDK'yê de nerm bibin. Redkirina tercîha kesayetên kurd ên ku diviya erkên berpirsiyariyê pêk bînin, siyaseta erebkirina herêmên petrolê yên Kurdistanê, hewldanên reşkujiyê yên li dijî Mele Mistefa Barzanî yan jî mirovên nêzî wî, şerrên carinan di navbera milîsên kurd û eskerên Iraqê de diqewimîn, ji bo encama "Peymana Neteweyî" ya ku ji aliyê serokdewlet Bekr ve çiriya paşîn a sala 1971'ê de hatî pêşniyazkirin, bi xêr nebû. Tevahiya dirêjahiya sala 1972'an pirsgirêk her dijwar bû, herdu aliyan jî aliyê din bi binpêkirina peymanên adara 1970'yî gunehbar dikir. Di çiriya pêşîn a sala 1972'an de PDK'yê memorandûmeke ji 23 xalan aşkere kir, siyaseta guheztina xelkê red kir û ji bo diyarkirina çarenûsa bajarê Kerkûkê jî referandûmek pêşniyaz kir. Baas'ê di bersiva xwe de îşaret bi hewldan û gavên avêtî kir. Mele Mistefa Barzanî xwe jê venedaku 21'ê hezîrana 1973'an di hevpeyvîneke bi Washington Post'ê re di hemberî mêhtin û xebitandina erdên petrolê yên Kerkûkê de banga alîkariyeke eskerî li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê bike. Di tebaxa 1973'an de PDK'yê red kir ku tev li bereya neteweyî bibe ya ku ji Baas û partiya komunîst a Iraqê pêk dihat. Şerrê çiriya pêşîn a 1973'an yê ku kir artêşa Iraqê seferber bibe, hişt ku navberek bikeve pirsgirêkê. Di 11'ê adara 1974'an de danezana qanûna otonomiya Kurdistanê ji aliyê Bexdayê ve, ev pirsgirêk ji nû ve gurr kir ku vê carê bi rengekî dramatîk ji bo Mele Mistefa Barzanî û dilsozên wî bi dawî bû.

## Dawiya xeyalan

Ji 1961'ê û pê de PDK'yê li deverên ku wê kontrol dikir, saziyên şoreşger û dezgehên îdarî bi cîh kirin ku erka wan pêkanîna fermanên wê bû. Mele Mistefa serokê Konseya Şoreşger, Buroya Birêveber û serfermandarê artêşê ye. Mektebeke siyasî ya ku bi awayekî birêkûpêk tê hilbijartin, meyilên tevgerê diyar dike. Artêşa Şoreşger a Kurdistanê (AŞK) ya li alayan dabeşkirî, tumen tumen ji hev cihê kirî yan jî serbixwe, li pênc herêmên eskerî yên Behdînan, Hewlêr, Kerkûk û Silêmaniyê heye. Li aliyê din di nava tevgerê de kesayetiya xurt a Barzanî dibe sedema derketina holê ya hin muxalifan ku kirin ber bi derve ve parçe bibe. Wekî din beşeke têra xwe mezin a Kurdan heye ku nabe mirov nebîne, ji ber sedemên siyasî yan jî bi rengekî besîttir ji ber sedemên eşîrî hevgirên desthilatdariya navendî ne û bi vî rengî li dijî birayên xwe yên serhildêr şerr dikin.

Piştî pêkanîna dema çar salan a li gorî lihevhatinên sala 1971'ê, serokdewlet Bekr bi awayekî yekalî qanûna otonomiyê aşkere kir. Li gorî vê qanûnê Kurdistan di nava Komara Iraqê de vediguhere herêmeke otonom û paytexta wê jî Hewlêr e. Konseyeke Parlemanter a ji aliyê gelî ve hilbijartî û Konseyeke Birêvebir hêza siyasî birêve dibin. Serokê Konseya Birêvebir ji nava Konseya Parlemanter ji aliyê serokdewlet ve tê hilbijartin û endamên wê divê dengê baweriyê ji pirraniyê bigirin. Herêm xwediyê butceyeke taybet e daku karibe ji bilî yên alaqedarî çavkaniyên petrolê, parastinê û karên derve, karûbarên xwe hemûyan bi rê ve bibe. Wezîrekî dewletê yê ji aliyê Bexdayê destnîşankirî girêdana di navbera desthilatdariya otonom û desthilatdariya navendî de misoger dike. Ev qanûn dikare li tevahiya herêma pirraniya şêniyên wê li gorî serjimara sala 1957'an kurd e, pêk bê. Lê belê dever û bajarên Şengal, Xaneqîn û Kerkûkê li derveyî vê çarçoveyê tên hiştin. Li dijî vê, PDK'yê projeya xwe ya ku doza serbixwebûneke mezintir a saziyên herêmî dikir, derdixist pêş: êdî serokê Konseya Birêvebir wê neyê destnîşankirin, belê bê hilbijartin û ew ê di heman demê de wezîfeya cîhgirê serokwezîrê hikumeta Bexdayê jî pêk bîne, butce wê li gorî hejmara serjimara herêmê bê amade kirin û beriya hertiştî dever û bajarên ji herêmê hatine qutkirin wê bibin parçeyên sihê yên herêma otonom.

PDK'yê tu amadebûna qebûlkirina qanûna otonomiyê nîşan neda, di dema ku Bexdayê efûyeke bi şert aşkere kir û biryarên xwe bi cîh anîn, partîzanên Mele Mistefa Barzanî careke din derketin çiyê; biryarên Bexdayê bi cîh anîn ev in: di nav wan de kurê heq ê Barzanî Ubeydullah jî pênc şexsiyetên kurd şûna endamên PDK'yê û kesayetiyekî din ê kurd Taha Muhyedîn Marûf girtin; Marûf weke cîhgirê serokê komarê wezîfedarkirî bû. Li cîhê cîh di pratîkê de, eskerên Bexdayê şandî bi Kurdan re şerr dikin, vê carê bi şîddeteke heta hingî neditî. Bajarên Kerkûk, Hewlêr, Musil û Silêmanî di destê hêzên eskerî yên hikumetê de ne, belê tevî bikaranîneke zêde ya balefirên şerr û topan jî ji eskerên Iraqê nayê xeta parastinê ya Kurdan bişkînin; ev xeta parastinê xwe disipêre çiyayên Zozek û Hindirînê û beriya Rewandizê rêya stratejîk a Hamiltonê dihewîne ku ji bo serhildanê ev rê girêdaneke rastî ya bi navikê ve bû.

Bi destpêka zivistanê re alîkariya Îranê ya heta nuha veşartî gellekî zêde bû: sîlehên modern ji pêşmergeyên Barzanî re dihatin şandin, di nava van sîlehan de topên giran, balefirşikên û çekên dij-tank hebûn. Van sîlehan kir ku peşmergeyên Barzanî êrîşa iraqî rawestînin. Lê belê vê alîkariya îranî bi teknîkên nû yên şerr Kurd neçar kirin bereyeke bi rastî ya eskerî ava bikin û di warê lojîstîkê de girêdana wan a bi derve re jî zêde kir û vê alîkariya îranî wê rê li ber binketina Kurdan jî vekira. Aloziya di navbera Iraq û Îranê de ewqasî zêde bû ku hindik mabû rê li ber şerrekî çekdarî ê yekser vekira. Ji ber vê yekê herdu hikumet dikevin nava liv û tevgerê: 6'ê adara 1975'an, Iraq û Îranê peymana Cezayîrê mohr kirin. Li gorî vê peymanê herdu dewlet jî "kontroleke hişk û bikêrhatî a li ser sînorên xwe wê pêk bînin daku vebirrî dawî li tevahiya binpêkirinên sînoran bîne ku xwedî xisleteké ne ku dewletan dixin tehlûkê". Bi vî rengî Mele Mistefa Barzanî û pêşmergeyên wî yên ku bi carekê alîkariya îranî ji ser wan qut bû, piştî ku çend şerrên din ên bê hêvî kirin, neçar man vekişin Îranê: artêşa Iraqê hêdî hêdî gundên Kurdan ên li dora geliyê Coman yên weke Gelale, Dalîman, Hecî Umran yên ku kelehên şoreşê bûn dagir kirin, li aliyê din jî dused hezar penaberên kurd li aliyê din ê sînor di wargehên penaberan de bi cîh bûn. Him di şert û mercên maddî û him jî yên moral de yên ku dikin kezaba mirovan gellekî bişewite, bi vî rengî dawî li serhildana gellekî hat ku li herdu aliyan bû sedema mirina bi hezaran mirovî.

Birêvebirina operasyonên eskerî li dijî herêma hindikahiya kurd, pêşî li hikumeta Bexdayê negirt ku pêkanîna statuya otonomiya herêmên kurd a 11'ê adara 1974'an qebûlkirî, dewam bike. PDK'yeke nû a ji ya Mele Mistefa Barzanî cihê û ji hevkarên desthiatdariya navendî pêk tê, birêvebirina herêma otonom a di kontrola hikumetê de digire dest xwe: Haşim Akrewî 25'ê îlona 1974'an weke serokê Konseya Birêvebir hat destnîşankirin û Babekir Başedarî jî weke serokê Konseya Parlemanter hat destnîşankirin. Heştê endamên vê Konseya Parlemanter jî ji ber ku bi sedema dijwariya rewşê nikarîbûn bên hilbijartin, ji aliyê Konseya Fermandariya Şoreşa Iraqê ve ji bo sê salan hatin wezîfedarkirin.

Dawîlêhatina şerr a ku generalê iraqî Seîd Hamû 3'ê nîsana 1975'an da zanîn û li ser tevahiya erdên Kurdistanê bicîhkirina eskerên iraqî, destpêka pasîfîkasyon û ji nû ve avakirinê ye. Pirsgirêka herî lezgîn a










divê bê çareserkirin der barê çarenûsa bi hezaran penaberên li Îranê de ye. Bexda li ser hev sozên efûyê dide û timî dema dayî Kurdan dirêj dike daku wan dîsa bîne Iraqê. Lê belê tirsên pêşmergeyan û malbatên wan ku dikarin rastî zextan bên û zexta rayedarên îranî, vegera wan hêdî dike.

Îroj di wargehên li Îranê de bi tenê sîhhezarek penaber mane, mumkin e ku ew difikirin zêde ketina nav şerrê li dijî Iraqê û wê nikaribin ji efûyê sûdê wergirin, mumkin e hikumeta Îranê dixwaze wan di çarçoveya siyasetekê de ku hê ji duwatedariyê ne hatiye şuştin ya li beramberî Iraqê, bi kar bîne. Aştiya sîlehan weha xuya ye ku li herêma otonom bi kêr hatiye, li vir mirov dikare serbest biçe û bê, lê belê artêş li her deverê ye û hişyar dimîne. Carinan nûçeyên çalakiyên gerîllayan yên piçûk belav dibin. Nûneriyên PDK'ya berê ya li derveyî welêt bi cîh bûye, van çalakiyan dikin: li bajarên Dihok, Zaxo, Batûfa û heta bi Rewandûzê. Di çile û sibata îsal de hin teknîsyenên biyanî (polonî û paşê fransî û cezayîrî) hatin revandin, ji hingî ve hemû hatin berdan. Lê belê ev bûyerên zêde li deverên piçûk asê mayî, nabe ku mirov bi şerrê berê re li ber hev bigire. Ev bûyer kirinên komên nekontrolkirî û bêguman neorganîzekirî ne, çawa ku timî hebûn û bi xêra erdekî kontrola wê bi taybetî zehmet û sînorên bi rehetî tên binpêkirin, dimînin. Kevne-birêveberiya şoreşê li derveyî welêt, li Îran û Ewropayê, bêdeng û li quncikên xwe dimîne û ji bo ku karibe çalakiyên xwe yên eskerî ji nû ve bide destpêkirin pirr parçekirî ye. Mele Mistefa Barzanî yê nexweş û kal li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê ye û xuya ye dev ji tevahiya çalakiyên eskerî berdaye.

Ji nû ve avakirina herêma otonom li her deverê xuya û darîçav e û bi lez û bez dewam dike: rê, pire, gund, dibistan, malên tenduristiyê yan hatin tamîrkirin yan jî ji nû ve hatin avakirin. Lê belê ji nû ve destpêkirina jiyaneke aborî û civakî ya li gorî pîvanên modern normal, bêyî ku hin pirsgirêkan derxe holê, pêk nehatiye. Ev pirsgirêkên insanî yên xelkekî ne ku fêrî jiyana di çarçoveyeke rêûresmê de bûye, îroj jî gellekî bi vê rêûresmê ve girêdayî ye û piştî şerrekî dirêj û xeddar bi zor radibe ser piyan. Timî ji taybetbûna xwe agahdar ku çand û ziman weke nîşanên herî nirxdar ên vê taybetbûnê tên dîtin, gelê kurd zindîtiya xwe diparêze. Ji nû ve pêkanîna aştiyê divê bi kêra bi rastî pêkanîna mafên vî gelî yên qebûlbûyî bê daku di nava Komara Iraqê de karûbarên xwe bi rê ve bibe. Dûrî dengê çekan, dewamkirina diyaloga bi Bexdayê re wê şert û mercên adara 1974'an hê baştir bikin, bersivekê bidin daxwazên Kurdên Iraqê û rê li ber çareseriyeke dawî ya pirsgirêkê veke ku dê aliyan tevan razî bike.

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê



## HERÊMA XWESER A KURDISTANÊ

# Çareseriyeke li gorî berjewendiyên kêmneteweyan

BABAKR EL BACHADARI

Di têkoşîn û siyaseta xwe de, partiya Baas ji bîrdoza xwe ya neteweyî û pêşverû sûdê werdigire û zulmkariya neteweyî, cudakariya nijadî û kedxwariya çînî weke diyardeyeke bi desthilatên emperyalîst û paşverû ve girêdayî dihesibîne. Lewre jî, ew li ser pirsgirêkên nijad û kêmneteweyan di welatê ereb de, xwediyê helwesteke mirovparêz e, û di berjewendiyên wan ên rewa digihîje û rêzê ji wan re digire.

Li ser bîngeha van rêbazên xurt, Baas'ê boçûneke weha li hemberî pirsgirêka kurd diyar kir ku divê ev pirsgirêka neteweyî, bi bîreke berpirsyariya teva û girêdana bê kêmasî ya bi rêya demokratîk ve, bê çareserkirin. Ji dema ku li Iraqê hat ser kar û pê ve, partiyê bi awayekî zelal siyaseta xwe tarîfe kir, û bingehên esas û minasib ên çareserkirineke pirsgirêka kurd, di çarçoveya biryarên pêşverû de ku di rêzeke belgeyên destûrî û zagonî de mîsogerkirî ne, danîn.

Paşê tedbîrên erênî yên çareseriyê hatibin wergirtin, daxuyaniya 11'ê adara 1970'yê zagona xweseriyê îlan kir. Mafên çandî yên gelê kurd hatin nasîn, akademiyeke zanistî ya kurd hat avakirin û zanîngeh li Silêmaniyê û Duhokê hatin damezrandin; wekî din, walîtiyeke nû saz bû, cenja Newrozê weke cejna neteweyî ya gelê kurd hat îlankirin û, taliyê, biryara efûyeke ji bo hemû kesên ku beşdarî çalakiyên sabotaj bûbûn hat girtin.

Daxuyaniya adarê, bîngeha bernameya şoreşê ya li ser çareserkirina pirsgirêka kurd, bi niyeteke lihevhatin û alînegiriyê, bû. Desthilatdariyê, ji bo bicîhkirina vê bernameyê, hemû tedbîr girtin; di vê çarçoveyê de jî, Destûra nedaîmî hat guhertin û heyîniya netewperêziya kurd bi awayekî fermî hat nasîn. Tedbîrên zagonî pesend bûn daku zimanê kurdî, li cem zimanê erebî, bibe zimanê resmî yê welêt.

Beşeke nû ya ji bo çanda kurdî, digel kooperatîveke çapkirin û weşana kurdî, ava bûn; komeleyeke çanda kurdî damezrandî bû, û ji bo weşandina rojname, kovar û pirtûkên bi kurdî destûr hat dayîn. Zagona reforma cotyarî bi cîh bû. Saziyeke ji nû ve înşakirina Bakûrî hat peywirdarkirin. Projeyên pirrhejmar çêbûn, kargeh saz bûn û xizmetên nedîtî ji xelkê re pêşkêş bûn. Memûrên kurd di yekîneyên rêvebiriyê yên herêmê de hatin wezîfedarkirin, û bi vî rengî beşdarî desthilatê dibin. Di dawiyê de, planeke helkirina binpêşketina herêmê saz bû.

Ji bo ku neheqî li rastî û dîrokê nayê kirin, divê bê gotin ku nihêrîna serokatiya aşîretî û bertîlgirtî ya tevgerra kurd, nihêrîneke teng bû. Ev serokatî bi hêzên biyanî re, di nav peywendiyên gumanbar de ma û, bi hevkariya îstîxbaratên biyanî, wê hewl daku rê li ber daxuyaniya adarê bigre. Rabûn û rûniştina ne dilsoz a birêvebirên kurd, digel hevkariyên wan ên şikbar, guman xist nava xelkî, teror li ser wî ferz kir û di navbera milletê kurd û karbidestên desthilata neteweyî de asteng rahiştin. Li ser vê, ji bo demeke dirêj, wan çareserkirina pirsgirêkê taloq kir.

Çar salên tijî pêşketinan nû derbas bûn û gelê kurd, li gorî daxuyaniya adarê ya ku xweseriyê misoger dike, tevahiya mafên xwe yên neteweyî bi kar tîne. Bi saya tevlîbûna hêzên neteweyî, netewparêziya pêşverû û elemanên herî baş ji nav Ereb, Kurd û kêmneteweyên din, rêça xweseriyê pêş de ket û ew di tarîxa pêşdîtî de îlan bû.

Ranegirtina emperyalîzmê ya li hemberî vê pêşketina bilez ji bo gelê iraqî, tiştekî xwezayî ye. Wekî din, dema ku ronahiya tecrubeyên şoreşgerî xetereyê dixe bertekparêzî û pêşeroja wê, ew nikare aş û aram bimîne. Îstîxbaratên biyanî pare û zanyariya xwe ya di warê sazkirina komployan de belav kirin, daku tecrubeya me bi sînor bikin û rawestînin.

Bi saya alîkariya rasterast a fermandariya siyasî ya neteweyî, statûyên navxweyî yên desteyên zagondaner û zagongêr û yên birêvebiriyên giştî saz bûn. Wekî din, talîmatên îdarî û fînansmanî hatin dayîn, daku peywirên wan ên bingehîn hêsan bibin. Beş û wezîfeyên îdarî (yên herêmî), ji desthilata navendî qut bûn û bi îdareyên pêwendîdar ên desthilata xweser ve girêdayî bûn. Li ser vê, hêjayî gotinê ye ku desteya zagondaner, li gorî zagona xweseriya hjm.33 ya 1974'ê ya bi navê " Zagona li ser xweseriya herêma Kurdistanê ", karê xwe dimeşîne.

Dezgehên desthilatdariya xweser ev in:

### 1) Desteya zagondaner

Ev sazûmana danîna zagonan a hilbijartî ya herêmê ye. Endam û şewazên xebata wî, di zagona statûya wî ya navxweyî de tarîfe dibin. Ev sazûman, ji bo pêşketina herêmê û piştgirîdayîna xizmetên înşakirinê û xizmetên civakî, çandî û aborî yên herêmî, di nav sînorên siyaseta giştî ya dewletê de, biryarên zagonî yên pêwîst dide. Deste, qerarên zagondanînê ya li ser pêşketina çand, irf û adetên neteweyî yên niştecîhên herêmî jî digre. Ew planên bi hûrgilî yên Desteya zagongêr, li ser pirsgirêkên aborî, karûbarên civakî, projeyên pêşketinê, pirsên perwerde, tenduristî û xebatê, li gorî pêwîstiyên plansaziya navendî û giştî ya dewletê, erê dike. Ew butçeya herêmê pêşniyar dike û bîlançoyan erê dike. Ew pêbaweriya xwe dide Desteya zagongêr.

### 2) Desteya zagongêr

Ev sazûmana zagongêr a îdareya desthilata xweser a herêmê ye. Ew ji serokek, cîgirekî serok û hejmareke endaman ya bi qasî hejmara îdareyan pêk tê. Ji xwe, deh îdare hene. Serok û endamên desteya zagongêr, di paya wezîran de ne.

Walîtî (mûhafazat) yên herêmê bi serokê Desteya zagongêr ve girêdayî ne. Di bicîhanîna peywira xwe de, Deste ji alîkariya sisê dezgehên xwedan karînên bisînorkirî sûdê werdigre. Tevî zehmetiyan, tevgerra xweseriyê, ji bo cîh bi cîh kirina aliyên erênî yên têgeha desthilata xweser, xurtkirina bîngehên vê desthilatê û danîna baştirîn têkiliyên aborî, civakî û siyasî, her di nav xebatên bê tebat de bû.

Xizmetên perwerde, tenduristî û cotyariyê, her wekî birêvebiriya turîzmê û çêregehan, pirr pêş de ketin, û herêm anuha di qonaxeke xebat û sazkirinê de ye ku bi awayekî rêkûpêk û rasterast pêş de diçe.

Bernameya veberanînan a sala 1976'ê ev bû: 74 mîlyon dînaran ji bo endustriyê, 73 mîlyon dînaran ji bo cotyariyê, 72 mîlyon dînaran ji bo înşaat û lojmanan, 70 mîlyon dînaran ji bo raguhastin, komûnîkasyon û xizmetan. Divê 39 mîlyon dînarên din ku di butçeya komîteya bilind a ji bo karên Bakûrî de pêşdîtî ne, û dê ji bo beşên cîhê yên şaredarî, birêvebiriya herêmî û projeyên xizmetê yên piçûk bên veqetandin, li vê mêjerê bên zêdekirin.

Di warê pîşesaziyê de, pirr tiştî hatin çêkirin: sefîngeheke şekirê li Silêmaniyê, sazgeheke cixareyan li Hewlêrê, kargeheke qumaşên kurdî li Duhokê, û şîrketeke giştî ya xwedîkirina mirîşkan, li Hewlêrê jî, ava bûn. Kargeha çîmentoyê ya Şengalê hat mezinkirin. Sazgeheke berhemên betonarme, digel çend kargehên destî yên xaliyan û kargeheke dezî û honandina hevrîşimê hatin sazkirin. Çend sazgehên din jî anuha di înşaatê de ne, weke sazgehên xiştê li Hewlêr û Silêmaniyê. Projeyên sazgehên din jî hene.

Di warê perwerdehiyê de, pêşketinên mezin çêbûn.

Beşên nû li zanîngeha Silêmaniyê vebûn û şeş sed dibistanên seretayî, navîn û bilind hatin nûkirin. Bi dehan dibistanên seretayî, navîn û bilind ava bûn. Ji bo sala 1977-1978'ê, planeke înşakirina sed û bîst dibistanan heye.

Birêvebiriya perwerdeyê, Mala çand û belavbûna kurdî, akademiya zanyariya kurdî, birêvebiriya çand û ciwanan û Komeleya çandî ya kurd, bi karên weşandina tez û lêkolînên zanistî, vejîna mîrasa kurdî a di warê zanyarî, edebî û hunerî de, û pêşketina wijdan û çanda xelkî mijûl dibin.

Têgeha cotyariyeke di radeya bilind de, bi saya bikaranîna rêbazên cotyarî yên hemdem bi cîh bû. Di warê cotyarî, avdanî û avkêşiyê de, projeyên pirrhejmar çêbûn. Projeya bendava Baxmayê ku yek ji meztirîn bendavan tê hesibandin, li walîtiya Hewlêrê înşa bû, her weke projeya bendava Kulusê ya li Silêmaniyê. Projeya hewza Mexmûrê hê jî di qonaxa lêkolînê de ye, û proje weha mezin e ku bang li şiyanên teknîkî yên biyanî hat kirin. Projeyên têkildarên berhemdariya heywanan hatin pêşdexistin û di nav hemû walîtiyan de dabeş bûn. Wekî din, birêvebiriyên daristan û baxan bi giranî dîsa jî çalak bûn.


1 534 172 donimên erdên cotyariyê (T.w.: 3 835 430 km²), di nava şêst û neh hezar sed û heştê û heşt malbatên cotyarî de, li gorî zagona hjm. 90, par ve bûn. Xwedîkirin û dabeşkirina erdî bê navber jî didome.

Ji bo pêşketina xizmetên tenduristî û karûbarên civakî yên herêmê, mêjerên pêwîst hatin veqetandin.

Hemû saziyên tenduristiyê yên herêmê, piştî tamîrkirinê, dîsa jî vebûn. Nexweşxaneyeke ji bo nexweşiyên tûşîker li Hewlêrê îlan bû û, di her sê walîtiyan de, laboratuareke navendî ya xwedan hemû makîneyan û klînîkên pijîşkî saz bû. Nexweşxaneyeke nû, ya ku hemû makîneyên hemdem jî tê de hene, li Silêmaniyê vebû û nexweşxaneyên din di eyaletên her sê walîtiyan de çêbûn. Kampanyayên tenduristiyê yên tedawî û parastinê li dar ketin û nêzî sed taximên têkoşîna li dijî nexweşiyên herêmî saz bûn. Nexweşxane û dîspanser bi makîneyên pijîşkî yên hemdem techîz bûn û klînîkên muayeneyan di qezayên walîtiyan de vebûn. Navendên civakî, malên ciwanan û malên ji bo kesên êxtiyar û seqet ên ku di warê aborî de lawaz in jî bi cîh bûn.

Projeyên din di warê şaredarî, turîzm û înşaatê de hatin meşandin, ronîkirina bajaran, ceyrankirina çolteran û çêkirina xaniyên turîstîk ên pêşînşakirî jî di nav de. Li ser vê, peymaneke bi şîrketeke fransî re, ji bo techîzkirina navendên me yên tatîlê, îmze bû.

Wergera ji fransî: Simko Destan

# Riya ku ji antîkurdolojiyê ber bi kurdolojiyê ve diçe û Îsmaîl Beşîkçî **(Dewama rûpela 1.)**

di serdema Komarê de wê di meqamên girîng de bihata wezîfedarkirin. Li gor wî, diviyabû ku pêşî li ser eşîretan xebateke zanistî bihataya kirin. *"Gelo li welêt hejmara eşîran çend bû? Ka ev li ku deran û çawa dijiyan? Adet û tradîsyonên wan çi bûn? Û hwd. Divê berê ev tişt bên zanîn paşê li gor vê dest bi karekî bikin.."* (2) Di nav van xebatên ku ez wekî antîkurdolojî bi nav dikim, pirtûkek heye ji aliyê vê dezgehê ve hatiye weşandin heye ku mînakeke girîng e û dixwazim li ser rawestim. Naci İsmail [Pelister] ê ku di vê mudiriyetê de kar dikir, gelek pirtûk nivîsandibûn. Pirtûka bi navê "Kurd: Lêkolîna Dîrokî û Civakî" ya vî nivîskarî ku berê di Emniyet-i Umumiye Müdiriyeti [Mudiriyeta Ewlekariya Giştî] de xebitîbû û bi nasnavê Habil Adem dihat naskirin, di sala 1918 an de ji aliyê *Aşair ve Muhacirin Müdiriyet-i Umumiyesi* ve tê weşandin. Pirtûkeke wî ya din a bi navê "Beynelmilel Usûl-i Temsil: İskân-i Muhacirin" [Rêbaza Asîmîlasyona Navneteweyî: Bicihkirina Koçberan] di heman salê de ji aliyê vê mudiriyetê ve tê weşandin. Taybetmendiyeke din a van pirtûkan jî ew e ku navên nivîskarên wan hemû sexte ne. Di pirtûka bi navê "Kurd: Lêkolîna Dîrokî û Civakî" de ev agahî heye: "Muharriri: Doktor Friç, Berlin Şark Akademisi tarafindan neşr edilmişdir." [Nivîskar: Doktor Frîç, ji aliyê Akademiya Rojhilatnasiyê ya Berlînê ve hatiye weşandin.]

Piştî ku di sala 1991ê de her çend ez di çendîn pirtûkxaneyên Ewropayê de li nusxeya eslî ya vê pirtûkê geriyam jî, min peyda nekir, û şik û gumanên min zêde bûbûn. Dawîyê têgihiştim ku weşaneke weha ya Akademiya Rojhilatnasiyê ya Berlînê tunebû û nivîskarê rastîn ê vê pirtûkê Naci İsmail Pelister bû (3). Nivîskarê pirtûka din, a li jorê navgotî, wekî Von P. Goç hatiye nivîsandin. Him li ser van her du pirtûkan û him jî li ser gelek pirtûkên din ên Naci İsmail Pelister, wekî nivîskar hin navên ewropî yên çêkirî hatibûn nivîsandin ku di rastiyê de kesên weha tunebûn. Naci İsmaîl û û îttîhadîyên ku ew bi rê ve dibirin, bi awayê nivîsandina navê nivîskarekî ewropî –û di ser de jî doktor- û Akademîya Rojhilatnasîyê ya Berlînê dixwest hewayekî zanistî bidin kitêbê. Li gor pirtûka "Kürdler: Tarihi ve İctimai Tedkikat", zimanê kurdî "êdî qet nikare rabe ser xwe." (...). Zimanê kurdî yê kevin bi tu awayî nikare bê çareser bibe û bê tasnîfkirin". "Lêkerên Kurdî ne diyar in. Di ferhenga Kurdî de ku ji 8307 peyvan pêk tê, bi tenê 300 peyv bi eslê xwe Kurdî ne, peyvên din ji zimanên din hatine. Çîrokên ku Kurd dibêjin, ne malên Kurdan in. Kurd di dîrokê de nebûne xwedî roleke girîng. "Wekî ku tê gumankirin ne mumkin e ku mirov dîrokeke domdar a Kurdan peyda bike. (...) Ev dîrok serdemek ji dîrokên neteweyên din e." (4) Ez dê paşê werim ser vê meseleyê ka ev pirtûk di serdema Komarê de çawa hatiye bikaranîn.

Antîkurdolojî û xebatên nihênî yên kurdolojiyê yên bipergal ku di dawiya Yekemîn Şerê Cihanê de rawestiyabûn, piştî damezirandina Komarê dîsa hatin birêvebirin. Ji ber ku em nikarin di çarçoveya vê gotarê de bi awayekî berfireh li ser wan rawestin, ez dê bi tenê çend mînakên sereke bidim.

Hejmara pirtûkên li ser Kurdan ku di navbera salên 1920-1970 ê de li Tirkiyeyê hatine çapkirin, gelek kêm in. Pirtûkên ku hatine çapkirin di çarçoveya fikra desthilatdariya navendî de îddîayên weha hene ku dibêjin Kurd, yan Tirk in yan jî 'Tirkên çiyayî' ne. Nivîskarên pirtûkên bi vî rengî dikarin weha bên rêzkirin. Musa Kâzim Paşazade, Süleyman Sabri Paşa, M. Riza, Naşit Hakki Uluğ, Ali Kemali [Aksüt] ve Kadri Kemal Kop [Sevengil], Ömer Kemal Ağar, M. Şerif Firat, Mehmet Tevfikoğlu, İbrahim Arvas, Mehmet Eröz, M. Fahrettin Kirzioğlu, M. Salih San, Emekli Vali Edip Yavuz, "Ufuk Şehri" [Bajarê Asoyê].

Ji bo mijara me, pirtûka M. Şerif Firat a bi navê "Doğu İlleri ve Varto Tarihi" [Bajarên Rojhilatê û Dîroka Vartoyê] dikare wekî 'klasîk' bê binavkirin. Di vê pirtûkê de Firat îddîa dike ku wî *"bi çavkanî û rastiyan îspat kiriye ku bajarên me yên Rojhilatê ji avabûna dinyayê û vir de cih û warên eslî yên Tirkanin."* Firat herweha bi van gotinan pêşniyar dike ku divê Kurd dev ji zimanê xwe berdin: *"ê baş ew e ku ev birayên me yên Tirkên çiyayî dev ji vî zimanê xwe yê koma peyvan a bêmane û bêqiymet berdin. Ev yek jixwe, li nijada wan a Tirk a pîroz nayê."* (5) Tiştê ku vê pirtûkê dike girîng ew e ku M. Şerif Firat bi xwe Kurd e. Ev yek ji aliyê karbidestên dewletê ve dîtin girîng hatiye ku Kurdek îddîa dike ku Kurd, Tirk in. Firat di pîrtûka xwe de dibêje ku wî di dema serhildana Şêx Se'îd de giliyê dijberên dewletê kiriye û lê zêde dike: *"... Piştî vê wezîfeya pîroz a neteweyî di nav xelkê de bûbûm xwedî merheleyeke ewle û girîng. Êdî li cem Hukûmeta Vartoyê, Wîlayeta Mûşê û serfermandaran gotina min pere dikir û di nav qebîle û xizmên xwe de jî ji min dihat hezkirin û rêz li min dihat girtin."* (6)

Bi rastî jî Firat, ew pirtûka xwe bi riya fermandarekî, di 1948an de daye çapkirin. Ev fermandar bavê her du birayên navdar Turhan û İlhan Selçuk e. Turhan Selçuk ê karîkaturîst weha dibêje: *"Bavê min Kasim Selçuk li Mûşê serfermandarê alaya cendirmeyan bû. Wî ev pirtûk ji min re şandibû. Min jî ew li cem çapxaneya kovareke pêkenînê de ku navê wê niha nayê bîra min, da çapkirin û jê re şand."* (7) Çapa duyem a vê pirtûkê di sala 1961ê de bi fermana Muduriyeta Weşanê ya Wezareta Perwerdehiya Neteweyî careke din tê çapkirin. (8)
Di pirtûkên nivîskarên li jor hatine gotin de îddîayên bi vî rengî tên dubarekirin. Bi taybetî îddayên "Dr. Friç" ku me li jor behs kiribû, wekî 'delîlên zanistî' yên piştrast di gelekan de cih digirin.

Her weha weşanên naverok leşkerî û îstîxbaratî hene. Yên leşkerî ji aliyê efseran (sûbayan) ve hatine nivîsandin û piranî li ser operasyonên li dij Kurdan agahîyan didin. Yên îstîxbaratê jî piranî yên propagandayê ne.

Di vê serdemê de, ji bilî çarçoveya îdeolojîya resmî wekî xebateke îstîsnayî ya li ser Kurdan ku nehatiye weşandin dikare pirtûka bi navê "İhtiyat Kuvvet: Milliyet (Şark)" [Hêza îhtîyadî: Netewe (Rojhilat)] a Dr. Hikmet Kivilcimli bê gotin**.** (9) Xebateke din a îstîsnayî jî madeya Kurdan a Ansîklopediya Îslamê ye ku ji aliyê Wezareta Perwedehiya Neteweyî ve hatiye weşandin. (10) Ev madeya dirêj ku ji aliyê V. Mînorsky ve hatiye nivîsandin, her çend piştî hin guhertinan hatibe weşandin jî, balkêş e ku di ansîklopediyekê de ku aliyê wezaretê ve hatiye weşandin, cih digire. Ji ber ku bi qasî ku ez pê dizanim di wê serdemê de tenha weşana vekirî ku hebûna Kurdan û zimanê Kurdî înkar nake, ev e. Her weha tê gotin ku weşandina vê ansîklopediyê ji aliyê gelek neteweperestên Tirk ve hatiye rexnekirin û hatiye xwestin ku paş de bê kişandin, lê ji ber ku carekê hatiye weşandin ne mumkin bûye ku bê berhevkirin. Bi kurtî çarçoveya hemû xebatên bi navê antîkurdolojîyê hatine kirin ji alîyê îdeolojîya resmî ve hatiye danîn û di heman demê de ev xebat cihê berhemanîna îdeolojîya resmî bûne.

Rêbazeke din jî ew bû ku weşanên li ser Kurdan dihatin tahrîfkirin yan jî hin beş ji wan dihatin derxistin. Ne tenê dezgehên fermî yên dewletê herweha şexsiyet û dezgehên ne fermî yên cur bi cur jî heman tişt encam dane. Ezê bi tenê du mînakan bidim: Weşanxaneya Asya ku nivîsên Seîdê Nursî ji nû ve çapkirine û ji komên Nûrî [Nurcu] ne, di van nivîsaran de gelek tiştên girîng tahrîf kirine (11). Di çapa pirtûka Mevlânzade Rifat a bi navê Pişperdeya Şoreşa Tirkiyeyê de beşa li ser Kurdan û Kürdistan Teali Cemiyeti [Komeleya Berzkirinê ya Kurdistanê] hatine derxistin (12).

## II - Kurdolojiya nihênî

Xebatên li jor ku min wekî antîkurdolojî bi nav kirin, ew xebatên ji bo raya giştî bûn û hatibûn weşandin. Lê belê hin xebat jî hebûn ku bi tenê ji bo karbidestên dewletê hatibûn amadekirin û nehatibûn weşandin. Ev xebatên ku ji serokwezîran heta mufettîşên mulkiyeyê ji aliyê gelek burokratên pilebilind ên dewletê ve hatibûn nivîsandin, yan nehatin weşandin yan jî bi hejmareke gelek kêm hatin çapkirin daku bigihînin dezgeh û kesên fermî yên eleqedar. Li ser piraniya wan şerhên wekî *"gayet gizli ve zata mahsustur"* [gelek dizî ye û bi tenê ji bo şexsekî ye], *"mahrem ve hizmete mahsustur"* [nihênî ye û ji bo xizmeteke diyarkirî ye] hene. Dema ku behsa Kurdolojiya nihênî dikim, mebesta min xebatên bi vî rengî ne.

Him beriya Komarê him jî piştî komarê sedan rapor û pirtûk an broşurên dirêj û kin ên bi vî rengî hatin amadekirin. Ji ber ku mebesta wan agehdarkirina rayedaran bû daku li gor wê tedbîrên asîmîlasyon û ewlekariyê bistînin, dijberî belgeyên antîkurdolojiyê, tiştên ku di van raporan de hatine nivîsandin bi nisbî bêalî ne. Karbidest her çend ji derve re dibêjin 'Kurd nînin' an jî 'Kurd, Tirk in' di van rapor û pirtûkên navxweyî de danûstandineke realîst pêk hatiye. Di nav wan de gelek pêşniyarên dehşetnak jî hene. Hewldaneke gelek mezin hebû ku ev belge veşartî bimînin. Bi rastî jî, ev belge demeke dirêj veşartî mane û encax di van salên dawî de hin ji wan hatin aşkerekirin û weşandin.

Dema ku dewletê alavên antîkurdolojiyê pêşkeşî raya giştî kirine, alavên nihênî yên kurdolojiyê jî ji xwe re hiştine. Dîroka van xebatên duyemîn digihîje heta serdema Osmanî. Piştî ku Ziya Gökalp ket komîteya navendî ya Îttîat û Terakkîyê, bi tevkariya wî ev xebat bi awayekî rêk û pêk hatin birêvebirin. Bi navê xwe yê wê demê Ziya Efendî, di sala 1905an de digot *"neteweyeke xwedî ziman û wêje çima nebe xwedî azadî"* (13). Rojnameya Komeleya Piştgirî û Berzkirinê di sala 1909'an de radigihand ku Ziya Gökalp dê pirtûkên Gotinên Pêşiyan ên Kurdan, Ferhenga Kurdî û Rêzimana Kurdî biweşîne, (14) lê ew êdî yek ji îdeolojîst û rêvebirên girîng ên Îttîhat û Terakkîyê ye. Ji ber ku wî civaka Kurd ku ji nav dihat, baş nas dikir bandora wî ya li ser di diyarkirina 'metodeên zanistî yên asîmîlasyonê' gelek zêde dibe. Ji ber ku nasîna civaka ku asîmîlasyona wê tê xwestin, pêwîst e ew anketeke bi detay ya sosyolojîk amade bike û ev anket di sala 1914an de ji amîrên mulkî yên bajarên kurd re tê şandin. Ev anketa ku dikare wekî yek ji nimûneyên pêşî yên kurdolojîya nihênî bê hesibandin, tevî pirsan bi talîmatnameyekê ji merkezê tê şandin û tê xwestin ku "orîjînal yan kopya hemû materyalên li ser kurdan ji bo Stenbolê bên şandin." (15) Her çend nayê zanîn ku aqubeta van materyalan çi ye jî, Memduh Selîm sebaret bi vê mijarê serpêhatiyekê radigihîne. Halil Hayalî ferhengeke Kurdî-Erebî amade kiriye û ew daye Sineli Mihri [Muhammed Mihri Hilav] daku wateya wan a Farisî jî lê zêde bike. Lê belê Ziya Gökalp ev ferheng şewitandiye (16). Weha diyar dibe ku Ziya Gökalp ev ferheng piştî qebûlkirina tirkitiya xwe şewitandiye. Jixwe îmhakirin û şewitandina belgeyên li ser Kurdan dê di dema Komarê de bibe adeteke rojane. Wekî mînak, Musa Anter radigihîne ku di nav wan materyalan de ku Halil Hayali daye wî, gramera Kurdî ya Ziya Gökalp jî hebûye ku bi destxetê xwe nivîsandiye, lê belê Dadgeha Leşkerî ya Diyarbekirê ev belge desteser kirine û paşê jî şewitandine (17).

Anku ji aliyekî ve hemû curên sextekarîyê tên kirin, û xebat dimeşînin daku li ser Kurdan agahiyên 'çewt' hilberînin û hişê mirovan reş bikin, ji aliyê din de jî hemû weşanên li ser Kurdî û hebûna Kurdan tên qedexekirin (18), tên desteserkirin yan jî îmhakirin, bi cezayê zindanê jî pêşî li nivîsandina pirtûkên nû tê girtin.

Di serdema Komarê de xebatên nihênî yên kurdolojiyê him ji aliyê meqamên sivîl û him jî ji aliyê meqamên leşkerî ve hatine encamdan. Mînaka girîng a pêşîn a van xebatan raporek e ku di sala 1922an de ji aliyê Ziya Gökalp ve hatiye amadekirin. Kesê ku vê rapora bi sernavê "Li ser Eşîretên Kurdî lêkolînên Civakî" bi Gökalp daye amadekirin wezîr Dr. Riza Nur e ku bi fikrên xwe yên nijadperest tê nasîn. Nur dinivîse: *"...Gava ez wekîlê sihiyê bûm, karûbarên îskanê jî girêdayî vê wezaretê bûn û min ji vê yekê îstîfade kir û lêkolînek li ser kurdan bi Ziya Gokalp da çêkirin. Mebesta min jê civandina înformasyonê û bi awayekî zanistî û ekonomîk famkirina rewşê bû. Paşê min ê rêxistinek çêkiraya û ji kurdan re bigota ku ew tirk in.* (19) Riza Nur li cihekî din dîsa behsa heman raporê dike:

*"Ez li ber meseleya Kurdan dikevim. Tiştek nîne lê belê, ew dê rojekê rabin doza neteweyî. Divê ew bên asîmîle kirin. Min dest bi lêkolînan kir. Min li ser asîmîlasyonê pirtûk dan anîn. Min li ser Kurdan gelek pirtûk dan peydakirin. Min herweha pere ji bo Ziyap Gökalp şand ku li Diyarbekirê ye, daku ew rewşa erdnigarî, zimanî, qewmî, civakî ya Kurdan lê bikole. Wî raporek bi rê kir. Mebesta min ew bû ez vê meseleyê ji binî çareser bikim, berî ku ew der bibe Makedonya"* (20)

Ji wan dezgehên ku di vî warî de xebatên nivîskî meşandine yek jê jî Türk Ocaklari ye. Ev dezge piştî 1925'an, hin çavkaniyên li ser Kurdan ku ji aliyê Rûs, Îngîlîz, Alman, Fransiz û Ereban ve hatine nivîsandin, dide wergerandin daku ji



MAHMUT CELAYIR: **Li ser şopa siyê 2**, Diptycon, akrîlboyaxa ser tûwalê, 150 x 200 cm

wan sûdê werbigire, lê wan naweşînin (21). Em pê dizanin ku di vê serdemê de ku her kesê ku tiştekî binivîse ku bi îdeolojiya fermî li hev neke, bi cezayên giran dihat cezakirin, lê rayedarên Tirkan gelek pirtûkên biyanî yên li ser Kurdan ji bo xwe dane wergerandin. Wekî mînak, Serokkomar Celal Bayar û Serokwezîr Adnan Menderes pirtûka bi navê "Les Kurdes" a Basile Nikitin dane wergerandin (22). Saziya Radyo û Televîzyonê ya Tirkiyeyê (TRT) beşa yekem a pirtûka bi navê "The Kurds: an Historical and Political Study" a Hasan Arfa didin wergerandin û di raporeke bi mohra "Taybet ji bo xizmetê" de bi kar tînin (23). Serokê Saziya Dîrokê ya Tirk li ser teza doktorayê ya Messoud Fany [Mesud Fani] ya bi sernavê "La Nation kurde et son évolution sociale" hûr dibe û ferman dide wekîlê Meraşê Prof. H. Reşit Tankut daku li ser "têkilî û peywendiyên wê yên bi têgihiştina me ya dîrokî" agahiyê bide. Ew li ser vê tezê hûr dibe û agahî dide (24).

Pirtûka bi navê "Vanski i Bitliski Vilayeti" ya Mayevski û pirtûka bi navê Kurdi v voynakh Rossiye s Persiye i Turtsey v teçenie XIX stoletiya" ya Pyotr İvanoviç Averyanov ji Rûsî tên wergerandin û ya yekemîn di sala 1924an de û ya duyemîn jî di sala 1926an de ji aliyê meqamên leşkerî ve tên weşandin. M. Emin Bozarslan di sala 1968an de, piştî tîpguheziya wê, berhema navdar a Ehmedê Xanî ya bi navê Mem û Zîn bi wergera wê ya Tirkî diweşîne lê belê ji ber fikara cezaxwarinê cih nade him hin beşên pirtûkê û him jî pêşgotina Hemzeyê Muksî ya sala 1919an (25). Lê belê Prof. Hasan Reşit Tankut karibû pêşgotina Hemzeyê Muksî bide wergerandin û li cem xwe bihêle (26). Anku her çend ew kesên ku li gor îdeolojiya fermî dinivîsandin dikaribûn wan "nivîsarên qedexe" bi dest bixin, lê belê xwendevanên wekî me jî piştî gelek salan li Ewropayê ev nivîsar dîtin. Li vê derê, feyde heye ku em bi kurtî li ser mînakeke ji weşanên Serfermandariya Giştî ya Cendermeyan rawestin. Pirtûka bi navê Dersim ku li ser îbareya "Nihênî ye û ji bo şexşan e. Bi şerh sed heb hatine çapkirin." heye, li gor kitêbên di vî warî de xwedî gelek agahiyên girîng e. Di nav pirtûkê de gelek metnên raporan cih digirin. Gelek agahiyên berfireh tê de hene. Wekî mînak Mufettîşê Mulkiyeyê Hamdî Beg di rapora xwe ya li ser Dersimê di 2.2.1926 de ji Wezareta Karên Navxweyî re van pêşniyaran dike:

*"Di şûna mişextkiriyan de bicihkirina Tirkan(...) Piştî pêkanîna vê islahatê, ji bo 25 salan tayînkirina karmendên bîrdoz li vê herêmê û bi mîsyoneriy wan tirkkirina Kurdên herêmê.*

*Di vê serdemê de venekirina dibistanan, di dawîya 25 salan de piştî dayîna hest û terbîyeya Tirkitiyê û paşê vekirina dibistanan û perwedekirina xelkê. Yan na, fikra Kurdîtiyê dê bi ser keve."* (27)

Di raporeke din de em lê hay dibin ku dixwazin ji aliyekî ve Kurdan mişext bikin û ji aliyekî din de jî 500.000 Tirkan li Kurdistanê bi cih bikin. Ev hejmar ji bo salên 1920'an hejmareke gelek zêde ye:

*"Bi baweriya ku di sala 341 [1925] de herî zêde pêncî hezar kes bên rakirin û îskankirin... Di deh salan de ji bo bicihkirina pênc sed hezar kesên ji Yugoslavya, Bulxaristan, Qafqasya û Azerbaycanê li heremên li jor navgotî, divê ji 343 [1927]û pê ve her sal pênc mîlyon lîra ji bo butçeyê bên terxankirin."* (28)

Yekemîn Mufettîşê Giştî Avni Doğan di rapora xwe ya sala 1943an de behsa kiryareke trajî-komîk dike. Li gor vê yekê Wilayeta Diyarbekirê fermanekê çewt fêm dike û dest bi mişextkirina xelkê dike, "wîlayetên din jî naçar dimînin ku ew jî dest bi mişextkirinê bikin". An ku dewlet vê çewtfêmkirinê rast nake, dijberî vê yekê- belkî ji bo yeksaniya mişextkirinan (!)- dibêje madem li Diyarbekirê mişextkirinê dest pê kir, li wîlayetên din jî bila dest pê bike. Bi vî awayî, bi gotina Dogan, "Navên gelek kesên bêsûc bi çewtî ketin nav defteran ku bi lezûbez û bê lêkolîn hatibûn amadekirin, û ew tên mişextkirin (29).

Gotinên wezîrê kar û barên navxweyî yê Komarê Şükrü Kaya yên di fermannameyeke nihênî de ku jî dema Îttîhat û Terakkî xwedî tecrûbe bû, li ser mebest û metodan gelek agahiyan dide.

*"... Divê neyê jibîrkirin ku cil û berg, stran, govend, dawet û urf û adetên civakî hestên neteweyî û nijadî her tim zindî radigirin û civakan bi dîroka wan ve girêdidin. Lewma, wezîfeyeke neteweyî û girîng e ku dikeve ser milê her Tirkekî ku adetên bi vî rengî ku ziman jî tê de, wekî xerap û xeternak bibîne û nemaze xerap nîşan bide û bi tu awayî neyê teşwîqkirin û han dan û di her derfetê de naveroka wan a bêkêr û paşketî bên teşhîrkirin û wekî eyb û şerm bên nîşan dan, nav û laqabên malbat û şexsên ku bi vê lehçeyê dipeyivin bên Tirkîkirin, (...) guhertina navên gundan ku bi wê lehçeyê ne (...) li mala wan û navbera wan de bi wan Tirkî bidin xeberdan û bi wan ji dil bidin gotin ku ew Tirk in, bi kurtî Tirkkirina ziman, adet û daxwazên wan, girêdana wan a bi dîrok û qedera Tirkan ve wezîfeyeke millî û girîng ya her tirkekî ye"* (30).

Piştî gelek salan, li dû darbeya leşkerî ya 1960î wezîrê dewletê Orgeneral Cemal Gürsel di axaftina xwe ya li Diyarbekirê ji xelkê re gotibû ku "Ez dê li serçavê wî kesî tû bikim ku ji we re dibêje hûn Kurd in." (31) Gotinên wî bi giştî li gor ji xwe"*eyb û şerm*" kirinê ye.

Dema ku li Tirkiyeyê Îsmaîl Beşîkçî û hin rewşenbîrên din got ku "Kurdistan kolonî ye" gelek aliyên cur bi cur bi tundî nerazîbûn nîşan dabûn û gotibûn ku ev yek ne rast e, bi ser de jî mueyyîdeyên cezayî hatibûn bikaranîn. Lê belê, birêvebirên herî payebilind ên dewletê di gelek raporên xwe yên nihênî de mefhumên wekî "müstemleke tarz-i idaresi" (Rêvebiriya têşeya birêvebirina koloniyan), "kolonizasyon" (mêtîngehkirin) û "temsil" (bişavtin) bi kar anîbûn. Wekî mînak, di nav pêşniyarên Heyeta Dagheha Îstîqlalê ya Şerqê de ku pêşkeşî Wezareta Navxweyî kiribûn, ev yek hebû: *"damezirandina dezgeha mufettîşiya giştî ku selahiyeta vasî û butçeyê di destê wê de be, avakirina valitiya giştî û tatbîqkirina birêvebiriya têşeya birêvebirina mêtingehan li Rojhilatê"*, ji aliyê Wezîrê Navxweyî Cemil Bey ve wekî "min küll-il vücuh mucib-i faide" [ji her aliyê ve pêwîstiyeke sûdê] hatiye dîtin (32).

Rapora ku di sala 1939-1940î de ji sekreteriya giştî ya Partiya Gel a Komarê (CHP) re hatibû pêşkêşkirin bi awayekî aşkere nîşan dide ka li paş deriyên girtî li ser Kurdan çi difikirin: *"Bi dîtina me li Tirkiyeyê meseleya herî girîng a neteweyî meseleya Kurdî ye (...), bi navkirinên wekî 'Tirkên Çiyayî, Tirkên Zozanan' nedîtina rastiyê ji zirarê pê ve tiştekî nade, rabirduya wan çi dibe bila bibe em îro ne bi wan ne jî bi kesekî din nikarin bidin bawerkirin ku ew Tirk in.Lewma, pêwîstiyek e ku em bizanin ku li gelek deverên welêt hêmanên biyanî bi hev re dijîn,û li xwe mukir bên û tedbîrên xwe li gor wê bistînin. (...)*

*Teşebbusa herî dawî ya di vî warî de, di 21.06.[1]934an de bi derxistina zagona Îskanê ya hejmar 2510 pêk hat (...) Lê belê ruhê vê zagonê bi giştî temsil [bişavtin] û dahilî kolonizasyon [mêtîngehkirina navxweyî] ye.*

*(...) bêguman pêkanîna berfireh a vê îskanê piştî hesibandina hemû şertan bi tenê dikare bi avakirina makenîzmayek taybet kolonîzasyoneke navxweyî mumkin e ku ev dezgeh dikare bi îthalkirina siyaseta sereke ya dewletê bi selahiyeteke giştî kar bike.*

*(...) ji bo zarokên gundên ku piraniya wan Kurd in, divê dibistanên înternat bên avakirin. Mebesta van dibistanan dê ew be ku bi van zarokan zimanên wan ên dayîkê bide jibîrkirin û Tirkî têxin şûna wî."* (33)

Min berî niha jî gotibû ku nihênî mana raporan pir girîng bû. Serokwezîr İsmet İnönü dema ku di rapora Kurdî de planên beriya komkujiya Dersimê ya 1937-1938an dinivîsand, balê dikşîne ser ku divê hemû nihênî bimînin. Karmendên payebilind jî dê nehatana agahdarkirin:

*"Em ê wîlayeta Dersimê bi awayekî nû ava bikin. Fermandarên ser kar ên kolorduyê dê wekî walî û efserên ser kar jî dê wekî qeymeqam bên wezîfedar kirin. Heger hebin efserên teqawd jî wekî karmendên talî bên tayînkirin. (...) înfaza heta îdamê dê li wîlayetê biqede. (...) di 1935 û 36an de dê rê û qereqol bên avakirin. (....) Bi lezûbez Dersim ji çekan bên paqij kirin. Icraatên wîlayetê ku difikire ku bi darê zorê bên kirin û hukûmet pê agahdar kiribe dê bên kirin. Piştî wê dê merheleya dirûvê nû yê Dersimê dest pê bike. Ev hemû plan bi nihênî ne."* (34)

Di salên 1960î de, profesorên duvelank li ser Kurdan hin metodên nû pêşniyar kirin. Wekî vê pêşniyara ku armanca wê jihevqetandina Kurdên ku bi zaravayên cihê dipeyivin:
*"... niha em neçar in ku di riyekê de bimeşin. Ev rê jî: avakirina bendeke Tirkîtiyê di navbera Kurmancîtî û Zazakîtî."*

Ev bend dê weha bûbûna:
*"Ji Ercîşê heta Dersimê diyarkirina herêmeke bicihkirinê ku bi qasî pêncî kîlometreyan ber bi başûr ve biçe; ev yek girîng e ji bo ku em bi hêsanî û bi lezûbez bigihîjin armanca xwe. Ev bicihkirin dê bibe 'benda Tirkan ku herêmê dike du perçe'."*

Weha dihat fikirîn ku nemaze ji hêrema Deryaya Reş Tirk bên anîn û di navbera herêmên Kurmanc û Kirmanc (Zaza) bihatana bicihkirin (35). Bendeke bi vî rengî El-Hizame'l-'Erebi (Kembera Erebî) di sala 1962an de li Sûriyeyê di navbera Kurdan de hate destpêkirin û di serdema Baes de hate pêşdexistin.

Lê belê di vê heyamê de rewşa berhemên bi Kurdî û berhemên bi Tirkî ku ji aliyê rewşenbîrên Kurd ve li ser Kurdan dihatin nivîsandin çawa bû?

Di serdema Osmanî de gelek kêm pirtûkên bi Kurdî hatibûn çapkirin. Ev pirtûk, wekî mînak ferhenga Kurdî jî, hîna di sala 1906an de tê qedexekirin û tê ferman dan ku ji pirtûkfiroşan bê berhevkirin (36). Di atmosfereke kurt a azadiya nisbî de ku piştî ragihandina Meşrûtiyeta Duyemîn dest pê kiribû, Kurd hin komele dadimezirînin û hin weşanên demî diweşînin. Piştî tecrubeyên Kurdistan û Ummîd ku li Qahireyê hatibûn weşandin, li Stenbolê jî Şerq û Kurdistan, Rojnameya Komeleya Piştgirî û Berzkirinê ya Kurdan, Rojî Kurd, Yekbûn, Hetawî Kurd tên weşandin.

Lê belê rêvebiriya Îttîhat û Terakkîyê derfet nade van rêxistinên demokratîk ên Kurdan û weşanên wan ên demî ku jiyana xwe berdewam bikin.

Beriya Şerê Yekemîn ê Cîhanê, çend heb pirtûk û broşurên bi Kurdî tên weşandin. Her weha, piştî Mutarekeya Mondrosê di nav wan çend salan de ku kontrola hişk a rêvebiriyê nebû, li Stenbolê bi qasî panzdeh pirtûk tên weşandin. Piraniya wan berhemên olî û edebî ne. Di heman serdemê de ev kovar û rojame jî tên weşandin: Kovara Jîn, Gazî, Kurdistan, Rojnameya Jîn. Hemû berhemên ku li vê derê behsa wan tê kirin bi tîpên Erebî ne. Wekî din di sedala 19emîn de bi qasî deh pirtûkên Kurdî hene ku bi tîpên Ermenî hatibûn weşandin. Yek ji wan pirtûka xwendin/alfabe, ên din jî wergera Kurdî ya Încîlê bûn (37).

Di weşanên Kurdî-Tirkî yên demî de ku li jorê hatin rêzkirin, gelek nivîsên sebaret bi ziman, wêje, dîrok û civaka Kurdî hatine weşandin. Di nav nivîskarên Kurd ên van weşanan de, kesên navdar ên wê demê, wekî Dr. Abdullah Cevdet, Babanzade İsmail Hakki, Lütfi Fikri û Mevlanzade Rifat jî hebûn.

Di serdema ji navbera 1923-1970ê de ku Komara Tirkiyê zexteke mezin li ser zimanê Kurdî û weşanên li ser Kurdan dikir. Bi qasî ku hatine tespîtkitin bi tenê şeş berhemên bi Kurdî hatine weşandin ku hemû hatin qedexekirin. Di nav van pirtûkan de, Ferhenga Kurdî ya Musa Anter, Alfabeya M. Emin Bozarslan, Mem û Zîna Ehmedê Xanî û Gramera Kurdî ya mebûsê Ruhayê Kemal Badilli di navbera salên 1965-1968an de hatine weşandin.

Ji salên 1940î û pê ve, kovar û rojnameyên wekî Dicle Kaynaği (Çavkaniya Dîjleyê), Şark Mecmuasi (Kovara Şerqê), Şark Postasi (Posteya Şerqê), Mezopotamya, İleri Yurt (Welatê Pêşketî), Dicle-Firat, Deng, Roja Newe, Yeni Akiş (Herikîna Nû), Ezilenler (Bindest) tên weşandin. Hema hema hemûî di nav demeke kurt de tên qedexekirin û dawî li weşanên wan tê.

Di serdema Osmanî de pirtûkên bi Tirkî yên li ser Kurdan ku ji aliyê Kurdan ve hatibin nivîsandin gelek kêm in. Di vî warî de behsa du pirtûkan tê kirin. Pirtûka Emîr Bedîrxan a Ehmed Ramiz-i Kürdi û Mukaddimetü'l-İrfan a Muhammed Mihri (38).

Di dema Komarê de jî encax di sala 1966an de pirtûka bi navê Pirsgirêkên Rojhilatê ya M. Emin Bozarslan tê weşandin ku berhemeke civakî ya li ser Kurdan e. Di destpêka salên 1960î de, di rojname û kovarên Tirkan ên wekî Yön (Cihet), Bariş Dünyasi (Cîhana Aştiyê) de li jêr navê pirsgirêka 'Rojhilatê' nîqaşên li ser pirgirêka Kurdî dest pê dikin.



MAHMUT CELAYIR: **Li ser şopa siyê 1**, Diptycon, akrîlboyaxa ser tûwalê, 150 x 200 cm

Peyderpey jî li cem rêxistinên sosyalîst û li cem Partiya Karkerên Tirkiyeyê nîqaşên bi vî rengî pêk tên. Dîsa di salên 1960î de, di çapemeniya Tirk de nivîsên neteweperestên Tirk ên wekî Nihal Atsiz û İsmet Tümtürk tên weşandin. Atsiz, di nivîsareke xwe de pêşniyareke weha balkêş dike:*"... bêyî ku serê neteweya Tirk bixin belayê û berî ku ew bi xwe tune bibin, bila rabin biçin. Bi ku ve? Çavê wan ku der dît, dilê wan bijiya ku derê bila biçin wir. Bila biçin Îranê, Pakistanê, Hîndistanê, bila biçin cem Barzanî. Bila serî li Neteweyên Yekgirtî bidin û ji xwe re li Afrîkayê wareke bixwazin. Bila ji hevnîjadên xwe yên Ermenî bipirsin ka nijada Tirk çi qas bi sebr û aram e lê belê dema bêhna wan teng bibe wekî mîreşêran kes nikare li hember wan li ber xwe bide û bila hişê wan bê serê wan."* (39)

Xwendekarên Kurd ên zanîngehan li hember vê nivîsê, bi nivîsekê bi sernavê "Kî kê diqewirîne? Va ye Meydan!" nerazîbûn nîşan dan.

Di salên 1960'î de bûyereke din a girîng a siyasî jî avabûna Partiya Demokrat a Kurdistanê ye. Bi vî awayî, ji salên 1920î û pê ve cara peşîn di sala 1965an de partiyeke îlegal tê damezirandin. Pir pê naçe û di sala 1968'an de bi operasyonekê birêvebirên partiyê tên destgîrkirin û darizandin. Hin ji wan di dadgehê de parastina xwe dikin. Sala din Devrimci Doğu Kültür Ocaklari (DDKO) [Dezgehên Çandî yên Şoreşger ên Rojhilatê] tê damezirandin. Di xebat û weşanên xwe de ev rêxistin li dij tezên înkarkirinê yên îdeolojiya fermî dedikeve û bi awayekî aşkere dibêje: "Li Tirkiyeyê gelê Kurd heye... Ev hebûnek e ku bûye sedema bi zanîn paşdehiştina herêmên Rojhilat û Başûrê Rojhilata Anatolîyê." (40) Endam û birêvebirên DDKO'yê di sala 1970ê de tên girtin û di dadgehên birêvebiriya leşkerî ya Diyarbekir-Sêrtê de tên darizandin. Ev darizandin ji bo tevgera neteweyî ya Kurd li Bakurê Kurdistanê girîng in. Ji ber ku ciwanên Kurdan li pêşiya dadgeha di parastinên xwe de diyar kir ku ziman û gelê Kurd heye. Bi qasî parastinnameyan, cîlda pêşîn a qeydên doza DDKO'yê ku di sala 1975an de hat weşandin, li ser raya giştî bandoreke gelek girîng kir.

### III - Û Dr. Îsmaîl Beşîkçî

Gava ji ber nivîsarên xwe tê girtin, Îsmaîl Beşîkçî û DDKO yî cara pêşî pêrgî hev tên. Beşîkçî li girtîgehê bi wan re dimîne û pêvajoya parastina xwe li cem wan derbas dike. Lê belê Beşîkçî çawa hatibû wê derê?

Dema ku Beşîkçî dest bi nivîsandina li ser Kurdan kiribû, li welêt atmosfereke weha hebû ku min hewl daku li jor bi kurtasî vebêjim. Baldariya wî ya li ser vê mijarê bi nûçe û şîroveyên çapemeniyê dest pê dike. Ji ber vê baldariya xwe, di sala 1961an de dema ku di Fakulteya Zanistên Siyasî de xwendekar bû, her çend derfeta wî hebû ku li bajarên rojava stajê bike ew Elazîzê hildibijêre. Li wê derê gelek caran digel qeymeqam diçe seredana gundên Kebanê ku li wan deran dibîne ku gundî bi Kurdî dipeyivin û bi Tirkî nizanin. Bi gotina wî "Li Enqereyê dibêjin her kes Tirk e û zimanekî Kurdî nîne" lê belê " bêyî wergêr qeymeqam ji Kurdan tiştekî fêm nake". Ev nakokî wî dide fikirîn. Di sala 1963an de dema leşkeriyê, ji ber ku wî dixwest biçe Rojhilatê, Bedlîs hildibijêre û bi hevalekî xwe re cihê xwe pev diguherîne. Li Bedlîsê cara pêşîn Kurdên koçer dibîne, gelek caran diçe zozanên Nemrûdê û bi wan re dipeyive.

Di sala 1967an de li cem Zanîngeha Ataturkê ya Erziromê teza xwe ya doktorayê ya bi navê *"Organîzasyona Civakî ya Eşîreke Koçer ku zivistanê li deşta Farqînê, havînê jî li zozanên Nemrûd û Sîpanê derbas dike."* Ev tez encama xebata wî ya warlêkolînê bû û xebateke weha heta wê demê li Tirkiyeyê nehatibû kirin.

Di sala 1969'an de him pirtûka xwe ya bi navê *Li Rojhilatê Pirgirêkên Avabûn û Guherînê* û him jî pirtûka xwe ya *Pergala Anatolîya Rojhilat* diweşîne.

Di warê xebatên Kurdolojiye de, hin xweseriyên girîng hene ku Îsmaîl Beşîkçî ji nivîskarên din ên Tirk cihê dike. Beşîkçî xebatên xwe bi meraqa zanistekî dike. Hewlê dide ku lê bikole, li ser hûr bibe, hîn bibe û wan pêşkêşî zanîngehê, pêşkêşî raya giştî bike. Ew tu car nafikire rastiyên ku hîn dibe, ji bo berjewendiyên xwe tewş nîşan bide yan veşêre. Ne bi hesabê ku xwe ji hinekan re baş nîşan bide, lê belê bi duristiya zanistekî tev digere. Helbet ew jî dikare di bin bandora îdeolojiya fermî, zanîngeha ku lê dixwîne û çapemeniyê bimîne û hin tiştên çewt binivîsîne, lê belê vê yekê bi zanebûn nake. Ê herî girîng jî ew e ku bi duristiya zanistekî, dema ku hayê wî ji çewtiyên wî çêdibe xwe rexne dike û wan rast dike. Bi rastî jî, dema ku bi nêrînên xwe yên çewt yên pirtûka xwe *Pergala Anatolîya Rojhilat* dihese weha dike (41). Tabyuên Kemalîstan nas nake. Hîn di sala 1969an de dibêje ku: *"analîzên ku faktorên etnîk, ên ku heta niha tabu bûn, eger bi awirekî çînên civakî lê hûr nebe kêm dimînin, li hewa dimînin."* (42)

Di sala 1967an de, di kovara Forumê de, nivîsên wî yên li ser Kurdan û avabûna civakî ya 'rojhilatê' tên weşandin. Di heman salê de, piştî çend 'Mîtîngên Rojhilatê', mîtîngên Dersim û Agiriyê bi çavekî civaknasiyê temaşe dike, nivîsan li ser wan dinivîsîne. Beşîkçî wê pêvajoyê wekî destpêka nakokiyên xwe yên bi dewletê re dihesibîne. Wê demê di fakulteyên Zanist-Wêje û Zîraatê de dersên civaknasiyê dide. Ji ber ku mîtîngên Kurdan temaşe dike û li ser wan gotaran dinivîsîne, li zanîngehê li dij wî muxalefetek peyda dibe. Di sala 1968an de li dij wî lêpirsîneke îdarî tê vekirin. Piştî vê lêpirsînê dersên wî yên di fakulteya Zanist-Wêjeyê de tên astengkirin.

Di sala 1969an de li zaningeha bûyerên xwendekaran pêk tên. Hin xwendekar pir caran tên ba wî û nîqaşan dikin. Di nav van xwendekaran de Ahmet Aras, Nazif Kaleli, Ömer Polat û Kadir Manga –qadroyê THKO'yê ku wê paşê li çiyayên Nurhakê bihatana kuştin- hebûn. Beşîkçî bi sorkirina xwendekaran û bi jehrkirina mêjiyên wan tê tewanbarkirin. Di sala 1970'î de di encama lêpirsîna îdarî de ji karê xwe tê avêtin. Piştî wê, Beşîkçî wekî asîstanê sosyolojiyê dikeve Fakulteya Zanistên Siyasî. Piştî ku di 12ê adara 1971ê de artêş dest datîne ser rêvebiriyê, dosyeyên lêpirsînên îdarî dişînin serfermandariyên rêvebiriya leşkerî. Di nav wan daxwaznameyên gilîkirinê de ji bilî rektorê zanîngeha Ataturkê, hin dekan, profesor, asîstan û MHP'yî yên ji vê zanîngehê jî hene. Bi qasî şêst muxbîr îdda dikin: *"Beşîkçî cudaxwaziyê dike, Beşîkçî behsa Kurdan dike, Beşîkçî xayîntiya welêt dike..."* (43). Di encamê de di 19 Hezîranê 1971'ê de Beşîkçî li fakulteya Zanistên Siyasî tê girtin û wî dibin Diyarbekirê. Bi gotina, derdikeve û nema vedigere.

Li ser pirsên dozgerê rêvebiriyê leşkerî Beşîkçî dibêje Kurd û Kurdî hene û nivîsarên xwe diparêze. Bi vî awayî *"li xwe mukir tê û sûcê xwee qebûl dike"*. Ji vê darizandinê ku di 1972'an de bi dawî dibe, sêzdeh sal û heft roj ceza lê tê birîn.

Di girtîgeha rêvebiriya leşkerî de girtiyê DDKO, Partiya Karkerên Tirkiyeyê, Partiya Demokrat a Kurdistana Tirkiyeyê û Dev-Genç jî hene. Îsmaîl Beşîkçî nemaze bi birêvebir û endamên DDKO'yê re di nav têkiliyên xurt de ye. Digel vê komê di nav komuna bi navê 'Ocak Komünü' de cih digre.

Di 1971ê de Fikret Şahin, Mümtaz Kotan, İbrahim Güçlü, Yümnü Budak, Ali Beykoylü û Nezir Şemmikanli yên ji DDKO'yê bersiveke 167 rûpelî didin doznameya dozgerê birêvebiriya leşkerî. Piştî vê parêznameyê komeke din a DDKO'yê İhsan Aksoy û hevalên wî jî parastina xwe dikin.

'Ocak Komünü'di girtîgehê de xebatên xwendinê ên bidîsîplîn pêk tîne. Him di van xebatan de him jî parastina DDKO'yiyan de bandora Beşîkçî çêbûye. Beşîkçî herweha di darizandina xwe ya wê demê de jî parastina xwe kir. Her çend hinekan îddî dikin ku Beşîkçî bandora xwe pêş de biriye û beşa civaknasiyê ya bersiva DDKO'yiyan a li doznameyê ji aliyê wî ve hatiye nivîsandin (44) lê belê Mümtaz Kotan ku yek ji wan kesan e ku parêzname amade kiriye, dibêje ev yek ne rast e ji ber ku parêzname berhema xebateke hevbeş bûye û lê zêde dike: " Lê belê di warê şêwirîn, agahî û gengeşiyê de me ji Beşîkçî jî sûd wergirt." (45) Ji heman komê İbrahim Güçlü jî dinivîsîne ku Beşîkçî di amadekirina parêznameyê de tevkarî kiriye (46). Li gor Beşîkçî jî: *"Bersiva doznameyê bi xebateke hevbeş hat amadekirin. Gotûbêjên gelek dijwar pêkhatin. Lê ev gotûbêj her tim aso berfirehtir dikirin."* (47) Ji gotinên Beşîkçî jî diyar dibin, wekî ku Kotan jî radigihîne, di dema gengeşiyên girtîgehê de Beşîkçî çiqas girîngî dide parastinê: *"Kekê Îsmaîl (...) cara pêşîn bû ku ew qas bi hêrs ket. Wî got heger ev parastinname neyê dayîn ev mesele dê li vê derê biqede"* (48). Wî berê herweha ji Feqî Husên re jî gotiye: *"Ev yek îmtîhanek e. Hemî cîhan dê li vê îmtîhanê binihêre. Heger em li vê derê mesela Kurdî bi belgenameyan dest nîşan nekin emê gelek êş û azaran bikişînin."* (49)

Ji aliyê din de jî, tiştên ku li wê derê hatibûn serê wî û xebatên wî yên di nav komê de gelek bandor li ser wî kiribû û bi saya Kurdên ji çînên cur bi cur ên civakê civaka Kurd baştir naskiribû. Piştî bîst salan dema behsa wan deman dikir Beşîkçî dê bigotana: *" Di nav rejîma 12 adarê 1971'an de, di dawiya darizandinên Rojhilatê ya 1971'ê de hayê me jî qereqolên di mêjiyê me de çêbûn. Ev pêvajoya lêhaybûnê her ku çû aşkeretir bû.* (50) Di doznameya DDKO'yê de em dîsa rastî 'Dr. Friç' û pirtûka wî tên. Dozgerê birêvebiriya leşkerî, dema ku di doznameyê de hewlê dide ku nîşan bide ku Kurdî ne zimanekî cihê ye Prof. Dr. Friç wekî çavkanî nîşan dide. Anku doktorê xeyalî yê serdema Osmanî li vê derê dibe professor û wekî Prof. Dr. Friç tê pêşkêşkirin. 'Dr. Friç' 'însaf' dike û dibêje ku ji 8307 peyvên ferhengeke Kurdî bi tenê 300 heb bi eslê xwe peyvên Kurdî ne lê belê dozgerê navgotî dibêje 'bi tenê 30 heb peyvên Kurdî hatine dîtin.'(51) Musa Anter di rûniştinê de hew didebire û mafê xeberdanê distîne û dibêje: "Dozger Beg dibêje 30 peyv bi Kurdî ne. Mirîşk jî bi pircî peyvan dipeyivin, eyb nabe ku weha dibêje?" (52)

Di darizandinan de Îsmaîl Beşîkçî jî bi 'Dr. Friç' muxattab dibe. Dozgerê Dadgeha Ewlekariya Dewletê (DGM) Nuh Mete Yüksel di mutaalaya xwe ya 23.11.1992'an de îddîaya 'Dr. Friç' dubare dike û dibêje: "Bi tenê 30- kêm dike heta sîhî- peyv bi Kurdî ne." (53) Heman dozgerê DGM'yê di 11.03.2002'an de ji bo dozeke din doznameyek amade dike ku tê de dibêje: " Li gor Dr. Friç ku ferhenga Fransî-Kurdî- Rusî analîz kiriye, bi tenê 300 peyvên bi Kurdî hene û di vê rewşê de Kurdî nikare di bernameyeke zanîngehê de cih bigire (54). Mînaka Dr. Friç mînakeke îbretî yê balkêş e ku nîşan dide ka çavkaniyên fermî yên beradayî çawa tên hilberandin û di kîjan waran de dikarin bên bikaranîn.

Piştî efûya 1974an girtiyên siyasî ji zindanan derdikevin. Serokên Ocak Komünü weşanxaneya Komalê ava dikin û kovara Rizgarî diweşînin. Beşîkçî wê demê bi Komal û Rizgariyiyan re di nav têkiliyên nêzîk de bû, lê belê li gor serokê Rizgarî, Beşîkçî "di refleksên xwe yên siyasî û têgihiştina rêxistinî de" li derveyî wan bû û "di wî warî de tu qaîde qebûl nedikirin û dê nekirina jî." (55)

Weşanxaneya Komalê, dosyaya dozê ya wî û pirtûkên wî yên wekî *Metoda Zanistê, Îskana Mecbûrî ya Kurdan, "Teza Dîrokê ya Tirk" "Teoriya Roj-Ziman" û Pirgirêka Kurd, Destûra Partiya Xelk a Komarê (1927) û pirsgirêka Kurd.* Lê belê ev pirtûk tên berhevkirin û heqê wan de doz tên vekirin. Ev berhem li Tirkiyeyê, di warê kurdolojiyê de xebatên cîddî yên pêşîn bûn ku ji aliyê akademîsyenekî ve hatibûn nivîsandin. Him ev him jî pirtûkên wî yên din *Qanûna Tunceli (1935) û Nîjadkujiya Dersimê, Destûra Partiya Xelk a Komarê (1931) û Pirsgirêka Kurd, Bûyera Orgeneral Muğlali: 33 Gulle, Mêtingeha navdewleta Kurdistan* ku di destpêka salên 1990'î de hatibûn weşandin, hîna jî ji bo wan kesan ku li ser vê mijarê hûr dibin, çavkaniyên hêja ne.

Dema ku cuntaya leşkerî di 1980ê de tê ser hukum, Beşîkçî ji ber nivîsarên xwe li girtîgeha Sakaryayê ye. Roja pêşîn ku wî dibin vê girtîgehê bi wî îşkenceyên giran dikin. Îşkencekar weha qêriyane: *"Vî zilamî çi kiriye? Sucê wî çi ye?" "Vî zilamî nivîsar nivîsandine." "Heke nivîsar nivîsandibin, li tiliyên wî xin, li zendên wî xin, bila êdî nikaribe binivîse! Bila êdî tiliyên wî nikaribin qelem bigrin!"* (56) Beşîkçî, heta sala 1999an ji ber nivîsên xwe gelek car tê girtin û çendîn girtîgehan de dimîne. Lê di wan şert û mercan de jî di her derfetê de li ser Kurdan û pirsgirêka Kurd dinivîsîne. Lê belê ji ber ku ji derfetên xebat û lêkolînê yên pêwîst bêpar tê hiştin, di nav nivîsên wî yên ji 1980'ê pê ve berhemên lêkolîn û lêhûrbûnê kêm mane. Guherîn û pêşdeçûna fikrên wî ku ji çil salan zêdetir bi nivîsandinê vedigot, ji bo kurdolojiya li Tirkiyeyê girîng e û hêja ye ku li ser xebateke serbixwe bê weşandin.

Dema ku em li ser fikrên wî yên sebaret bi pirsgirêka Kurd radiwestin bi kurtasî be jî divê em behsa dîtinên wî yên li ser Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK) jî bikin. Di salên 1990î de hin pirtûkên wî tên weşandin ku tê de bi pesndayînê qala PKK û Abdullah Öcalan dike. Li hember hin Kurdan ku vê fikr û helwesta wî rexne dikin, PKK'yê û Abdullah Öcalan diparêze. Di van nîqaşan de, nivîsîne ku nameyên hin hevalên wî yên kevn ên dema DDKO û Komal ku li ser vê mijarê nivîsandine, daye PKK'iyan (57) ku vê helwesta wî, xwediyên van rêzikan jî tê de, gelek kesan matmayî dihêle. Piştî ku Abdullah Öcalan di 1999an de tê girtin û dev ji tezên xwe yên berê berdide û hin fikran dibêje ku dikarin ji aliyê karbidestan ve bên tolerekirin, Beşîkçî rexne li wî digire. Wekî mînak, behsa Öcalan dike û dibêje: *[Berê] digot "Gelê kurd gelekî bêrûmetkirî ye." Yanî gelek bêrûmet hatiye hiştin.* Ez difikirîm ku ev tesbîtek pir muhîm e*?* Lê piştî pêvajoya Îmralîyê ev yek hat famkirin: Têkilîyeke zêde ya Öcalan bi zimanê kurdî re, bi kultura kurdî re tuneye, meşxuliyeteke wî ya pir zêde bi vana re tuneye. Eger tu nikaribî navê welatê xwe jî bêjî, bi ya min bêrûmetiya muhîm ev e. Ji bili vê, êdî çi bêrûmetiyeke din dikare hebe? (58)

Dema ku Öcalan bi şêwaza xwe ya xas bersiva rexneyên Beşîkçî dide, pêşniyar dike ku di heqê wî de doz bê vekirin: *"...Ev êrîşên li dij min in. Heqaret li min tê kirin. Divê li hember wan xwe biparêzim. Ev yek bi rastî êrîşeke li dij dewletê ye jî. Ev yek çawa dikare bibe? Heger hewce be divê bi wan re bên peyivîn, doz divê bên vekirin. (...) Dewlet pişta wî digrin. Serê wan kesan ku dixwazin netewperestiya Kurdî bi kar bînin, li derve ye, ez bi yekê zanim"* (59) Van hevokên dawî gotinên Aziz Nesin tînin bîra mîrov. Wî jî li ser rexneyên Beşîkçî yên li ser pirsgirêka Kurdî, weha gotibû: "Tu dikarî bi tenê ajanê Îngîlîzan bî." Çend sal paşê dema van gotinan tînin bîra wî, dibêje ku wî ev gotin jî dil negotine lê ji ber ku bi hêrs ketiye gotiye. (60) Öcalan di axaftineke xwe ya din de dibêje "Beşîkçî Ziya Gökalpê Kurdan e." (61) Lê belê ji xeynî wê taybetmendiya wan a hevbeş ku her du jî bi pirsgirêkên neteweyan û civaknasiyê têkildar dibin, naveroka nivîsên wan gelek ji hev cuda ne. Gökalp wekî endamê komîteya navendî ya partiyeke şoven ku welêt bi rê ve dibe, hewl daye ku Kurd û neteweyêm din ên ne-Tirk bike Tirk û li gor vê fikra xwe nivîsandiye. Beşîkçî jî hewl daye ku bi lêkolînan diyar bike ka hebûna gelekî mazlum çawa tê înkarkirin, mafên wan çawa ji wan tên stendin û di riya fikrên xwe de demeke gelek mezin a jiyana xwe li zindanan derbas kiriye.

Bi baweriya min, tesîra nivîsarên Beşîkçî li ser kurdan mezintir e, ji qasî ku tê texmînkirin (62). Ji ber ku bi awayekî gelek sade û net, rewşa rastîn a Kurdan vedibêje, fikirên wî wekî darbeyên ku li mêjiyê mirov dikevin, û hişmendiya xwendekarên Kurd dihejînin. Wekî van hevokên wî ku rastiyên basît diyar dikin: *"Kurd di salên 1920'î de ji hev hatine veqetandin, parçekirin û parvekirin. (...) Çunkî, bo nimûne, eger em ji kurdekî bipirsin "Nifusa kurdan çiqas e?", dibêje, "çil milyon", hinek dibêjin "ji çil milyonan jî zêdetir". "Baş e çima navê te tuneye? Çil mîlyon nifusa te heye, çima li Neteweyên Yekgirtî, li Yekîtiya Ewropayê, li Konseya Ewropayê, li Konferansa Îslamê, li cihekî jî nave te tuneye?" (...) Lê, li Yekîtiya Ewropayê, Luxemburg em bêjin 400.000 nifusa wê heye, lê di bin biryarên weha de îmza wê jî heye: Em, li Rojhilata Navîn li dijî avakirina dewleteke kurdî ya serbixwe ne. Em, li Rojhilata Navîn li dijî guherîna sînoran in. Ev tê çi manayê? Tê vê manayê: Li ser musteqbelê kurdan em biryarê didin. Luxemburg, li ser musteqbelê te biryar dide! Yan jî Malta, yan jî Qibris! Di bin biryarên vî cûrî de îmza wan jî heye. Yan jî endamên Konseya Ewropayê hene. Bo nimûne Andorra, San Marino, Lichtenstein û Monako endamên Konseya Ewropayê ne ku ji 50 endaman pêk tê. Nifusa wan derdora 10.000 e, Lichtenstein nêzîkî*

*30.000 e, lê di tayînkirina musteqbelê kurdan de xwedî rol in. (...) Divê kurd li dijî vê yekê reaksiyonên nîşan bidin. Lê kurd bi giştî li dijî vê yekê reaksiyonên nîşan nadin. Bi a min ev zeafek e. Û ev zeaf divê li gel bûyerên 1920ê bê peyivîn* (63).

Divê diyar bikim ku Beşîkçî van gotinan û hin fikrên xwe yên din ên li ser Kurdan her car dîsa dibêje. Ev dubarekirina wî, weha diyar dibin ku ji ber ku girîngiyê dide van meseleyan lewma ji bi zanîn wan dubare dike.

Beşîkçî ne wekî wan akademisyenên ku naxwazin serê xwe biêşînin, lê belê wekî zanistekî tev digere, û li hember neheqiyan helwesta xwe nîşan dide. Bi salan e ku zanîngehên Tirk rexne dike ji ber ku li gor exlaqê zanistê tev nagerin û rastiyên sebaret bi Kurdan naynin zimên ew jî nikare tu bersivan bigre. Ev taybetmendiyên wî, dibin sedem ku li ba alîgirên îdeolojiya fermî bibe yekî bi xeter. Lê bawerîya kurdan jî zêdetir bi wî aniye.

Gelek kurdên ku di warê mafên netewî/grupî yên kurdan de baweriyê bi bi gotinên pûç û vala û xapînok yên wekî "biratî", "hevwelatiyê dereca yekem", "unsura eslî" naynin, serê saya nivîsarên kesên akademîsyenên îstîsna wek Beşîkçî û Fikret Başkaya û hejmareke kêm ya rewşenbîrên tirk fam dikin ku tirk jî dikarin rastîyan binivîsin, bawerîyê bidin. Lê ev yek weha bi hêsanî bi cih nehatiye.

Li ser vê mijarê Musa Anter weha gotibû:*"Li Tirkiyeyê alimên xwedî namûs ew qas hindik in ku hin kes rûmet û xwedînamusbûna Beşîkçî ya di warê zanistê de fam nakin. Gelek kes bi ecêbmayî vê yekê dipirsin: 'Gelo Îsmaîl Beşîkçî Kurd e?'"*. (64) Wezîfedarên resmî yên wekî polîs, gardiyan jî heman pirs ji Beşîkçî kiriye. Ew jî mat mane ku Tirkek behsa mafên Kurdan dike. Xizmên Beşîkçî jî di nav wan de. Dema ku zavayê wî tê girtîgehê daku seredana Beşîkçî bike, gazinan jê dike û weha dibêje: *"Ma mesela kurdan bi me ketiye? Ma em Kurd in?"* Rojek ji rojên girtîgehê li ser pirseke yuzbaşiyekî Beşîkçî dibêje ku wî li ser mijarên wekî Kurd û Îskana Mecbûrî ya Kurdan nivîsandiye mêrik şaşbûna xwe weha anîye ziman: *"Ma tu dîn î? Ma aqilê te nîne? Gelo tu dîn î yan baqil î?"* (65) An ku Beşîkçî bi nivîsarên xwe him Tirk him jî Kurd matmayî hiştine. Ez wekî ku Musa Anter dibêje nebûm şahid ku Kurd bipirsin ka Beşîkçî Kurd e yan na, lê min gelek cara bihîstiye ku digotin Beşîkçî qet ne Tirk e. Li gor wan kesan ku weha dibêjin, Tirkek nikare li ser Kurdan tiştên weha rast binivîsîne; Lewma Beşîkçî nikaribû Tirk be, lê Rum yan Ermenî. Mümtaz Kotan behsa îhtîmaleke din dike: *"[Îsmaîl Beşîkçî] cîranê mala diya min, hemşeriyê wê ye, û bi îhtîmaleke mezin yek ji wan malbatan tê ku bi demezirandina Komarê re bi riya mubadeleyê de ji Yûnistanê hatibûn Tirkiyeyê."* (66) Dema ku min ev pirs ji Beşîkçî kir, got ne rast e û lê zêde kir: *"Ji ber ku mubadele di salên 1920'î de pêk hat. Lê belê mala me ya berê ku niha hilweşiyaye, di sala 1826'an de hatibû avakirin."* (67)

Li Tirkiyeyê, rêvebir nemaze di pirsa kurdî de ji bo berdewamiya statukoyê li hember kesên li dijî îdeolojîya resmî derketine, hemû metodên cihê yên legal û ne legal bi kar anîne, zordarî kirine, ceza li wan birîne daku wan bêdeng bikin û bi piranî jî di warî de bi ser ketine. Gelek nivîskar, rewşenbîr, siyasetmedar û şoreşger ji ber tirsa cezakirinê, di darizandinan de fikrên xwe yên rastî înkar kirine, li wan xwedî derneketine. Ji ber heman tirsê gelek mirov dema nivîsandin û axaftinê xwe sansur kirine û fikrên xwe veşartine. Da ku ji cezayan bifilitin gelek nivîskaran di nivîsarên xwe de zimanê Ezopê bi kar aniye. Li Tirkiyeyê gelek akademisyen, nivîskar û hunermendên esilkurd ên navdar, nikaribûn bêjin ku ew Kurd in. Piraniya wan kesan ku nikaribûne bêjin ku Kurd in, bi gotinên wekî "Bi eslê xwe Kurd im lê xwe wekî Tirk hîs dikim", "Kurd im lê belê dilsozê dewleta xwe me, li dij Kurdan û cudaxwazan im", "Ez Kemalîst im" xwe ewle kirine. Mirov dikare vê tirsa wan fêm bike. Lê belê helwêsta Beşîkçî yê ku li dij tabuyên li ser Kurdan derketibû hatiye afarozkirin, helwêsteke neasayî ye. Bi berdêla cezayên giran, di nivîsarên xwe de pirsgirêk bi awayekî aşkere û bêyî ku 'sansur' bike diyar kiriye. Gelek caran hatiye darizandin, û her car bi şêwazeke Sokratîk li hember cezayan serî hildaye û parastina xwe kiriye. Ji ber parînznameyên wî heqê wî de doz hatine vekirin û ev yek weha berdewam kiriye. Her çend 17 salan di girtîgehê de hat hiştin û tûşî zordestiyan bû jî tu car serî dananî, di girêvên birçîbûnê û berxwedanên girtiyan, ên li dij cilên yek tîp, de beşdar bû û li ber xwe da. Min par ji Beşîkçî pirsîbû:

*"Dema ku hûn li hundir bûn di heqê we de gelek doz hatibûn vekirin û bi sedan salan ceza dihat xwestin. Heger zagon nehata guhertin wê ev ceza li we bihata birîn û belkî emrê we yê mayî hemûyê hûn dê li girtîgehê bimana. Gava hûn li serdi fikirin ku hûn ê heta dawiya emrê xwe di girtîgehê de bîminin, vê yekê hûn neditirsand?"*

Bersiva wî weha bû:

*"Dema mirov pêvajoyê fêm bike, têbigihîje, bi mefhumên zanistê bifikire, wê demê tirseke weha li cem mirov peyda nabe. Bêjim, anku li cem min tirseke weha peyda nebû. (...) Heger mirov hewlê bide ku pêvajoyê bi mefhumên zanistê fêm bike, têbigihîje ev yek ji bo mirov rehetiyeke gelek mezin e. Helbet polês, dadgeh her tim dibin sedema tirsê, sedema fikarê. Lê belê yê girîng ew e ku mirov xwe radestî vê tirsê neke."*



Mahmut Celayır: **Seyraneke dawiya havînê 1**, Diptycon, akrîlboyaxa ser tûwalê, 150 x 200 cm

1 Bruinessen, Martin van, Kürdolojinin Bahçesinde, [Di Bexçeyê Kurdolojiyê de] Mudiriyeta Giştî ya Eşîr û Muhaciran Weşanxaneya Vate, İstanbul, r. 171

2 Sertel, Zekeriya, Hatirladiklarim, [Bîrhatinên min] çapa duyem, Weşanên Gözlem, İstanbul, 1977, r. 81-82

3 Malmîsanij, "Meğer 'Dr. Friç' Kimmiş!", [Di Rastiyê de Dr. Friç kî ye] Kurdistan Press, Stockholm, Hejmar: 89 (21.11.1991)

4 Doktor Friç, Kürdler: Tarihi ve İctimai Tedkikat, [Kurd: Lêkolîna Dîrokî û Civakî] Aşair ve Muhacirîn Müdiriyet-i Umumiyesi Neşriyatindan, [ji weşanên Mudiriyeta Giştî ya Eşîr û Muhaciran] İstanbul, 1334 [1918], r. 12-20, 81-82

5 Firat, M. Şerif, Doğu İlleri ve Varto Tarihi, [Bajarên Rojhilatê û Dîroka Vartoyê] Çapa 5., Türk Kültürünü Araştirma Enstitüsü Yayinlari, [Weşanên Enstîtuya Lêkolîna Çanda Tirk] Ankara, 1983, r. XVIII, 17

6 Firat, Atilla, Açik Mektup (Hormek'den Notlar) [Nameya Vekirî- Nîşeyên ji Hormek], Ankara, 1987, r. 12

7 Arslan, Ruşen, Şeyh Said Ayaklanmasinda Varto Aşiretleri ve Mehmet Şerif Firat Olayi, [Di serhildana Şêx Seîd de eşîrên Vartoyê û bûyera Mehref Şerif] Weşanên Doz, İstanbul, 2006, r. 74. Her weha binihêrin. Firat, Atilla, r. 26

8 Nivîskarê Dersîmî Cemil Gündoğan li ser vê pirtûkê serpêhatiyeke xwe weha vegot: *"Bavê min ê karmend gelek ditirsiya ku li malê pirtûk hebin. Wî pirtûkên min dişewitandin. Di destpêka salên 1970'ê de, rojekêdema ku min dît ku pirtûkek di bin cengê wî de hat malê, min bi ecêbmayî jê pirsî. Nebêje qeymeqam ferman daye hemû karmendên li navçeyê ku pirtûka M. Şerif Firat bixwînin. Ê rastî, wî ev pirtûk firotibû her karmendî. Li mala me, pirtûka ku di ewlehiyê bû, ev pirtûk bû."*

9 Kivilcimli, di xebateke xwe de ku bi şîroveya xwe ya xas a Marksîst amade kiriye û pêşkêşî komîteya navendî ya Partiya Komunist a Tirkiyeyê ya neqanûnî kiriye, digihîje wê encamê ku rêvebiriya Tirk li Kurdistanê metodên kolonyalîzmê bi rê ve dibe. Lê belê xwendekar, ji vê berhêma ku di sala 1930'an de hatiye amadekirin, encax di sala 1979'an de piştî weşandina wê agahdar bûne

10 Ansîklopediya Îslamê, c. 6, Milli Eğitim Basimevi [Çapxaneya Perwedehiya Neteweyî], İstanbul, r. 1089-1114

11 Ji bo mînaka binihêre. Malmîsanij, Said-i Nursi ve Kürt Sorunu, [Seîdê Nursî û Pirsgirêka Kurdî] Weşanên Jîna Nû, Uppsala, 1991, r. 52-74

12 Binihêre. Malmîsanij, "Yeni Bir Kitap Yeni Bir Sahtekârlik" [Pirtûkek Nû, Sextekariyeke Nû], Medya Güneşi, İstanbul, Hejmar: 51, r. 16

13 Örgeevren, Ahmet Süreyya, Şeyh Sait İsyani ve Şark İstiklâl Mahkemesi (Serhildana Ş. Seîd û Mahkemeyên Îstiqlal yên Şerq,) Temel Yayinlari, İstanbul, 2002, 173-174

14 Kürt Teavün ve Terakki Gazetesi [Rojnameya Teavun û Terakkî yê Kurd], İstanbul, Hejmar: 6 (27 Kânûn-i evvel 1324 [1909])

15 Dündar, Fuat, Modern Türkiye'nin Şifresi [Şîfreya Tirkiyeya Nûjen], Weşanên İletişim, İstanbul, 2008, r. 401-405

16 Büyükkaya, Necmettin, Kalemimden Sayfalar [Rûpelên ji pênûsa min], Weşanxaneya Vate, İstanbul, 2008, r. 214

17 Anter, Musa, Hatiralarim [Bîrhatinên Min]. Weşanên Doz, İstanbul, 1990, r. 67

18 Mînak, T. C. Resmi Gazete (14 Sibat 1967) biryareke weha dide: "*Qedexekirina anîna her cure weşan, plak, tomarên dengî û her wekî din ku li derveyî welêt hatine weşandin; ji aliyê desteyê wezîran ve di 25.01.1967'an de hate birayrdan...*"

19 Gökalp, Ziya, Pirtûkên wî 1, YKY, İstanbul, 2007, r. 560

20 Nur, Dr. Riza, Hayat ve Hatiratim [Jiyan û Bîrhatinên Min], c. 3, r. 906 ji devê: Şevket Beysanoğlu, binihêrin. Gökalp, Ziya, Pirtûkên wî 1, r. 629

21 Devrimci Doğu Kültür Ocaklari Dava Dosyasi 1 [Doza Dezgehên Çandî yên Şoreşger ên Rojhilatê], Weşanxane û Belavgeha Komal, Ankara, 1975, r. 165

22 Bayrak, Mehmet, Kürtler ve Ulusal-Demokratik Mücadeleleri Üstüne [Li ser Kurdan û Têkoşînên wan ên Demokratîk-Neteweyî], Weşanên Öz-Ge, Ankara, 1993, r. 26

23 Arfa, Hasan, Kürtlerin Kisa Bir Tarihi [Kurteya Dîroka Kurdan], Werger: Mudiriyeta Nûçeyên Derve ya TRT, Çiviyazilari, İstanbul, 1998

24 Bayrak, Mehmet (Hazirlayan), Açik-Gizli/Resmi-Gayriresmi...[Dizî-Aşkere/Fermî-Nefermî], r. 125-128

25 Jîn kovara kurdî-tirkî/Kürdçe-Türkçe 1918-1919, c. I, Tîpguhezî: M. Emin Bozarslan, Weşanên Deng, Uppsala, 1985, r. 158

26 Bayrak, Mehmet (Hazirlayan), Açik-Gizli/Resmi-Gayriresmi...[Dizî-Aşkere/Fermî-Nefermî], r. 326-328

27 Dersim, T. C. Dahiliye Vekaleti Jandarma Umum Kumandanliği, III. Şb. 1. Ks., Hejmar: 55058, r. 201

28 Aktaran: Bayrak, Mehmet, Kürtler ve... [Kurd û…], r. 484

29 Bayrak, Mehmet (Hazirlayan), Açik-Gizli/Resmi-Gayriresmi...[Dizî-Aşkere/Fermî-Nefermî], r. 264

30 Aktaran: Bayrak, Mehmet, Kürtler ve... [Kurd û…], r. 508-509

31 Beşîkçî, Îsmaîl, "Rejimin Ana Niteliği IV" [Çawaniyên Bingehîn ên Rejîmê] http://www.argun.org/page/37/?s=b%C3%AA

32 Aktaran: Bayrak, Mehmet, Kürtler ve... [Kurd û…], r. 471

33 Aktaran: Bulut, Faik, Kürt Sorununa Çözüm Arayişlari [Lêgerînên Çareseriyê ji bo Pirsgirêka Kurdî], Weşanên Ozan, İstanbul, 1998, r. 182-190

34 Öztürk, Saygi, "İsmet Paşa'nin Kürt Raporu" [Rapora İsmet Paşa ya li ser Kurdan], Hürriyet, İstanbul, 8-10 Eylül 1992, r. 7

35 Bayrak, Mehmet (Amadekar), Açik-Gizli/Resmi-Gayriresmi... [Dizî-Aşkere/Fermî-Nefermî], r. 220 ve 230-31

36 BOA. DH.MKT, 1097/41, Tarîx: 15/Ca/1324 (Hicrî)

37 Ji bo bêhtir agahiyên li ser weşangeriya Kurdî binihêre:M. Malmîsanij, Türkiye ve Suriye'de Kürtçe Kitap Yayimciliğinin Dünü ve Bügünü [Li Tirkiye û Sûriyeyê Roja Duhî û Îroyîn a Weşangeriya Kurdî], Weşanxaneya Vate, İstanbul, 2006; Malmisanli [Malmîsanij], Mehmet, "Osmanli Döneminde Yazilan ve Basilan Kürtçe Eserler Üzerine" [Li ser Berhemên Kurdî ku di serdema Osmanî de Hatine Nivîsandin û Weşandin], Tarih ve Toplum, İstanbul, Hejmar: 54 ve 55 (1985)

38 Her çend çavkanî nîşan didin ku ev pirtûk di sala 1918'an de hatiye weşandin jî min ew peyda nekir

39 Ötüken, Hejmar: 40, nîsan 1967, r. 6

40 Devrimci Doğu Kültür Ocaklari Dava Dosyasi 1 [Doza Dezgehên Çandî yên Şoreşger ên Rojhilatê], r. 625

41 Beşîkçî, Îsmaîl, Doğu Anadolu'nun Düzeni: Sosyo-Ekonomik ve Etnik Temeller-I [Pergala Anatolîya Rojhilat: Bingehên Sosyo-Ekonomîk û Etnîk], 3. baski, Yurt Kitap-Yayin, Ankara, 1992, r. 14-18

42 Beşîkçî, Îsmaîl, yage, r. 11

43 Malmîsanij, Bu Kürtleri Nereden Çikardin Îsmaîl Beşîkçî? [Ma Îsmaîl Beşîkçî te ev Kurd ji ku derxistin?], Weşanên Vate, İstanbul, 2009, r. 31-35

44 Gürbilek, Nurdan & Savaşir, İskender, " Bir Kürt Aydini: Fakih Hüseyin Sağniç" [Rewşenbîrekî Kurd: Fakih Hüseyin Sağniç], Defter, İstanbul, Hejmar: 11 (Kasim-Ocak 1990), r. 72

45 Kotan, Mümtaz, Yenilginin İzdüşümleri (Şopesiyên Têkçûnê), Yunan Kürt Dostluk Derneği Yayinlari, Atina, 2003, r. 534-535

46 Beşîkçî, Îsmaîl (Editör), Resmi Tarih Tartişmalari-6: Resmi Tarih'te Kürtler [Nîqaşên li ser Dîroka Fermî-6: Di dîroka fermî de Kurd], Weşanên Maki, Ankara, 2009, r. 262

47 Sorum üzerine Îsmaîl Beşîkçî'nin yaptiği açiklamadan [Hevdîtina digel Beşîkçî]

48 Kotan, Mümtaz, r. 529

49 Gürbilek, Nurdan & Savaşir, İskender, r. 71

50 Beşîkçî, Îsmaîl, Doğu Anadolu'nun Düzeni: Sosyo-Ekonomik ve Etnik Temeller-I [Pergala Anatolyaya Rojhilat: Bingehên Sosyo-Ekonomîk û Etnîk], çapa 3'em, r. 16

51 Devrimci Doğu Kültür Ocaklari Dava Dosyasi [Doza Dezgehên Çandî yên Şoreşger ên Rojhilatê] 1, r. 21-22

52 Kotan, Mümtaz, r. 507

53 Beşîkçî, Îsmaîl, Bilincin Yükselişi, [Berzbûna hişmendiyê] Weşanên Yurt Kitap, Ankara, 1993, r. 305

54 Dündar, Fuat, r. 140

55 Kotan, Mümtaz, r. 392

56 Malmîsanij, Bu Kürtleri Nereden Çikardin Îsmaîl Beşîkçî? [Ma Îsmaîl Beşîkçî te ev Kurd ji ku derxistin?], r. 56

57 Beşîkçî, Îsmaîl, PKK Üzerine Düşünceler: Özgürlüğün Bedeli [Fikrên li ser PKK'yê: Berdêla Azadiyê], Weşanên Melsa, r. 167,183

58 Malmîsanij, Bu Kürtleri Nereden Çikardin Îsmaîl Beşîkçî? [Ma Îsmaîl Beşîkçî te ev Kurd ji ku derxistin?], r. 123-124

59 http://www.rizgari.com/modules.php?name=News&file=article&sid=3739

60 Kurdistan Press, Stockholm, Hejmar: 26 (13.11.1987), r. 3

61 http://www.kovarabir.com/kurdistan-ulusal-sorunu

62 Îsmaîl Beşîkçî, bandora xwe li ser Kurdologên Ewropî jî kiriye. Wekî mînak, Martin van Bruinessen, wî wekî yek ji sê mamosteyên we yên di warê lêkolînê de dihesibîne û dibêje: "Wî berî ku ez dest bi lêkolînên xwe yên Kurdan bikim bandora xwe li ser kiribû." (Bruinessen, r. 8)

63 Malmîsanij, Bu Kürtleri Nereden Çikardin Îsmaîl Beşîkçî? [Ma Îsmaîl Beşîkçî te ev Kurd ji ku derxistin?], r. 111-117

64 Anter, Musa, Hatiralarim, [Bîrhatinên min] 2. cilt, Doz Yayinlari, İstanbul, 1992, r. 120

65 Malmîsanij, Bu Kürtleri Nereden Çikardin Îsmaîl Beşîkçî? [Ma Îsmaîl Beşîkçî te ev Kurd ji ku derxistin?], r. 66

66 Mümtaz Kotan, r. 393

67 Malmîsanij, Bu Kürtleri Nereden Çikardin Îsmaîl Beşîkçî? [Ma Îsmaîl Beşîkçî te ev Kurd ji ku derxistin?], r. 7

* Eslê vê gotarê dirêjtir bû, me bi destûra nivîskarî ew ji bo *Le Monde Diplomatique'*ê hinekî kurt kir.

** Lêkolîner, nivîskar

Wergera ji tirkî: A. Celil Kaya
Redaksiyon: Remzî Kerîm

## BURÛNDÎ

# Mînaka ruwandayî li Burûndiyê belav dibe

COLETTE BRAECKMAN *



MAHMUT CELAYIR: **Reya îpekê 1**, glover, ∅ 40 cm

Di roja 26'ê tebaxa dawîn de, li Bujumburayê, serokkomarê burûndî Pierre Nkurunziza'yî ji bo peywireke duyem a pênc salan sond xwar, lê ji nav serokdewletên dunyayê, bi tenê cîranê wî Paul Kagame, serokkomarê Ruwandayê, amade bû. Ruwanda û Burûndî pirr caran weke "cêwiyên nerast" tên nasîn: ew her du ji hêla Belçîkayê ve hatin dagirkirin, û ew dîroka nakokî û komkujiyan navbera Tutsî ku li Ruwandayê pirrhejmar in, û Hutuyan ku li Burûndiyê pirrhejmar in, par ve dikin. Lê li her du aliyên sînorê, daneyên pirsgirêkê û bersivên dayî ji hev cuda ne.

Panzdeh salên bi pey jenosîda Tutsiyan a 1994'ê re, Ruwanda hê jî di bin desthilata Eniya Welatparêz a Ruwandayî (EWR) de ye. Ev yek, bi armanca ji nû ve sazkirina nasnameya neteweyî, yekser danasîna nijadê li ser belgeyên resmî betal kir û hemû curên îfadeya nijadî hatin qedexekirin. Destûra bingehîn a nû (ku di 2003'ê de hat îlankirin) û zagona li ser rêlibergirtina jenosîdê, vê tercîhê piştrast dikin. Lê belê, komeleya Efûya Navneteweyî, di şêwirmendiyeke ji bo hikumeta ruwandayî de, weha nirxand ku ev belge zagon nediyar in û bi awayekî zêde berfireh tên fêmkirin: tê gotin ku ew ji bo vederkirina muxelîfên muhtemel jî tên bikaranîn. (1) Du berbijêrên hiblijartina serokkomarî ya gelawêja 2010'ê weha bi "îdeolojiya jenosîder" hatin mehkûmkirin û girtin bin çavan; serredaktorê rojnameyekê jî hat girtin.

Li Burûndiyê, bi pey îmzekirina Peymana Aruşayê ya sala 2002'ê ji bo aştî û lihevhatinê re, boçûneke cûda jî hat bijartin. Ev peyman ha, bi saya navbêrkariya kevneserokkomarê başûr-afrîkî Nelson Mandela'yî hat îmzekirin, û dawî li deh salên şerrê hindûrîn anî; şerrekî ku di 1993'ê de, paşê kuştina serokkomarê hutu Melchior Ndadaye'yî û berteka tundrew a artêşê ku bi pirranî tutsî ye, dest pê kiribû. Di vê belgeyê de, heyîniya her du nijadan nayê înkarkirin; berevajî vê jî, ew bi awayekî vekirî tê diyarkirin û mijarê siyaseteke kotayan e: Meclîsa neteweyî ji % 60 Hutuyan û % 40 Tutsiyan pêk tê, Senato hevpar e û hikumet di bin rêvebiriya serokkomarekî û du cîgirên serokkomarî de ye ku ji nijad û partiyên siyasî yên cuda dertên; herçî artêş ku ji bo demeke dirêj weke saziyeke "yeknijadî ya tutsî" dihat nasîn, nuha nîvê leşkerên wê ji her du civatan pêk tên û endamên tevgerrên îsyanker ên berê jî tê de hene.

Rêxistinên ku anuha ji bo desthilatê li dijî hev têdikoşin, hemû "hutu" tên hesibandin: Desteya Neteweyî ya ji bo parastina demoqrasiyê - Hêzên parastina demoqrasiyê (CNDD-FDD) ya serokkomarê nuha, Eniya ji bo demoqrasiya li Burûndiyê (Frodebu), partiya serokkomarê berê Ndadaye'yî, û Eniya neteweyî ya rizgariyê FNL-Palipehutu ku herî dawîn dev ji têkoşîna çekdarî berda. Ji tevgerrên " hutu ", ev yek ya herî kevn e, û bi awayekî xurt bi desthilata ruwandayî ya nijadkuj ve girêdayî bû. Bi pey komkujiyên 1972'yê re ku ji hêla Tutsiyan ve li Burûndiyê hatin kirin, û koça Hutuyan ber bi Tanzanyayê ve, FNL'ê di wargehên pênaberan de endamên nû girtin nav xwe. Bi şûn ve jî, wê ji daristanên Başûr-Kivûyê, li Komara demoqratîk a Kongoyê (KDK), operasyonên xwe dest pê kir û têkiliyên hereketwarî digel Hutuyên ruwandayî yên Hêzên demoqratîk ji bo rizgarkirina Ruwandayê (FDLR) ku li KDK'yê çalak bû, daynî. (2)

FNL'a ku qetliama pênaberên tutsî li Gatumbayê (li rojavayê Burûndiyê), di 2004'ê de, bi beşdariya Hutuyên ruwandayî û leşkerên kongoyî, girt ser xwe, bi tenê paşê sala 2008'ê çekên xwe danîn û xwe weke partiya siyasî saz kir. Ev ji salekê kêmtir e ku şervanên wî vegerriyan welêt. FNL-Palipehutu, di herêmên nêzîkî Başûr-Kîvû û eyaleta Bujumburaya çolterî de, xwediyê hîmên leşkerî û piştevanên pirrhejmar e; ew karên nelirê yên CNDD-FDD'ê rûreş dike û, li hemberî vê, xwe weke alternatîvekê dide xuyakirin. Herçî CNDD-FDD'yê ku siftê weke rêxistineke hutu naskirî bû, paradoks jî ev e ku nuha, têkiliyên wê yên digel Eniya welatparêz a Ruwandayî (FPR), rêxistina tutsî ku li Ruwandayê desthilatdar e, pirr baş in. Ji ber ku hikumeta Kîgaliyê (3) ji Frodebu û bi taybetî ji FNL'ê nefretê dike, lewre ku îdeolojiya wê weke îdeolojiyeke " nijadkuj " dihesibîne. Ev salên dawîn, di warê ewlehiyê de (artêş, polîs), hevkariyeke kûr navbera her du welatan pêş de ket, heta ku Bujumburayê jî, bê dilwasî, muxelîfê Deo Mushayîdî ji bo Kîgaliyê veder kir. Ev Tutsî ku sax ji jenosîdê filitîbû, li Belçîka'yê koçber bû û rojnamegeriyê dikir, heta ku ew vegerriya Burûndiyê daku tevgerreke muxalefeta çekdarî ya li dij serokkomarê Ruwandayê Kagame ava bike.

Digel otorîtarîzma wan jî, her du desthilat ji piştgiriyên biyanî yên nêzî pêxweşiyê sûdê werdigrin. Di dema vederkirina nûnêra komeleya Human Rights Watch (Çavdêriya Mafên Mirovan) a gulana 2010'ê de ku kiryareke hevpar a her du welatan bû, û dema ku nûnerê taybet ê Rêxistina Neteweyên Yekbûyî (RNY) yê yek berî dawî ji hêla Burûndiyê ve hat derêxistin, "civata navneteweyî" bêdeng ma. Ev misamehe bi viyana parastina "çîrokên serkeftî", û bi daxwaza teşwîqkirina desthilatên ku di "têkoşîna li dijî terorîzmê" cîheke girîng girt, şîrove dibe. Bi taybetî, Burûndiyê, di çarçoveya Afrisomê de (operasyona leşkerî ya RNY'ê) hêzeke ji hezar leşkeran pêkhatî şiyand Somaliyê. Ji ber vê piştevaniya leşkerî jî, ew weke Ugandayê ji hêla "şebaban" ve, yanî îslamperestên somalî yên bi El-Qaide'yê ve girêdayî, bi kiryareke sizaker tê çewisandin. Herçî Ruwanda ye, wê 3 300 parêzvanên aştiyê, quweteke jinan jî di nav de, şiyandin Darfurê.

Hilbijartina serokkomarî ya gelawêja 2010'ê ku encamê serkeftina Kagame'yî ya digel % 93 rayan jê derket, weha pêşleyistî dixuya ku Yekîtiya Ewropayê pêwîstiya şandina peywirdareke çavdêriyê nedît. Bi tenê Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê, bi dengê Johnnie Carson, cigirê dewletê ji bo karûbarên Afriqayê, li ser qedera muxalefet û tunebûna azadiya îfadeyê mêraqdariya xwe anî zimên. Li Burûndiyê, dengdana serokkomarî ya hezîrana 2010'ê ku bi serkeftina Nkurunzîza'yî ya digel % 91 dengan bi encam bû, bi tenê dawiya pêvajoyeke marjînalîzekirina partiyên muxelîf bû. Lê belê, digel çend neraziyan, çavdêrên navneteweyî jî dengdan erê kir û Nkurunzîza pîroz kir *(li ser vê, gotara Vincent Munie'yî ya li jêr bixwînin)*.

Serokdewletê burûndî ku ji ber performansên xwe yên werzîşî û dîndariya xwe tê nasîn û kevnemamosteyê perwerdeya fîzîkî ye, hem li gorî dilê xwe û hem jî li gorî talîmatên Kîgaliyê kampanya xwe meşand. Ev mehan, belkî salan e ku Nkurunzîza bi xurtkirina şûna xwe ya di çolteran de ku % 80 nifûsa welêt lê dimîne, mijûl dibe. Li Bujumburayê, çapemenî, komele û rewşenbîran, bi dilwêrekî, neduristiyên hikumetê (weke firotina gumanbar a balafirra serokkomarî) û zêde wergirtina peywiran a partiya desthilatdar, protesto dikirin. Bi sanşên xwe yên serkeftinê li dijî îxtîdareke bê rêzê bawer, 12 partiyên muxelîf (Frodebu, FNL, baskeke muxelîf a CNDD'ê, û Tevgera civakî ya ji bo demoqrasiyê (MSD) ku damezrînerê wê kevnerojnamevanê Alexis Sinduhije ye jî di nav de), eniyeke hevpar ava kiribûn: Hevpeymaniya demoqratîk a ji bo guherrînê (ADC-Kînigî).

Di paytextê de, xelk bi vî serokdewletî dikeniya ku civandinên dîplomatîk pişt guh dixist û her roja înî, piştî nîvroj, terkî Bujumburayê dikir û diçû gundan. Li wir, digel slogana xwe ya "kar bikin û dua bikin", wî kokên darên avokado an darên mîweyî di nav cotyaran de bi lêva dikirin; wî, digel taxima xwe ya bi navê "Alleluia", bi ciwanan re maçên futbolê dileyistin. Kevneşerrvan di dêran de radiket û wî komeleyên ku ji hêla muxtar û birêvebirên muxtarî yên endamên partiya wî ve hatibûn afirandin, teşwîq dikirin ku acûran çêbikin û dibistan û navendên tenduristiyê saz bikin. Bi vî rengî, nêzî hezar û pênc sed saziyên perwerdeyê yên nû di herêmên çolterê de ava bûn.

Herçî cotyarên dûrî navendên îxtîdarê ku pirrî caran dilên wan ji hîleyên nijadî yên partiyên siyasî man û qurbanên komên çekdarî an leşkeran in, dilsafiya gelperest a serokdewletî bi wan xweş dihat. Lewre jî ku wî biryarên pirr ecibandî jî digirt: bêlaşiya perwerdeya seretayî û bêlaşiya tedawiyên tenduristiyê ji bo zarokên di bin emrê 5 salî de û jinên ducanî. Berê, jinên ku pê zayîbûn nekarî pereyê mesrefên nexweşxanyê bidin û li nexweşxaneyê rehîne diman heta ku malbat pareyê pêwîst kom bike!

Ev çûnûhatinên li ser zemînê bi encam bû: digel ku partiyên weke FNL an Yekîtiya ji bo pêşdeketina neteweyê (Uprona), kevnepartiya tenê ya ku berê Tutsî diparastin, li taxên Bujumburayê ray standibin jî, çolter bi rêjeyên " sovyetîk " re ku timî ji % 90 zêdetir bûn, dengên xwe didan CNDD'ê. Giraniya partiyê û çavdêriya civakî ev kar teva kir. Di axaftina xwe ya wezîfedarkirinê de, serokkomarê Nkurunzîza got ku serkeftina wî ya hemûyan e. Lê belê, her ku diçe, tirs û binpêkirin zêde dibin: rojnamevanek, Jean-Claude Kavumbagu, digel zêdetir ji 240 muxelîfan hat girtin, çend birêvebirên ADC'ê (Leonard Nyangoma, Alexis Sinduhije, Agathon Rwasayê serokê karîzmatîk ê FNL'ê), ji ber tirsa zeftkirineke yekser, tercîh kir ku welêt biterkînin, êşkence ji nû ve dest pê kir...

Çekên ji salên şerrî mayî hê jî di girikan de vêşartî ne, û muxalefet ku dengdanên cuda boykot kir, û bi vî awayî jî, pirraniya teva ya partiya serokkomarî xurt kir, dev ji pevajoya siyasî berda; lewre jî tirsa ji nû ve destpêkirina pevçûnan li cem her kesî heye: kevneîsyankerên bê doz ku ji şertên vegerra xwe ya di civakê de nerazî ne, ber bi daristana Kîbîrayê ve, cîrana Ruwanda û Başûr-Kîvûyê, diçin, û di nav hêzên çekdarî de firar jî qeyd bûn... Ku şerr ji nû ve dest pê bike, armanca wê dê dawîleanîna îxtîdara CNDD'ê bibe, û sedema wî ya sereke dê nijadî nebe.

Serkeftinên Kîgaliyê pirr caran weke mînak tên nîşandan: mezinbûna aborî di asta % 7 de ye, pêncek ji butçeya hikumetê ji bo tenduristiyê tê veqetandin, hemû memûr û gellek xebatkarên beşa ferdî jî xwedan sîgortayên tenduristiyê ne, % 90 zarok diçin dibistana seretayî, keç û jin di perwerdeyê de û li ser kursiyên Meclîsa neteweyî pirrhejmar in. Ne weke Burûndî û KDK'ê, Ruwanda di rastiyê de li dijî bertîlgirtinê têdikoşe. Plansaziya bajarê Kîgaliya pêşerojê li ser mînaka Sîngaporê saz bû, û paytexta Ruwandayê dixwaze bibe çarrêyeke xizmet û danûstandinên bazirganî ji bo tevahiya binherêmê. Li ser dîka navneteweyî jî, serokkomarê Kagame encamên weke têketina di Bazara hevpar a Dewletên Afrîqaya rojhilat û başûrî (Comesa) de, ji nû ve danîna têkiliyên dîplomatîk digel Fransayê, dawiya 2009'ê (4), û asabûna têkiliyên digel Kînşasayê, bi dest xistin. Tevî ku artêşa ruwandayî, ji bo çar salan (1998-2002) beşeke ji Kongoyê dagir kiribe jî, serokkomarê Kagame beşdarî pîrozbahiya salvegera 50emîn a serxwebûna KDK'ê bû, û heta xelkî ji bo wî li çepikan jî xist ! (5)

Ev qezencî nayên înkarkirin, û wan di serkeftina hilbijartinî ya serokdewletê ruwandayî de roleke girîng leyist, bi rastî, heta Hutu jî ji bo ewlehiya welêt sipasdarên wî ne. Weke hevpîşeyê xwe yê burûndiyî, Kagame beriya kampanya hilbijartinî ji mêj ve dest bi gerra çolteran kir, wî mitîng û civînên bi hemwelatiyan re li pey hev li dar xistin, û digel muxtaran " peymanên hukumdariyê " îmze kirin ku hedefên pêşketinê di wextekî bisînorkirî de nîşan didan. Ev siyaseta nêzîkatiyê encamên baş derêxistin, lê, li Ruwandayê jî, vederkirina muxalefetê û hewaya giştî ya çewisandinê mohra xwe li dengdanê hişt.

Li Burûndiyê, azadiya çapemeniyê hê jî serkeftina mezin a guherîna desthilatê ye, û komeleyên pirr çalak bi tirs in ku bi pey firara partiyên muxelîf, ew ê li hemberî îxtîdarê di rêza pêş de bibin. Kuştina Ernest Manîgumwa'yî, cîgirê serokê saziyeke têkoşîna dijî bertîlgirtinê, Oricome, bandor li fikirên herkesî kir. Li Ruwandayê, gellek rêxistinên ne hikumetî (RNH) yên navneteweyî ji welêt hatin vederkirin, û yên mayî jî zû de teslîmî îxtîdarê bûn; wekî din, çapemenî di çarçoveyeke pirr teng de dixebite û millet weha hîs dike ku di pergaleke polîsî de dijî ku ev pergal bandora xwe li hemû hêlên civakê dike.

Diviyabû serokkomarê Kagame nûnêriya xwe ya duyem bi serkeftinên navxweyî û navneteweyî yên rasteqîn re dest pê bikira, lê belê, van deman weha xuya ye ku nerehetî bi cîh dibe; wekî din, weşandina raporeke Neteweyên Yekbûyî, di 1'ê cotmeha 2010'ê de, li ser pêkutiyên di



MAHMUT CELAYIR: **Reya îpekê 2**, glover, Ø 40 cm

rojhilata KDK'ê de pêk hatî, leşkerên ruwandayî bi awayekî ciddî mehkûm dike (6) û vê nerehtiyê xurt dike. Lê, herweke li Burûndiyê, xetereya sereke ji dabeşbûna Hutu û Tutsiyan, an jî ji zordariyên navneteweyî nayê; ew ji hevkariyeke muxelîfên cuda cuda tê: anuha di rêlên Bakûr-Kîvûyê de, hin hevpeymaniyên dij-xwezayî navbera komên hutuyî ji endamên FDLR'ê pêkhatî, parêzvanên generalê Laurent Nkunda'yî - hevkarê Kîgaliyê yê demdirêj, ev Tutsiyê kongoyî û fransîaxiv, di xaniyê xwe yê paytexta ruwandayî de girtî ye - û muxelîfên tutsî yên Kagame'yî ku ji nava refên desthilatê dertên, çêdibin.

Bi rastî jî, firara kevneserokê Biryargeha giştî, generalê Kayumba Nyamwasa, û ya generalê Patrick Karegeya'yî ku her du jî li Afrîqaya Başûr pênaber in, di serê FPR'a partiya desthilatdar de cîhên vala hiştin. Her du jî endamên " komeke " pirr taybet bûn, koma kevnepênaberên Ugandayê ku di dawiya salên 80'î de di nava refên artêşa ugandî de şerr kir û, bi pey re, FPR damezrand. Hevalbendên destpêkê, endamên elîta îngilîzîaxiv ku li Kîgaliyê serdar e, wan Kagame ji ber otorîtarîzma xwe şermezar kir. Lê belê, serokkomarî ji mêj ve kincên xwe yên leşkerî bi cilên "hukumdariya baş" guherrandin; ew nuha îfade dike ku ew dixwaze li dijî bertîlgirtin û mafên taybet, heta li hemberî piştevanên xwe jî têbikoşe û rîsqa hêrskirina kevnehogirên têkoşînê bigire: *"Ku em bi tundî li dijî wê têbikoşin, bertîl dê welêt xira bike"*, ew ji hemû guhdarên xwe re dibêje. Kayumbayê kevnebalyozê li Hindîstanê, bi plankirina teqînên bombeyên destan li Kîgaliyê di sibata 2010'ê de hat mehkûmkirin, û neçar ma ku bireve Afrîqaya Başûr; li wir jî, ew ji hewldaneke mêrkujiyê filitî.

Tevî xurtkirina hevkariya ewlehiyê ya her sê welatên herêmê - di 2009'ê de, artêşa ruwandayî li cem artêşa kongoyî tevlî peydana îsyankerên hutuyî bû, û di îlona 2010'ê de, generalê Kababereyê wezîrê ruwandayî yê parastinê, ziyaretî Kînşasayê kir - li Ruwandayê, weke li Burûndiyê, dibe ku "apojeya hilbijartinan" xelkê bixapîne û xetereya rûdanên bi şîddet ku tenê bi dijberiya Hutu û Tutsiyan tarîfe nabin, binixumîne...

*Rojnamevan, *Le Soir* (*Êvar*, rojnameyeke rojane ya Brukselê).

1 Efûya navneteweyî, "Le silence est plus sûr : l'effet intimidant des lois Ruwandaises sur l'idéologie du génocide et le sectarisme" *("Bêdengî ewletir e: encamên çewisîner ên zagonên ruwandayî li ser îdelojiya jenosîd û sektarîsmê")*, 31 tebax 2010

2 Bnr. Mwayila Tshiyembé, "Kinshasa menacé par la poudrière du Kivu" *("Kînşasa di bin xetereya teqîna Kîvûyê de ye")*, *Le Monde diplomatique*, çileya pêşîna 2008'an

3 Kîgalî paytexta Ruwandayê ye. (Têbiniya wergêr)

4 Bixwîne: Benoît Francès, "France-Rwanda, le prix d'une réconciliation" ("Fransa-Ruwanda, berdêla lihevhatinekê"), *Le Monde diplomatique*, îlon 2010

5 Di sala 1996'ê de, du salên bi pey jenosîdê re, hêzên ruwandayî di erdnîgariya kongoyî de operasyon meşandin, daku bi darê zorê pênaberên hutuyî vegerîne welêt û bi dû "jenosîder" ên revok ve biçe. Bi hevkariya Burûndî û Ugandayê ve, artêşa ruwandayî di vî "şerrê Kongoyê yê yekemîn" de, rolekê di qulibandina desthilata mareşalê Mobutu leyist. Bixwîne: Colette Braeckman, *L'enjeu congolais, l'Afrique centrale après Mobutu (Armanca kongoyî, Afrîqaya navîn piştî Mobutu)*, Fayard, Parîs, 1999

6 Hêzên ruwandayî pênaberên hutuyî, yên ku ji hêla hêzên kevnedesthilatê ve bi rê ve diçûn, qetil kirin, digel Kongoyiyên hutunijad û sîvîlên din ku di bin gumanbariya alîkariya pênaberan de bûn. Nivîskarên raporê bi haydarî dibêjin ku kiryarên bi vî rengî dikarin ji hêla dadgeheke minasib ve weke "jenosîdê" bên tarîfekirin. Berdevkê hikumeta ruwandayî ev rapor bi peyvên "*xêrnexwaz, êrîşker, qirdik*" û "*xeternak û bêhiş*" şîrove kir

## BURÛNDÎ

# Li Burûndiyê, Yekîtiya Ewropayê bi gumana li ser hilbijartinan re rû bi rû ye

VINCENT MUNIÉ

*Peywira me bi tenê teknîkî ye. Ew siyasî nabe. Em tenê, li gorî pîvanên navneteweyî, çavdêrî duristiya meşandina dengdanê dikin... "* Di dawiya nîsana 2010'ê de, li Bujumburayê (1), Tommaso Caprioglio, hevserokê Peywirdariya Çavdêriya Hilbijartinî ya Yekîtiya Ewropayê (PÇH YE) li Burûndiyê, gumanên desttêwerdana siyasî ya di hilbijartinên bê de red dike. Hilbijartin ji xwe li pey hev rêz dibin: hilbijartinên şaredaran di gulanê de, yên serokkomar di hezîranê de, yên nûnerên gel di tîrmehê de û yên serokên girikan di îlonê de.

Lê, di roja 28'ê gulanê de, bi tenê çar roj bi pey hilbijartina pêşî re, PÇH YE di lîstika siyasî dikeve û dilê îxtîdarê xweş dike. Digel ku muxalefet bi yekdengî neduristiyên pirrhejmar şermezar bike û encamên dengdanê nepejirîne, erêkirina ewropayî tê wateya qebûlkirina kiryarên hukumdarên burundî. Ku PÇH YE pêvajoyê erê bike, çi pêbawerî li cem binkeftiyên vê lîstika xapînok dimîne?

Di welatekî weha de ku hê jî birrînên şerrê xwînrêj ê navbera 1993 û 2005'ê hel nekiriye, rêzkirina tarîxên hilbijartinan cîhê meraqdariyê bû. Lê belê hêjayî gotinê ye ku ji destpêka salê ve, nîqaş ji meseleyên nijadî dûr ket û li ser protestokirina hikumetê, ji ber têkçûna siyaseta wî ya aborî û nemase ji ber meylên wî yên otorîter, sekinî. Di buhara 2010'ê de, tevahiya welêt xwe diavêje reqabeta demoqratîk: mîtîngên girseyî, pêşkêşkirina programan, nîşan û stranên kombûnê, meşên rengîn... Heta Eniya neteweyî ya rizgariyê - Palipehutu, partiya mezin a hutuparêz ku herî dawî çekên xwe daynî, beşdarî hilbijartinan dibe ku ev jî pêşana têketina serdemeke nû ye. Di atmosfereke qarabalix de, girseyên çalakvanan di kolanên Bujumburayê de bê şîddet rastî hev tên, û, paşê taloqkirineke dawîn a 3 rojan, bi dû re hilbijartina şaredariyan di 24'ê gulanê de pêk tê.

Bes, di çend seetan de, gavê hilbijartinî yê mezin bi astengên siyasî re rû bi rû dimîne. Lewre jî ku tevî coşeke xelkê ya nedîtî, karên nedurist li ser hev kom dibin: li gorî muxalefetê, hejmara dengdêrên rastî ji ya dengdêrên qeydbûyî pirrtir e. PÇH YE'yê ku di destpêka salê de li Bujumburayê bi cîh bû û ji 83 endamên biyanî pêk tê, ji bo 6 900 dezgehên dengdanê, 15 komên ji du heb çavdêran pêkhatî peywirdar kir. Lê belê hin çavdêr ku di welatên endamên YE'yê de zû bi zû hatin wezîfedarkirin, welêt baş nanasin, û wekî din, çûnûhatinên di herêmên çolê de zehmet in; ev jî dibe sedema bisînorbûna erka PÇH YE'yê. Bi awayekî sosret, peywirdar zû dibînin ku hilbijartin bi rengekî bela wela li dar dikevin û ku neduristiyên hukukî yên xirab hene, bes ew "bi giştî" ji derbasbûna dengdana şaredariyê razî ye. Partiya desthilatdar, Dezgeha Neteweyî ya ji bo parastina demoqrasiyê - Hêzên parastina demoqrasiyê (CNDD-FDD), bi wergirtina rêjeya % 70 dengan, zora partiyên mezin ên dîrokî têk dibe. Ev partiya hanê jî, bi dû girtina dezgehên dengdanê de, kom dibin û bi hev re, Hevpeymaniya demokratîk a ji bo guherînê (ADC) ava dikin. Du armancên wan hene: îstîfadekirina Komîsyona hilbijartinî ya serbixwe û ji nû ve lidarxistina dengdanê. Lê belê hevpeymanî bi tenê ye û ji şiyanên lêkolînê bêpar e, lewre jî nikare neduristiyên mezin îspat bike. Herçî hikumet, ew bi tenê axaftina dêhndar ya balyozxaneyên navneteweyî û erêkirina PÇH YE'yê dubare dike. ADC jî biryara boykotkirina dengdanên bê dide.

Sala hilbijartinên mezin a Burûndiyê weha dibe parodiyeke demoqrasiyê: di hilbijartina hezîranê de, serokkomarê Pierre Nkurunziza berbijêrê tenê ye û dîsa tê hilbijartin; di tîrmehê de, hilbijartina meclîseke bi kêm zêde, xwerû ji endamên partiyê wî pêk tê, serkeftina wî piştrast dike.

Bi saya nebaldariya medyayên navneteweyî, di meha gelawêjê de, hikumet pêvajoyeke biserdegirtina malan û hepskirinên siyasî dide destpêkirin. Di vê demê de, kesayetiyên bi nav û deng terkî welêt dikin û Agathon Rwasa, berpirsê FNL-Palipethuyê, li karên vêşartî vedigere û îhtîmaliya ji nû ve destpêkirina pevçûnan dide fêmkirin. Di îlonê de jî, pevçûn li ber sînora Komara Demoqratîk a Kongoyê (KDK) derdikevin. Ji wê demê û pê ve, her hefteyek mêrkûjî, êrîş û talanên nû bi xwe re tîne; artêş jî vê hincetê bi kar tîne, tundtir dibe û xelkê bi vebizavan ditirsîne. Tukes nikare encamên xirabbûneke rewşa Burûndiyê ji bo binherêma wê ku ji xwe ne sakin e, pêş de bibîne, lê weha xuya ye ku ev jî ne xema PÇH YE'yê ye. Wê ji xwe dev ji çavdêriya rasteqîn a sindoqan berda û qerar daku hewayê siyasî bi giştî binirxîne. Heta 28'ê gulanê, wê atmosfer jî "baş" dinirxand. Bi pey re, bê ku ji ber vekişandina hemû dijberên partiya desthilatdar meraq bike, wê çavdêriya xwe dewam kir li ser reqabeteke... digel berbijêrekî tenê, û paşê, li ser dengdaneke meclîsî ya ku bê muxalefetê pêk hat! Piştî her dengdanekê, Renate Weber'ê, nûnêra gel a ewropayî û seroka peywirê, di daxuyaniyeke çapemeniyê a fermî de beşdar ji bo *"derbasbûyîna baş a xebatan"* pîroz dikirin... Rapora dawîn a PÇH YE'ê ku di 12'ê çiriya pêşîna 2010'ê de, li Brukselê pêşkêş bû, bi rengekî surealîst e: di dosyaya qalind de, nivîsîner xembariya xwe ji ber *"pêkaniya qulibandina ber bi partiyeke tenê ve"* û *"paşveketina pirraliyê"* îfade dikin, bê ku li rola peywirê ku partiya îxtîdarê weha piştrast kir, bipirse.

Yekîtiya Ewropayê qerar dide ku binpêkirinên zagona hilbijartinan pişt guh bixe, ji ber sedema nakok a ku divê demoqratîkbûn pêş de biçe... bedel çi dibe jî bila bibe. Lê belê, di paşxana burundî de, desthilateke aram û berdewam bi tenê dikare ji hilbijartinên bê kêmanî derkeve, an jî dê lihevhatina ne ewle ya ku aştî li welêt vegerand bişkê. Di van demên dawî de, nû destpêkirina pevçûnan bi awayekî trajîk nîşan dide ka boçûna ewropayî çiqas vala ye û encamê siyaseteke kurtbîn e.

1 Paytexta Burûndiyê ye. (Têbiniya wergêr)

Wergera ji fransî: Simko Destan



MAHMUT CELAYIR: **Reya îpekê 3**, glover, Ø 40 cm

www.arsivakurd.org

# Heyraniya cemseran

GILLES LAPOUGE *

Ku cemser tune bin em ê çi bikin? Dê ji me re derdekî giran be. Ji xwe ev çi wexteke dirêj e ku cemser û em, em hevdu dinasin, me çiqas tişt jî bi hev re kirin ! Hîn li ser defterên me yên mektebê ku me ew bi alîkariya koşebend û pergelên xwe bi cîh dikir, me bi evîndarî şûna wan hesab dikir. Kengî me ew didît, êdî me dikarî Kelû û Ekwator jî lê zêde dikir, digel gulên bayî û çarêk, tevliheviyeke geometriyan ji gerdûnê derêxistî ku peywira wan jî, pêşîlêgirtina bêntîzamiya xeternak a erdnîgariyê bû. Cemser, eksê dunyayê bû, cîhekî neamade ya ku cîhana me ya girover di nav xwe de digirt kubarî û qalindiya wê misoger dikir, her weke xet û xêzikên îhramekê girê dide û wê xweşik dike.

Îroj, cemser di bin xetereyê de ne. Ne cemser bi xwe ne, ji ber ku tiştên tuneyî bi rehetî nayên îmhakirin, lê bergehên spî ku ew navendên wan in jî di heman xetereyê de ne. Tehlûkeya mezin li ser cemsera bakûr heye. Qeşayên wê dihêlin. Ev çend sal in ku hirçê spî yê lawaz û zirav ji cemeda avê bo cemeda avê diçe, fîlm bi fîlm, ji Arthus Bertrand heta Nicolas Hulot. (1)

Cemsera başûr timî sartir bû (bi naverastî 20 derece kêmtir e). Ew ne ji cemedeke ku li ser avê diseyire, lê ji dêwekî bûzê yê ku % 90 yedekên ava nerm a dunyayê tê de hene, pêk tê. Ew ji Cemsera bakûr baştir li dijî germahiyê li ber xwe dide, lê carcaran, li aliyê deryaya Weddell an jî platoya Wîlkînsê, çiyayekî bûzê yê bi qasî Luxemburgê mezin di avê dikeve û li cîhekî nenasî winda dibe.
Bi heyraniya germahiyê, welatên ku li kenarê cemseran in, nemase Cemsera bakûr (Kanada, Rusya, DYA, Norwêç û Danîmarka), hazir in ku dewlemendiyên pirr mezin ên madenî û neftî, ji ber xirabûna cemeda avê derêxistî, bixin bêrîkên xwe. Ev mîna xeyal an jî kabûsekê ye. Ji mêj ve, mirov dizanîn ku xezîneyek di bin cemedên avê de heye, lê ew derveyî destên wan bû. Hêlîna cemedan mucîzeyeke belengaz e: klîtên şikeftê nuha di destên wan de ne.

Di heman demê de, bazirgan û petrolkêş di serê xwe de hesab dikin ka ew ê çiqas mîlyar dolaran qezenc bikin, dema ku her du rêyên efsaneyî dê vebin, rêyên ku hemû keşfkerên sermayê ji bo çar sedsalan li wan gerriyan, bihorîna Bakûr-Rojavayê ya di Kanadayê re û bihorîna Bakûr-Rojhilatê ya di Sibîryayê re ku dê Rojhilata Dûrî (Cathay, Calicut û Cipangu) nêzîkî Amerîka û Ewropayê bikin.

Her ku buhar vedigere, ez mêraq dikim ka dê spîtî bi pey hêlîna berfê re bi ku ve biçe. Gelo ew ê di çi tenêtî û paşhêla tiştan de pênaberxwaz bibe? Paşê tunebûna rasteqîn a cemedên Arktîkê, dê spîtiya cemseran xwe li ku veşêre? Em ê bêriya vê spîtiyê bikin, weke ku em ê bêriya valahî û tunebûna vê" noqteya sifir " a dunyayê bikin. Ev şûn û warên Bakûrê dûrî, xwedan yedekên madenên ji zerr û antîmonê giranbuhatir in, malzemeyên ku ji meriv û civakan re pêwîst in: spîtî, valahî, bêdengî, bêdawî û nenasî.

Îroj, bi pey pênc sedsalên keşfên mezin re, tevahiya dunyayê - bes li derveyî cemseran - qeydkirî, hesabkirî û medenî ye. Erdên nedîtî yên Afrîqa yan Asyayê ku mirov ditirsandin û bi xwe ve dikişandin nuha pîvan, boyax û hejmar bûn. Kartên dawîn ên Enstîtûya neteweyî ya erdnîgariyê (IGN) berhemên şaheser in. Erdê tevnepîrekê li ser dikare bê dîtin. Lê ev şaheser cîhê daxê ne: erdên nedîtî neman; bustaneke dunyayê jî ji zanyariyê nefilitî.

Di salên 1930'î de, Paul Valery'î digot: "Dema dawiya dunyayê dest pê dike." Îlana wî pêşwext bû. Di serdema wî de, warên ferqnekirî yên cemseran, û asoyên wan ên revok, li hemberî serûberkirina cîhanê li ber xwe dida. Şaristaniyan nedizanî ka çawa bêdawîtiyê di kadastroyên xwe de zeft bikin. Lê îroj, bi saya hêlîna cemedan, pîvanker darikên xwe di warê negotî dikin. Pêşbîniya Valery'î rast dibe: dema erdnîgariya bidawî dest pê dike. Sirra li ber tekçûnê ye. Dizî weke ava ji bîdoneke qulkirî dirêjin.

### Heta nuha bêdengiya spî bala dîrokê nekişandibû

Bezayê ji bo xezîneyê dest pê kir. Ji bo erdnasan, warê arktîk cejnek e. Komên ji wan diçin wir; ew kaniyên hê jî di bin deryaya spî de vêşartî rêz dibin: petrol bi mîlyarên varîlan, gaz bi mîlyarên metrekupan, komur, kobalt, antîmon, elmas, mis, nîkel, masî, gemarî.

### Lê xwedanê van cewheran dê kî be?

Zagona navneteweyî cemsera bakûr ji cengê derdixîne, lewre ku xwedanê wî tune ye, ew mal û milkê mirovahiyê ye. Wekî din, şûn û warekî nerastî ye, figureke matematîkî, noqteya rastîhevhatina eksenê cîhanê bi erdê ve ye, neteweyek çawa dikare wê bixwaze? Ew dûrî wextî ye, di zemînekî weha de ku seet tê de tune ne, ji ber ku hemû meridiyen û teşiyên seetê di vê noqteyê de digihîjin hev û dikin ku katjimêr hemû seetan di heman demê de destnîşan bikin. Va ye ji me re mînakeke dabeşnebûna jeologî û coxrafyayî ye ku dilê me xweş dike.

Sedemeke din jî heye: li gorî konvansiyona Rêxistina Neteweyên Yekbûyî ya li ser zagona deryayê ku di 1982'ê de îmze bûye, her yek ji welatên cîranên okyanûsa arktîk xwedan mafê birêvebirina binê xwe yê deryayî ye, heta mesafeyeke 200 mîlên deryayî (360 km), di " devereke aborî ya ferdî " (DEF) de. Di vî warî de, hêjayî gotinê ye ku pirraniya kaniyên madenî ku hatin dîtin, nêzîkî qeraxan li ser hev dibin, di hindûrê şelîteke 200 mîlan de. Bi vî awayî pevçûn çênabin. Mixabin, maddeyeke konvansyona 1992'ê nakokiyê diçîne: ku welatên cîran dikarin îspat bikin ku platforma parzemînî a li qeraxên erdê wan, li derveyî 200 mîlên DEF'a wan didomin, hukumdariya wan hinekî din lê zêde dibe.

Ev madde pirr li xweşiya her pênc welatên cîran çû. Erdnasên wan zû bi zû platformên parzemînî yên pirrhejmar keşf kirin. Rusya dorsala Lomonossov raxist ber çavan. Ka ev dorsal çi ye? Çiyayeke bin avê ku ji qeraxên rusî diçe û di tevahiya zemîna arktîk re derbas dibe û, çi tesadufeke xweşik e, tam di bin Cemsera bakûr de dibihore. Lewre jî, li gorî Kremlînê, cemser û warên nêzî wî jî, mal û mulkê Rusyayê ne. Lê jeologên kanadî li hemberî vê derketin û gotin ku dorsala Lomonossov, ji xwe dewamiya dorsala kanadî ya girava Ellesmereyê ye. Jeologên danî jî ev fersend bi kar anî ji bo ku bi kenekî xweşik, bi bîr bixin ku dorsala navbihorî bi tenê dewamiya Groenlandê ye ku heta bê guherrandin, Danîmarka jî nûnerê wê ye - heta ku xelkê înuît mafên xwe bi dest bixe.

Anuha, xuya ye ku Cemsera bakûr di bin tahlûkeyê de nîne, lê deh, bîst sal bi şûn ve, sermayedarî û pîşesazî dê li ser deryayên arktîk bikevin. Li ser bêdengî û spîtiya ku heta nuha, ji meraqdariya dîrokê filitîbû, dê buldozer û carûdên mekanîk li hev kom bibin, digel sefîngeh, rijandinên gazê, gemiyên mezin, rêxistinên ne hukumetî, dengê zîz ê makîneyan, kargehên masiyên morîna, komên har ên hawirdorparêzan, platformên neftê, super-tanker û qeşaşikestên nukleerî. Dê spîtî biçe. Li nava çiyayên bûzê yên şikestî, derya dê bibe weke herriyê. Roniyên bajaran ê di mijê de bibiriqin. Li şûna spehîtiya bêdengiya berî dîrokê, dê bê gazincên alarman û çakûçan. Ji imbarên dawî yên bedewiya tiştan, yek ê biçe.

### Gava ku keştî bidin nava Sibîryayê, coxrafyayeke nî dê peyda bibe

Bi qasî çar sedsalan, mirovan her xwest di nav girav û qeşayan re derbas bibin, daku mesafeyên dunyayê kurt bikin. Li rojavayê, ji Kanadayê de, ew li bihorana Bakûr-Rojava digerriyan ku dê bihişta ku ew bi ser avtenga Beringê de biçin û bigihîjin welatên Rojhilatê. Bi dehan komên deryavanan û kaptanên dilawêr, di van labîrentên çirûskan de winda bûn, û hirç an jî tenêtiyê ew tê de kuştin. Bedenên wan di qeşayê de girtî ne. Herçî Rusyayê, wê xwest rêya Bakûr-Rojhilatê veke, ji bo ku ew jî xwe bigihîne avtenga Berîngê, lê bi şopandina qeraxên bakûrî yên Sîberyayê, daku mal û milkên xwe di keştîgehên Asya Dûrî de deyne. Dawiya pêşdîtî ya cemeda avê ya arktîk, dê van her du rêyan veke. Ev jî, diyariyeke ne ji rêzê ye.

Helbet, beriya ku her du bihoranên Bakûr-Rojhilat û Bakûr-Rojavayê bixebitin, hinekî wext lazim e - panzdeh salan, li gorî pisporan. Nakokiyên zagonî jî li ber me ne: Kanada weha dihese ku hukumdariya wê, li ser mîlên deryaya azadkirî yên ku di giravên kanadî re dizivirrin, dirêj dibe. Zagona deryayê weha nabêje. Pergaleke pareyê derbasbûnê tê nîqaşkirin. Sazkirina fîloyên xurt û bihêz jî pêwîst e ku dê ji qeşaşikestên nukleerî an jî gemiyên bi tekneyên ji sê tebeqeyên polayê xurtkirî ku bikaribin di nava parçeyên bobelatê de biseyirin, pêk bê. Lê hatinên payî pirr mezin in. Heta nuha, bazirganiya digel Rojhilata Dûrî di kanala Suweyşê an ya Panamayê re derbas dibû, û her du jî ji xwe bi qasî şiyanên xwe dixebitin. Bi saya her du bihoranên cemserî, dê hem mesafe û hem dirêjiya seyirînê kurt bibin. Anuha, di navbera Londra û Tokyoyê de, 21 000 km hene, lê bi saya kurerêya Arktîkê, dê ev mesafe li 14 000 km kêm bibe. Di navbera Norwêç û Çînê de, rêya Bakûr-Rojhilatê dê ji 15 an 20 rojên seyirînê kêm bibe.

Roja ku fîloyên bazirganiyê wê di nav giravên kanadî re an jî di ber Sîberyayê re biseyirin, dê di dîroka dunyayê de tarîxeke girîng be. Ceng û tackirin, xela û webayê, dema neteweyan dihijmêrîn. Lê belê, dibe ku vebûna rêyeke nedîtî, qulkirina berzaxekê an jî tunelekê, kontrolkirina rêyeke deryayî ya nû, mohreke demdirêjtir hiştibin, ji ber ku ew erdnîgariyeke nû saz dikin. Her dema ku coxrafyayek li şûna coxrafyayeke din derdikeve holê, dîrok jî dilerize.

Di sala 1948'ê de, dukê Venedîkê şêwîrmendên xwe li dora xwe dicivîne. Wî peyamek wergirtibû ku agahiyên pirr xirab tê de hene: deryavanekî portekîzî Vasco de Gama bi ser ket û di Kapa bablîsokan re (ku ji wê û pê ve weke Kapa Hêviya Xweş hat binavkirin) derbasî başûrê Afrîqayê bû. Ev trajediyek e. Heta wê demê, bazirganan tenê bi rêya erdê dikarî xwe bigihînin Hindistanê, û mifta vê rêya dirêj û xeternak di destê Venîsiyan tenê de bû. Ev jî sedema dewlemendî û navdariya bajêr bû. Dema ku Hindistan, bi rêya deryayê, nêzîkî Portekîz û tevahiya Ewropayê bû, bajarê Dukayan êdî bi kêrî tiştekî nedihat.


Nexşeyeke cîhanê xêz dibe; yeka din ji tariyê derdikeve holê. Bi lez û bez, atlas ji nû ve boyax dibin. Cemser û Ekwator ji rêya xwe derdikevin. Sînorên ku me herdemîn dinasî, tune dibin. Deryaya Spî piçûk dibe. Ew bi awayekî nedîtî ber bi Rojavayê ve dişemite, mîna ku plaqeke tektonîk livîbe, û deryaya yûnanî û latînî dê tenê digel tevgerreke din a coxrafyayê, kolandina kanala Suezê, di 1868'ê de, dîsa jî şûna xwe bigre. Împaratoriya zengîn, li ser çerxa Asya û Ewropayê sazkirî, êdî ji diravê bê par e. Xewa demdirêj û mihteşem a Bajarê Dukan dest pê dike.

* Nivîskar, xwediyê pirtûka bi navê La Légende de la géographie (Efsaneya Erdnîgariyê), Albin Michel, Parîs, 2010.

1 Derhênêrên fransî ku film li ser germbûna hewayê kişandine. (Têbiniya wergêr)

Wergera ji fransî: Simko Destan





MAHMUT CELAYIR: **Seyraneke dawiya havînê 3**, Diptycon, akrîlboyaxa ser tûwalê, 150 x 200 cm

www.arsivakurd.org

## BAZARA PEREYAN

# Çîrok û rastiya şerrê pereyan

LAURENT L. JACQUE *

Civîna serok û rêberên desthilatên welatên G20'î (ku % 90'ê aboriya cîhanê pêk tînin), di 11 û 12'ê çiriya paşîn de, li Seûlê pêk hat. Armanca wê, kêmkirina cudahiyên mezin ên aborî û danîna bingehên mezinbûneke "bihêz, domdar û bi denge" bû. Vê hevdîtinê bi taybetî derfeta aşkerekirina kozên xwe da beşdaran û lawaziya sîstema diravî ya navneteweyî diyar kir.

Wezîrê Darayî yê Brezîlî, Guido Mantega – ku ji biqîmetbûna rastîn ya dolarê amerîkî û yenê çînî bi tirs e –, hîn meha îlona bihurî bahsa *"şerrê pereyan"* kir û berî herkesî li defa hawarê xist. Piştî wê ne bi tiştekî, ev gotin ji aliyê Birêvebirê Giştî yê Fona Pereyan a Navneteweyî (IMF), Dominique Strauss-Kahn ve jî hate bilêvkirin: "*Ji bo min metirsiya şerrê pereyan ku hîn kurmik be jî tiştekî pirr ciddî ye*." (1)

Ev formula "metirsiyê" qeyrana mezin a salên sihî tîne bîra mirov ku bi devaluasyona rikeber a aboriyên sereke hîn tûjtir bûbû – û paşê jî bûbû karesatek. Ji wê demê ve, dîmena diravî ya navneteweyî drûv guherî: aktor pirr bûn û ji nû ve rêzanek hate çêkirin (nivîsa nav çarçoveyê bixwîne). Lê xeter li cîhê xwe man: mezibûna aborî û avakirina derfetên kar her girêdayî siyaseta merkantîlîst e ku bi saya bêqîmetbûna diravê netewî li ser piyan dimîne. (2) Qanûna pola ya berê li cîhê xwe dimîne: welatekî diravê wî kêmqîmet, ji ber ku bihayê wan erzan e bi hêsanî dikare berhemên xwe îxrac bike.

Li ser sehneya diravî ya navneteweyî heraret gurr dibe. Mudaxeleya girseyî lê bêpêşeroj a banqeya navendî ya Japonyayê ji bo kêmkirina qîmetê yenê, di îlona bihurî de; kontrola dowîzên bijartî ya li ser sermayeyên ku dikevin Brezîlya û Taylandê; dengdana bi girseyî ya li Meclîsa nûneran a Dewletên Yekbûyî, di dawiya îlonê de, di lehê qanûneke ku mafê gumrikê li ser welatên ku bi zanebûn qîmetê diravên xwe kêmkirine ferz dike (Çîn rastarast armanc e); ji alî Rezerva federal ve enjektekirina bigirseyî ya diravî li nav aboriya Amerîkî qîmetê dolar kêmkir û hwd.: teqîna agahdariyê deng veda. Her yek ji van aktoran binehînî diravekî kêmqîmet ji xwe re dixwaze ku aboriya xwe mezin bike. Lê encama lîskê tune ye: kêmkirina qîmetê diravî ji alî aktorekî ve dibe sedema zêdekirina qîmet ji bo yên din. "Şerrê perayan" dest pê kir gelo?

Ji 1944'an heta 1971'ê, peymanên Bretton-Woods ên bi mebesta paraztina dunyayê ji krîzên ku ew di navbera her du şerran de perçekiribûn bingehên "sîstemek nû ya diravî" danîn. Bi vatiniya lihevanînê –bi hevkariya banqeyên navendî– sistema diravî ya navneteweyî IMF derket holê. Kûrên dowîzan bi dolar ve, û ew bi xwe jî rastarast bi zêr ve hat girêdan (onsa zêr li ser 35 dolaran hate qebûl kirin). Her ferqeke kêm an zêde % 1'ê dowîzekî bi nisbet parîteya wî ya bi dolar û bi zêr re, dibe sedemê midaxeleya banqeya merkezî ya welatê têkildar. Helbet, ev mîmarî çend caran derizî: gellek caran develuasyon çêbûn – eyarkirinên pêdivî yên girêdayî qîmetê îzafî yê diravan ji bo misogerkirina berdewamiya vê sîstemê, bi ji nû ve serbiserkirina dengeya deyndayînê ve hate girêdan.

Ji 1958'an vir ve, welatên serekî yên Rêxistina hevkarî û pêşketina aborî (OCDE) kontrola dowîzan ji bo karên ticarî (îthalat ou îxracata mal û xizmetê) ji holê rakir, lê kontrola li ser tevgerên sermayeyan ranekir: mezinbûneke destekkirî dîmena aboriya navneteweyî û sîstema diravî ya ji bo piştî şerr çêbûbû tîne ser rewşa xwe ya berê.

Di 1971'ê de, Dewletên Yekbûyî yekalî guhertina doleran a bi zêr ango 35 dolar bi onsekê rakir refê, bi vî awayî devaluasyona banknotên kesk fermî kir. Gava dor hate ser wan, welatên sereke yên senayiyên wan pêşketî li gor erz û talebê dowîzên xwe serbest berdan ku "li ba bibe": êdî banqeya navendî ne bazara dowîzan e, ya ku kûran diyar dike. Tev li vê jî em bahsa libabûna "qirêjî" dikin ji ber ku banqe bi awayekî girseyî mudaxele dikin ku kûrên dowîzên xwe eyar bikin. Hêdî hêdî sistkirina kontrola dowîzan banqeyên navendî mecbûr dikin ku dev ji hikumraniya xwe ya bitenê ya li ser kûrên dowîzan berdin.

Di her halûkarî de, ji wan re rêyeke din êdî nemaye. Çeka wan a ku tercîh dikin –rezervên dowîzan– êdî ji dilopeke ava li ser deryaya bazara dowîzan ku hatiniya wê ya rojane 4 000 milyar doleran derbas dike pê ve ne tiştekî din e. Ev hatinî bi awayekî pratîk dike pênc qatê stoka hemî rezervên di banqeyên navendî yên herêma euro de civiyane. Ji % 5'an kêmtir kirariyên rojane ku tên tomar kirin ji karên ticarî tên, % 95 jî ji tevgerên sermiyanên spekulatîf tên. Di van mercan de, ji bo banqeyeke navendî çibigre nemimkun e ku meylekê (bilind an kêm) berevajî bike.

Bi kêmanî ew bi serhevdana bi girseyî ya doleran dikare kêmkirina nirxê diravê xwe hêvî bike. Em ji zû de, li Asyayê çavdêriya vê yekê dikin: doh bi navgîna giran Japonya (bi ji bist milyar dolarî zêdetir rezervên dewlet dowîz), îro Çînê ew li pey xwe hiştiye (bi ji du hezar û pêncsed milyar dolarî zêdetir) û Korêya Başûr, Taywan, Hong Kong, Singapour û Malezya li ser şopa wê ne. Lê welatên ku bi pêş ve dikevin – BRHÇ (Brezîlya, Rûsya, Hindistan, Çîn), Meksîka, Tayland, Endonezya û Afrîkaya başûr – hîn li ser kêmkirina tevgerên sermiyanan israr dikin û bi vî awayî kontroleke herî kêm li ser kûrên dowîzên xwe diparêzin, lê ev jî çendî bazar serbest bibe dê ewqas ji holê rabe.

Îlankirina şerr –ger şerrê perayan hebe– digihê biryara Çînê ya salên 1990'î ku dowîzê xwe bi dolar ve girê da. Vê tedbîrê rê li ber biqîmetbûna yenî girt ku vê jî dê zêdeyiya bazirganî ya Împeretoriya navendî ji navê rakira. Wê demê, aboriya Çînê pirr baş bû. Rêjeya mezinbûna wê ya salane ya rekor (di navbera % 10-12) ji gurrbûna îxracata wê îstifade dikir, wê bi xwe hêza xwe ji delokalîzasyon û karên taşeroniya pirrneteweyî ya Amerîka, Japonya û Ewropayê digirt. Weke tevgereke sîmetrîk, zêdeyiya bazirganî ya Çînî bi nisbeta kurbûna jêkêmiya butçeya Dewletên Yekbûyî diwerimî, ev fenomen dibû sedemê her roj hîn bêtir kombûna doleran li Çînê û wê jî bi wan bi berfirehî bonoyên Xezîneya Amerîkî dikirrîn.

Bi vî awayî Pekînê bi kûreke dowîzan ya çêkirî dengeyek di navbera hatiniyeke kêm a îxracata xwe û maliyeta îtxalata xwe de çêkir. Bi gotineke din, wê îxracata xwe bi gumrika zêde ya li ser malên biyanî ve xurt kir. Vê yekê Dewletên Yekbûyî û Yekîtiya Ewropayê mecbûr kirin ku qîmetê yenî % 30 heta 40'î zêde bikin. Desthilata çînî bersiva vê yekê da got; biryareke weha dê pirraniya firmayên wê ceza bike û bibe iflasê, ew jî dê bêkariyê tahrîk bike, bibe sedemê tevliheviya civakî û pirsên aloz li ber çavên wan û hevkarên wan jî aciz bike. Hîn nûh, Çînê, ji hindava xwe ve, xavîtiya Dewletên Yekbûyî ya di warê bacê û diravî de eşkere kir û ji ber ku dibe sedema nearamiya di aboriya cîhanî dihejîne ew rexne kir.

Hevalkarên wê yên bazirganiyê dikarin biryara pîvana mueyideya gumrikê ya li dijî Pekînê bidin: şerrê perayan wê gavê dê reng biguhere bibe şerrê bazirganiyê. Tevî ku politikayên gelerî yên ji nû ve destpêkirinê –yên weke kêmkirina rêjeya fayizê li gel jêkêmiya budçeyê- pêk hatin jî, di çarçoveya rizgarkirina aboriyeke bêhêz de, di senaryoyê de tiştê ku nebe tuneye. Tevî vê jî, çin hêdî hêdî siyaseta xwe ya diravî diguhere. Ew herweha bi navneteweyîkirina yen han dide ku li derveyî sînorên xwe jî diravê Çînî belav bike. Ev jî elameteke baş e û ji bo pê bi pê ji navê rakirina kontrola dowîzan a ku Dewletên Yekbûyî dixwaze jî, bi xêr e: Yen dê hîn serbest li ba bibe û li hember dolarî dê hêdî hêdî bi qîmet bibe. (4)

Lê, li şûna eksena yekê a vî şerrê Çînê û dunyayê ku bêtir tiştekî klasîk e, ya duyem –hîn kêmtir e lê mirov hîn bêtir ditirsîne– ku li dora artêşeke hêza wê rojbiroj zêde dibe û nayê zeftê ya spekulatoran rû dide: "carry traders".

Weke ku tê dîtin, birêvebirên banqeyên navendî yên welatên OCDE ji bo van alayên nayên zeftê ku birêvebirên fonên xanenişîniyê, banqeyên kar an jî fonên spekulatîf in dev ji desthilata xwe ya li ser kûrên dowîzan berdan. Di vê navê de, divê em Watanabe xanima efsanewî ji bîr nekin, – ku sembola jinên navmalê yên Japonî ku bi pirranî berpirsên birêvebiriya teserrûfên malbatî ne. Ev "carry traders" weke lehiyê êrîşî bazarên diravî dikin û bendên çêkirî yên kurên dowîzan ku ji alî banqeyên navendî vê tên paraztin diteqînin û bi hewa dixin. Ew ji ferqa hatiniya di navbera aktîfên cihêreng fêde dikin, bi dowîzekî hatiniya wî pirr hindik (ku jê re dowîzê "fînansmanî" dibêjin) deyn dikin û bi dowîzekî hatiniya wî pirr (ku jê re jî dowîzê "carry" dibêjin) kar dikin. Di destpêka salên 2000'î de, gava ku rêjeya fayizê li Japonyayê bi rastî jî ne tiştek bû, kesên weke Watanabe xanima bi navûdeng teserrûfên xwe xistin bonoyên xezîneya Birîtanî û Awistralî ku jê re % 5 heta % 8'an kar anî. Ev cure kirîn û firotin mirov bi dirêjayiya dema razandinê heta ku kurê dowîz sabît be dixe karê û bi taybetî jî dema hatiniya bonoyên xezînê bi saya biqîmetbûna dowîzê ku mirov ji xwe re kiriye armac bi nisbet yê jêder fêda wê du qat dibe.

### Pêla spekulasyonan

Carry trade niha li welatên weke Amerîka, Brîtanya yan jî herêma Euro ku fayiz ji bo demeke kurt çibigre nemane bicîh bûye. Û wê welatên weke Brezîlya, Tirkiye, Afrika Başûr ku nû pêşdikevin û fayizeke girîng a hatiniyê didin ji xwe re kiriye armanc. Ji qanûnên spekulasyonê istifade dike û bûye fenomeneke ku xwe bixwe xwedî dike: biqîmetbûna dowîzê ku ji xwe re dike armac bilind dike û yê jêder dadixe. Xeleka dawîn a vî şerrê ji destpêkê de wendakirî midaxeleya banqeya navendî ya Japonya bû ku di îlona borî de, di maweyê çend saetan de 24 milyar dolar seferber kir ku bikaribe qîmetê yen daxe. Ew teşebus jî bêencam ma.

Welatên ku bi pêş ve dikevin û bûne armanca "carry traders" – ku ji ber biqîmetbûna zêde ya diravê xwe di rewşa alarmê de ne– ji bo ku diravekî pirr biha zirarê nede senaiya wan heta ji wan tê ku dowîzan kontrol dikin ku kêmasiyên xwe yên rikeberiya di vî warî de veşêrin. Amerîka û Britanya, ji bo çareyekê ji jêkemiya butçeya xwe û bazirganiya xwe re bibînin "quantitative easing / hêsankirina çendî" yan nermkirina çendî) li ber hev dibedilînin. Di encamê de welatên herêma Euro, ew jî, sebir dikin: wan vagona xwe bi lokomotîfa Almanyayê ve girê daye û aboriya xwe xistine bin paraztina euroyekî ewqas pirr biha ku Banqeya navendî ya Ewropayê (BCE) her li bendî tehdîda enflasyonê ye – ku hîn jî welatên derdorê (Portekîz, Îrlanda, Îtalya, Yûnanîstan û Îspanya) li benda bêqîmetbûna euro ne ku dê derfeta rikeberiya wan hîn baştir bike. (5) Bi hêviya ku xeyaletê şerrê perayan ji ber çavan wenda bibe, herkes, bêyî ku yek ji yê din fikaran bike, çend çekên ku hîn li ber destê wan in bi kar tîne.

* Profesor li Fletcher Schoolê, Tufts University (Medford, Massachusetts), endamê Groupe HEC (Jouy-en-Josas) û niviskarê Global Derivative Debacles: From Theory to Malpractice'ê, World Scientific, Sîngapûr 2010.

1 Hevpeyvîna Le Monde, 7'ê çiriya pêşîna 2010'an

2 Siyaseta merkantîlîst ber xwe die îxracatê. Bixwîne: Till van Treec, "Victoire à la Phyrrus pour l'économie allemande" (Serkevtina aboriya allemand ya Pîrûsî), Le Monde diplomatique, clona 2010'an

3 Fiyetê bazara zêr îroj digihîje 1500 dolaran

4 Bixwîne: Ibrahim Warde, "Le sort du dollar se joue à Pekin" (Qedera doleran di destê Pekînê de ye), Le monde diplomatique, adara 2005'an

5 Bixwîne: Laurent Jacque "Anniversaire en demi-tente pour l'euro" (Salvegera bê kêf ya euroyê), Le monde diplomatique, sibata 2009'an

Wergera ji fransî: Yaqûb Karademîr



MAHMUT CELAYIR: **Histirî I**, akrîlboyaxa ser tûwalê, 90 x 120 cm

# KULTUR-POLÎTÎK

Kejo Bajar

## "Min wî dît"

Şev nîvê şevekê… malbateke kurd ku xwedî sê zarok… bavekî welatparêz... vegera ji daweteke… jîtem û kuştina bav û dê… çavên zarokên kurd yê heya dawiyê vekirîmayî û şokbûyî… fîlmê Miraz Bezar ê bi navê "Min dît" bi vê çîrokê dest pê dike û bi çîroka zarokên sêwîmayî - ku sê heb in û yek ji wan dê ji nexweşiyê û neçariyê bimire- û yê mayî jî dê bi nav bajarên Amedê bikevin. Çîroka Gulistan û Ferat wê di heman demê de rûqetên salên nodî yê derûniya şerr jî raxîne ber çavan. Fîlm dê weha bike ku mirov vê peyva pêşiyan bi lêv bike: *Bila mirov bêxwudê be û ne bêxwedî be*. Gulistan û Feratê bêxwedî wê xwe zû bigihînin bêxwediyên ku gundên wan hatine şewitandin û li kolana Amedê hînî gramera bajêr bûne. Ferat dê hînî selpakfiroşiye û paşê jî tev li çeteyên welatparêz ku karên diziyê dikin bibe û heya rojekê wek dizekî transferî bajarê Stenbolê bibe. Lê rojekê dema karê xwe yê selpakfiroşiyê dike çav li kujerê bavê xwe bikeve û li ser nigan bi xwe de mîz bike.

Hingê em li Holocusta derûniya zarokên kurd diwarqilin. Gulistan jî dê li parkekê keçikek xama nas bike ku ew jî bermayiya şer e û wê kaxizên ku keçika xama dixe destê wê têxe ber camên texsiyan. Di wan kaxizan de weha dinivîsîne: "Ez keçikek bi tenê me û ji xwe re li hevalên mêr digerim." Mebesta li hevalên mêr gerînê ew e ku bi xwefiroşiyê pere qezenc bike.




Gulistan êdî di rola xwişka piçûk ya wê fahîşeyê de ye. Gulistan li ber avahiyan, li ber Migrosan ji bo ku kes ji wan gumanê neke dê têkeve destê Dilarayê û wê li hêviya muşteriyên Dîlanê bimînin (Dilara rûçinka Dîlanê ya fahîşetiyê ye) û bi wî awayî nanê xwe derdixîne. Lê çer çîrok bi pêş dikeve Gulistan jî wek birayê xwe rastî kujerê bavê xwe tê ku ew jî muşteriyê Dîlan- Dilarayê ye. Ya rast Dîlan-Dilara karê xwe li otêlan dimeşîne, lê ji ber ku maliyên kujerê jîtemcî ne li malê ne û ji ber ku heqê otêlê nede wê Gulistanê jî bi xwe re bibe malê ku ji bo cîran ji wan nekevin şikê. Gulistan dê ji birayê xwe wêrektir derkeve û ji mala mêrik demançeya wî bidize. Hewl dide ku kujerê bavê xwe yê di nav nîvînan de razayî bikuje, lê nikare. Dema demançeyê teslîmî birayê xwe û rêhevalên wî yên diz dike, ev hevok dê ji devê wê derkeve:

Hingê em li Holocusta derûniya zarokên kurd diwarqilin. Gulîstan jî dê li parqekê keçikek xama nas bike ku ew jî bermayiya şer e û wê kaxizên ku keçika xama dixe destê wê têxe ber camê texsiyan. Di wan kaxizan de weha dinivîsîne: "Ez keçikek bi tenê me û ji xwe re li hevalên mêr digerim." Lê wê bi hevalên mêr re bi qahpetiyê bike. Gulîstan êdî di rola xwişka piçûk ya fahîşeyê de ye. Gulîstan li ber avahiyan, li ber Migrosan ji bo ku kes ji wan gumanê neke dê têkeve destê Dîlarayê û wê li hêviya muşteriyên Dîlanê bimînin (Dîlara rûçinka Dîlanê ya fahîşetiyê ye) û wê bi wî awayî wê nanê xwe derxîne. Lê çer çîrok bi pêş dikeve Gulîstan jî weke birê xwe rastî qesasê bavê xwe tê ku ew jî muşteriyê Dîlan- Dîlarê ye. A rast Dîlan-Dîlara karê xwe li otêlan dimeşîne û lê ji ber ku maliyên qesasê jîtemcî ne li malê ne û ji ber ku heqê otêlê nede wê Gulîstanê jî bi xwe re bibin ku ji bo cîran ji wan nekevin şikê. Gulîstan dê ji birayê xwe mêrtir derkeve û ji mala mêrik demança wî bidize. Hewl dide ku qesasê bavê yê di nav nîvînan de razayî bikuje, lê nikare. Wexta demançê teslîmî birayê û rêhevalên wî yê diz dike, ew ê vê hevokê bibêje:

**- Min wî dît…**

Êdî ji bilî mezinan wê zarok jî li pêy heyfa dê û bavê Gulistan û Ferat bikevin ku kuştina bav ji 18 hezar kuştinan mînakek e. Dê heyfa zarokan jî li gor xeyalsaziya wan be. Jîtemciyê ku demançeya wî hatiye dizîn sibehekê dê li çav wêneyê xwe yê ku bi çekên leşkerî hatiye kişandin bikeve û kuştariya hatiye kirin jî wê li bin wî weneyî hatibe nivîsandin. Kujer dê li kuçeyê, li şaneşîna cîranê, di ber camên texsiyan de, li ser peyarêyê dê li pey berhevkirina sûretên xwe bikeve. Lê ev ne bes e, ji zarokan yek dê di hoparloya mizgeftê de bi şêwaza ku li ser erebeyê firengiyan bifiroşe kuştariya kujerî ji hemû bajarî re bibêje.

1) Sînemaya kurd kevneşopiya ku çîrokên xwe bi çavên zarokan bibêje didomîne. Bahman Gohbadî jî hema çi bigire di her fîlmê xwe de heman teknîkê bi kar tîne. Ji ber ku di vê şeva kurd de û di vê trajediya kurd de yên herî paqij mane ew in. Mirov di vê kêlîkê de dikare bibêje kadrajên çavên zarokan dike ku zêde lêpirsîn li fîlm neyên kirin.

2) Zimanê vî fîlmî bêtir bi kurdi ye lê zimanê di ber re tirkiya Diyarbekirê ye ku şoreşgerên kurd tirkiya Diyarbekirê wek romantîzma şoreşgeriya xwe bi kar tînîn û bi vî zimanî Diyarbekirbûyînê li hember nasnameya kurdbûyînê derdixînin an jî wek nasnameya duyemîn xwe lê digirin. Ev tişt bi xwe ji neteweyê dixwe û parametreyên neteweyê dikuje.


3) Hevoka Gulistanê ya "*min wî dît*" asta fîlm ya zimên nîşan dide. Ev bi xwe nimûneyeke şaşiyên ergatîvê ye. Ne ergatîvî tenê tê de, hemû kurdiya fîlmê ji tewanga xwe heya hevoksaziya xwe xerabe ye, ji bilî kaloyê ku ji xwe re li ser dezgeya xwe pincaran difroşê.

Tiştê ku şanoya kurd, sînemaya kurd û mûzîka kurdî ya li Bakur ku bi serê kurmanciyê de tînin, kes naynê serê hev. Lewre mirov di jiyana rojane de bi kîjan zimanî bipeyive û wî zimanî çawa bi kar bîne, serbest e; lê belê di nivîsandin, berhemên wêjeyî, berhemên sînemayî, şano û muzîkê de, divê mirov zimanekî weha bi kar bîne ku her kes jê fahm bike. Ev cudahiya zimanê kolanê û zimanê bilind di hemû zimanan de heye û zimanê bilind berî her tiştî gramatîkal e. Bi devokan berhem êdî nikarin bên dayin, lewre kurmanciyeke bilind jî heye ku jê re dibêjin kurmanciya standart.

## Sîsirkê hesinî û Selîm Berekat

"Me nizanîbû ku tengereyên dahlan welatan bi hev ve girê didin."

Helbestvanê ereb ê navdar Adonîs weha lomeyan dike: "Mixabin mifteya zimanê erebî îro di destê kurdekî de ye." Ew kurd Selîm Berekat e. Selîm Berekat bi elfebeya erebî xwe bera nav giyaya hewşê dide. Belê tahl e lê wê tahlbûnê wek "pelên pîvaza" Gunter Grass diqeşêre û çi çêj jê derkeve dê bi pirtûka xwe ya bi navê "Sîsirkê Hesinî" de vebêje.




Kolonyalîzm serê ewilî çav berdide zarokên xwe yên bindest. Bi kuştinê, bi dadê , bi perwerdehiyê, bi dêran, bi keşeyan û bi mamosteyan dixwaze zaroktiya ku li ser koka lê şîn tê bibirre û binax bike. Her ew hewl bidin ku wê bîrê bi axê dagirin û ava wê bimiçiqînin dê Selîm Berekat jî rahêje kulingê xwe bîrê û tarîtiyê bikole. Selîm Berekat tûrikê pişta xwe tijeh ax û tarîtî dike û ber bi bayê kurdayetiyê ve dimeşe. Raderînên herî baş di serê pênûsa nivîskar de ne. Zarokên ku Selîm Berekat behsa wan dike xwerû kurd in û ew bîranîn li cem tu gelên dîtir nayên peydakirin. Mînak: "Yê ko gundor ji ser bên bi ser kûçikê FELEMEZO de gindirandibû tu bûyî. Yê ko îsota sor xistibû nav ava qazên SEQMURO tu bûyî. Dema ko tu gumgumokan digurînî û hêlînên çûkan diherifînî tu şêrîn î. Dema ko tu li ser stêrkên xişokane û li ser avên ko baskên balindeyan li xwe kirine dipeyivî tu şêrîn î..." Ev kevanên hanê tenê dikarin ji bo şûmitiya zarokatiya kurd bên vekirin. Di vê kêlîkê de pîyanoya textînî ya nîvîskar tenê ji bo zarokên Kurdan lêdikeve.

Zarokên ku rêhevalên dengê sîsirkan in, dê temenê wan mişt şîddet be - ku tim dengên qiloçên beranan ji wê şîddetê tê- û wê kêfa wan ji zilamên sûtal ku kêrên wan di ber wan de ye, bê. Ew kêr dê carna li rex çem çermê berateyan bigurîne û bi perê çerm dê çend caran biçe sînemayê. Ew zarokatî dê di rêyên kaçaxê bi mayin re derbasî Tirkiyeyê bibe û xurman bi tûtinê bide. Heya roja îroj jî ji bo du bîdon petrol li ser sînoran têne kuştin û hêstirên wan bêxwedî li mala bavê wan vedigerin. Ew zarok dê xwe bidin ber çîrokên qumarbazan û ji xwe re dirûvê wan lehengan çêbikin. Dê ew zarok di nav pirêzeyan de darikên pûş di pozê xwe re bikin daku pozê wan ji xwînê der bikin. Di dema sirûdxwendinê de dê ew zarok di dorê de herdem nerehetiyan bike. Dê ew zarok di nav bîstanên xelkê de rûnên û piştî ku têr bixwin dê îcar bi qalikan bi serê hev bikevin. Xwîn û ava zebeşan tev li hev dibe. Di wan zarokan de ewqas girr û hêrs nebûya dê heya îro çawa 29 serhildan li dar biketana û hewqas serhildêran xwe li çiyayan bigirtana?

Dagirkerên ku serê bîranînên zarokatiya kurd didin ber dahsan; stêrkzanê zaroktiya kurd Selîm Berekat jî wan bîranînan bi "şehên hesinî" yên derasê şeh dike. Her ku ew bikole, dê ji nav hewşa me perîkên elokên ku me ji cîranan dizîbûn derkeve ber rokê. *Sîsirkên Hesinî* wek xiltekî axa rûhê me teze dike û dike ku bêhna axa şil ji pirtûkê bê.

"Dema tu li ser rovî û nêriyên taristanê dipeyivî, tu şêrîn î.."

"Dema tu li ser qantirên bûjîdirêj dipeyivî, tu şêrîn î.."

**Nivîskar**: Selîm Berekat

**Wergera kurdî**: Ehmed Huseynî

**Weşanxane**: Apec, Stockholm, 1997, 95 rûpel

## Çavên me ronî: RONAHÎ




Mîr Celadet Alî Bedirxan: Hiqûqnas, zimanzan, nivîskar, wergêr, berhevkar, stratejîst, şervan, edîtor, Herekol Ezîzan, Bişarê Segman, Nêrewan, mîr, cenanê pembo... Di nav Kurdan de hewqas rêngdêr li ber navê kurdekî din nînin. Her ku Celadet valahiyek di warê kurdayetî û kurmanciyê de dîtiye xwe lê rakişandiye û ji xwe re artêşek kesayetan ava kiriye.

Xebata dawî ya Celadet Bedirxan kovara Ronahî' yê ye. Ev kovar di 1' ê Nîsana 1942 'an de wek pêveka Hawarê dest bi weşana xwe dike û 28 hejmar derdikeve. Ev sal sala Şerê Cîhanê yê Duyemîn e. Jixwe naveroka kovaran jî bêtir bi dîmenên şer dagirtî ne. Di wî şerrî de Celadet Bedirxan alîgirê dewletên muttefîk e. Rûpelên Ronahî 'yê jî bêtir bi dîmenên ku muttefîk êrîşan dibin ser faşîzma Hitler û Musollini ve hatine xemilandin digel vê jî çîrokên şerr û yên sivîl jî cîhê xwe tê de digirin. Di wan bergehên sivîl de nûçeyek weha hatiye weşandin: "Zêrîngerên Londrê jî ji bona zefera Îngilistanê dixebitin... ji wan zêrîngeran 38 peya gîhane hev û destagehên xwe yên ku berê tê de tacên qralîçeyên Îngilistanê û ristik û guharên jinên lordan çêkirin, wergerandine destagehên çek û posatan û îro tê de guleyên topan çêdikin." Kovara Ronahî'yê tenê bi bergehên herbê ne xemilandî ye di heman wextî de nîvîskarê kurd jî berhemên xwe tê de weşandine. Her ku hejmarên Ronahî 'yê derkevin bêtir nivîsên Cegerxwîn, Qedrîcan, Hesen Hişyar, Osman Sebrî û gellek nîviskarên din tê de diweşin.

Balafir, balafirvan, noqar, sîtol, sîwanwanî, cenkeştî, segman, bimbeavêj, zerîpoş, ronîavêj... Ev peyvên îro em bi kar tînin ku di nav Kurdan de wek berhemên "zimanê akedemîk" tên binavkirin 70 sal berê di rûpelên Ronahî'yê de hatine nivîsandin. Celadet ne tenê ferhenga zimanê şerr çêkiriye, herweha hewl daye ku di her warî de peyvan li zimên zêde bike. Çawa ku Martin Luther bi wergera "Pirtûka Pîroz" yekîtiya zimanê Almanî çêkiribe û çawa Dante jî bi berhema xwe ya bi navê "Komedyaya Îlahî" yekitiya zimanê îtalî çêkiribe, mirov dikare bibêje ku Celadet Bedirxan jî bi "Hawar", bi Ronahî û bi berhemên xwe yên din yekîtiya zimanê kurdî çêkiriye ku kurmanciya îro em bi kar tînin çi di warê peyvan de û çi di warê rêziman de ji bilî hûrgiliyan temam hema wekî ya Celadet Bedirxan e. Ev pirsa ji bo Dante tê kirin dikare ji bo Celadet Bedirxan jî bê kirin. Gelo Dante bi zimanê îtalyanan dipeyive an jî îtalyan bi zimanê Dante dipeyivin?

Di dîroka 15.07.1951'ê de Celadet Bedirxan dema ku ji bo debara malê cenantiya pembo dike di bîrekê de werdibe û dimire. Mirov bawer dike ku wê hingê di bin çengê wî de Hawar û Ronahî hebûne. Bi çapkirina kovara Ronahiyê dê barê Celadet hinekî sivik bibe. Wek ku amadekarê pirtûkê Rênas Jiyan jî dibêje: "Ronahî ji bo zimanê me, ji bo Celadetê me, ji bo wêje, dîrok û çanda me herweha ji bo Dinya'ya me *ronahî*'yek e".

**Navê berhemê**: Ronahî

**Nivîskar**: Mîr Alî Celadet Bedir-Xan

**Amdekar**: Rênas Jiyan

**Weşanxane**: Belkî, Amed, 2010

**Mêjûya weşanê**: İlon, 2010

TORA CIVAKÎ YA XURT

# Facebook, neynika sêhrbaz

PHILIPPE RIVIÈRE

Çend roj berê, Facebookê ji min xwest ku ez navê xwe biguherrînim. Ne ku min nasnavekî dijûnker, an teşwîqkerê nefreta nijadî, an xesbkerê navê Mark Zuckerbergê mezin (patron, damezrîner û pardarê sereke yê malpera înternetî Facebookê), ne jî yekî nêzî markayeke qeydkirî, ji xwe re bijartibû. Lê min nasnavek ji xwe re hilbijartibû ku ji herfên alfabeya koran yên xweşik pêk dihat. Muhendîsên malpera kalîforniyayî ji nişka ve biryar dabû ku ev êdî li gorî tîpografiya wan minasib nebû. Di dema qeydkirinê de, Facebookê, berî ku bi rêya kontrolkirina kodeke dizî ya ji telefona min re şandî heyîniya min erê bike, navê min yê rast ji min xwestibû. Wê jî israr kir ku ez şîfreya e-peyama xwe bidimê, daku ew navên têkiliyên min werbigire û ev yek jî, dîtina têkiliyên min - di zimanê malperê de, "hevalên min" - hêsan bike.

Di bin çavdêriya daîmî ya algorîtmayan de, li ser navê şert û mercên bikaranînê ku tu kes naxwîne, rûpela şîn a Facebookê cîhekî rehet ji endamên xwe re pêşkêş dike ku ew dikarin têkevinê û bi hev re nîqaş bikin, bêyî ku ji ber peyamên kesên nenas û reklamên parazît ên ku tiştên nedîtî ji wan re didin xuyandin, aciz bibin. Quncikên reklamê bi têra xwe piçûk in û mirov dikare, bêyî ku wexta xwe bihesibîne, li wêneyên hevalên xwe binihêre, weke wan, ji ber heman agahiyan kêfxweş an nerazî bibe, bi heman leyistikan bileyize, xeberên wan ên herî asayî û yên herî dilşad bişopîne. Peyamên danûstendinan bi qasî ramyariya mirovan berfireh in, ji agahiyeke weha girîng a weke " ez serê xwe dişom " heta bigire ponija herî hûrgilî ya li ser hunerên hemdem û dawetên zayînê jî. (1)

Danûstendinên Facebookê her demî erênî ne: mirov dikare li ser îkona minasib bitikîne û tiştekî "biecibîne", lê ew nikare ji vî tiştî nefretê bike; peyamek tê dema ku em hevalekî nû qezenc dikin, lê ne kengî yekî lîsteya me diterkîne. Kontrolên cîhê bikarhêneran diparêzin: rêwiyê ku ji warekî ne ji rêzê di malperê dikeve derbasî lêpirsîneke pêlîstokî li ser bîngeha hin wêneyan dibe, daku nasnameya xwe piştrast bike. Helbet, rûdanên keyfî jî hene. Rûpelên hêstyar - mîna rûpeleke piştigiriyê ya ji bo leşkerê Bradley Manning ku bi ragihandina agahiyên vêşartî yên li ser şerrê Iraqê ji bo malpera WikiLeaksê mehkûm dibe - carinan bê şîroveyan ji holê tên rakirin, û çend roj bi şûn ve dîsa di malperê tên xistin... hê jî bê şîroveyan ! Ji bo tunekirina spamê, sîte pêşniyarî endamên xwe dike ku bi tikekê re, peyamên ziyanker îxbar bikin, û Facebook jî hesabên bikarhênerên mehkûmkirî ji sîteyê radike. Her cure çalakvanan jî vê kêmaniyê bi kar anî daku dijberên xwe yên siyasî ji şebekeyê derxînin. Facebook ji bikarhênerên xwe re qedexe dike ku girêdanên malperên xeternak (wek mînak, yên ku vîrûsan di komputeran de bi cîh dikin an jî daneyên banqeyê derdixînin) bidin; lê belê, carinan jî, meylên sansûrê yên vî "Big Brother" ê xêrxwaz hene (3), û ew girêdanên malperên dabeşkirina faylan an jî pêşkêşkirinên hunerî û siyasî asteng dike - mîna malpera seppukkoo.com ku alîkariya bikarhênerên înternetê dike daku... daneyên xwe paqij bikin û Facebookê biterikînin.



MAHMUT CELAYIR: **Dîmena Aramiyan**, Diptycon, 150 x 260 cm

Ev tevliheviya jîr û jêhatî ya jiyana ferdî û çavlêkirinê, ev şêwaza nermik a ji rê derketina sivik û azadiya çavdêrkirî, sirra serkeftina Mark Zuckerberg'î ye. Bi saya vê, wî 500 milyon bikarhênerên qeydkirî civandine - ev jî ne hindik e! - ku % 50'ê wan jî her roj dikevin malperê; ev jî her mehekê dike tevahiyeke 700 mîlyar deqîqeyên girêdayîbûnê. Wekî din, 200 mîlyon kesî jî li ser telefona xwe a destan dikevin Facebookê. Tevî ku navdariya zanîngeha Harvardê di destpêka xwe ya pirr serkeftî de roleke leyistibe jî, Facebook kêm zêde ji noqteya sifirê dest pê kir û ew, nuha, digel bi tenê 1 700 xebatkaran, mezintirîn malpera înternetê ya dunyayê ye.

Bikarhêner daneyên xwe bi azadî dixin malperê, û ev dane jî mijara arzûyan e. Bi saya wan, xebatkarên pazarnas dikarin, ji anketên medyayên asayî bêhtir bi hûrgilî, muşteriyên xwe hedef bikin - li gorî zayend, temen, rojbûn, ziman, welat, bajar, asta perwerdeyê, balkêşî, hwd. Hejmara van bikarhêneran jî, nêzî hejmara temaşevanên televîzyonê ye. Di 15'ê mijdarê de, marka luksê Louis Vuitton'î, bi vî rengî bê navberkariyê xwe gihand 1 594 045 bikarhênerên înternetê. Hemû jî kesên weha bûn ku li ser bişkokeke "ez diecibînim" tikandibû, û bi vî awayî teşwîqî hevalên xwe kiribû ku heman tiştî bikin. Li ser malpera sazkerê çantayên rêwîtiyê, naverok ji defileyên modayê (bi teknolojiya videoyên 360° pêşkêşkirî) heta bigre seyahatnameya *"di dilê Afrîqayê de"* ya stranbêjê Bono pêk tê.

Ji nav malperên navdar, markayên weke Starbucks, Coca Cola û bîskuwiyên Oreo, bi qasî 10 heta 25 mîlyon temaşevanan ber bi xwe ve dikişînin. Di vê rêza yekem de, stêrkên serdema me bi cîh dibin: mûzîk, sînema, futbol, rêzefilmên televîzyonê û leyistikên Facebookê. Barack Obama jî li wir e; kampanyaya wî ya 2008'ê li ser înternetê pirr deng vedabû. Lê bi tenê markayên mezin nînin ku ji vê fersendê sûd werdigrin. Di asta xwe de, hunermendên herêmî, nivîskarên nenas û şîrketên piçûk bi rêya heman pergalê xwe didin nasîn. *Le Monde diplomatique* jî li derveyî vê yekê namîne: malpera wê ya Facebookê ku dawiya 2009'ê ji hêla xwendevanekê ve hat vekirin, anuha 45 049 endaman dicivîne.

Facebook alîkariya herkesî dike ji bo ku marka xwe ya ferdî xweş bike û wê her dem zindî bike, Facebook eynika sêhrbaz a serdema me ye, xweperest û reklamgêr e. Bi tecrûbeya Facebookê re, herkes weha hîs dike ku bi awayekî daîmî xwe pêşkêş dike, li hemberî 130 kesî (hejmara hevalan a naverastî) ku ji ber her lebatek û her qerfekê li çepikan dixin. Pêşana elektronîk a heyîniya me çiqasî li gorî rastiya kesayetiya me - an jî arzûya me - bibe, em evqasî jî ji ber eynika wê serxweş dibin. Ji ber hestên bi vî rengî, her yek dixwaze li malpera xwe tiştên nû zêde bike, carina bi awayekî kompulsîf jî; mirov tahmên xwe, navnîşana xwe, cîhê xwe yê dema rast, bi saya teknîkên cuda yên cîhdîtinê, an jî çîroka nakokiyên evîndariya xwe diweşîne. Hemû saziyên parastina jiyana ferdî ji ber vê şîrketê matmayî dimînin; ew bi xwe lê mikûr tên ku mezinbûna her demê bileztir a teknolojiyan, li derveyî şiyanên wan e.

Lê Facebook dê li vira nesekine: ji malpereke bisînorkirî, ew nuha dixwaze li tevahiya înternetê belav bibe. Bişkoka "ez diecibînim" ku nîsana 2010'ê bi cîh bû, weke delameteke negirîng xuya dike, û her malpersaz dikare wê di sîteya xwe de bi cîh bike, daku balkêşiya xelkê zêde bibe. Bi saya vê pergala zîrek ku heta nuha di mîlyoneke malperan de heye, Facebook dikare ziyaretên li ser înternetê yên 150 mîlyon kesan, digel navê wan bişopîne; bi vî rengî jî, wan bêhtir nas bike. Ji bo ku baştir ji înternotan re xizmet (û çavdêriyê) bike, Facebook peyameke elektronîk da destpêkirin ku e-peyam, mesajên kurt û nîqaşa yekser digel hev di xwe de kom dike. Ew jî dibe reqîba Google'ê ku noqteyeke din a kontrola înternetê ye.

Facebook misoger dike ku bi tenê hevalên mirov dikarin vê giraniya metn û wêneyan ku bi berdewamî di bingehên daneyên xwe de dirêjin, bibînin. Di mijdara 2010'ê de, anketeke rojnameya amerîkî Wall Street Journal dabû zanîn ku hin xebitînerên leyistikên Facebookê yên mezin, nasnavên ferdî yên lîstikvan û hevalên wan difiroştin; ji wê demê û pê ve, şîrket siyaseteke "toleransa sifir" a li hemberî komîsyonvanên daneyan îlan kir û misoger dike ku Facebookê "agahiyên bikarhêneran tu carî nefiroştiye û dê tu carî nefiroşe jî". (Ji xwe em li vira behsa Patriot Act'ê nakin ku karbidestên amerîkî dikarin, bi rêya vê zagonê, agahiyên ferdî yên ku li DYA'yê bicîhkirî ne bi dest bixin.)

Di sala 1993'ê de, resimeke meşhûr a Peter Steiner ku di The New York Times de weşiyabû, weha digot ku " li ser înternetê, tu kes nizane ku hûn kûçik in ". Di 2010'ê de, nenasî li ber betalbûnê ye. Serokê Google'yê, Eric Schmidt, di konferansa Techonomy'ê ya 4'ê tebaxa 2010'ê de bi bîr xist : "Bi 14 wêneyên we, em dikarin we nas bikin. Hûn difikirin ku 14 wêneyên we li ser Înternetê tune ne? Lê belê wêneyên Facebookê hene." Rewşeke neguherbar, û li gorî wî, rewşeke pêwîst e jî: "Di dunyayeke tehdîtên nehevseng de, nenasiya rast pirr xeternak e. (...) Xizmeteke ewle ya kontrolkirina nasnameyê ji me re pêwîst e - û anuha, baştirîn mînaka xizmeteke bi vî rengî jî Facebook e. (...) Taliyê, hikumet ê vî tiştî ferz bikin. " Sextekarî hê jî pêkan e, lê her ku diçe, zehmet dibe. Mîmarên herî bihêz ên dunyaya li ser xetê û karmendên siyasî dixwazin Înterneta azad ku hê jî weke devereke bê zagonan tê dîtin, medenî bikin. Ku ew bikaribin wê kedî bikin, nasnameya rast a mirov dê bedêla beşdarbûna wê bibe. Heta nuha, tevnepîrik mecaziya ji bo pergaleke nenavendkirî ya şebekeyên komputerî yên pevgirêdayî bû. Tu kes nefikirî ku dê pîrhebokeke çalak di navenda wê de bi cîh bibe, û weha rabûn û rûniştinên hemû bikarhêneran çavdêr bike.

1 Miyase Christensen, "Facebook is watching you" ("Bala Facebookê li ser te ye"), *Manière de voir* hjm. 109, "Internet, révolution culturelle" ("Înternet, şoreşa çandî"), sibat-adar 2010

2 Fabrice Ebelpoin, "Guerre civile sur Facebook" ("Şerrê sivîl li ser Facebookê"), ReadWriteWeb France, 14 gulan 2010

3 Ji *The Social Network (Tora civakî)* (David Fincher, 2010) bêhtir - li ser Harvard, komputernasî û îqtidarê, ev hê jî fîlmekî gellekî balkêş e -, *Catfish,* belgefîlmekî Henry Joost û Ariel Schulman, ruhê Facebookê zeft dike. DVD'ya dê di çileya paşîna 2011'ê de derkeve

Wergera ji fransî: Simko Destan

## WÊNESAZÊ VÊ HEJMARÊ



## Mahmut Celayir

Di sala 1951an de li Çewlikê hatiye dinê. Di sala 1976an de, li Stembolê, ji Dibistana Bilind ya Hunerên Bedew mezûn bûye. Di navbera salên 1976-1978an de li Eskişehîrê di Beşê Sêwira Dik û Grafîk ya Enstîtuya TV'yê de xebitiye.

Hunermend Celayir, di navbera salên 1982-1984an de li Şanoya Dewletê ya Stembolê wek dîzaynerê dikê kar kiriye û ji sala 1986an û vir de wek wênesazê serbest dixebite. Hunermend Celayir, xebatên xwe yên hunerî li Stuttgart û Stembolê dimeşîne.

Hunermendê ku ji sala 1977an ve tevlî gelek pêşangehên şexsî û komî bûyî, wêneyên xwe ji bilî galerîyan li muzexaneyan jî pêşan daye.

Ji xeynî gelek bajarên Almanyayê, li bajarên wek Stembol, Îzmîr, Enqere û Parîsê jî pêşangeh ferişandine.

Hunermend Celayir, mehên havînê axleb li bajarê xwe li Çewlikê derbas dike. Bi kameraya xwe derdikeve nêçîra xwezaya Kurdistanê, fotrafên ji aliyê dîtbarî û hunerî ve nirxbilind dikşîne, dûre ji van fotrafan peyxam digre û wêneyên xwe çêdike.

Celayir, ji bo hunera xwe, ji xweşikayîyên xwezayî yên welatê xwe wek çavkanî sûd werdigire; di wêneyên xwe de grîngî dide ronahî, sî û tarîtîyê û bi awayeke gelemper axê dike navenda mijarên xwe yî hunêrî. Hunermend, ji erdnîgariya Mezopotamyayê ku bûye dergûşa gelek şaristanîyên heybetdar bêslî dibe.

Celayir, hêza xwe ya hunêrî ji ax û çiyayên Kurdistanê digre, mijarên têkildar bi lênêzîkbûneke estetîkî ya bilind pêşkêşî temaşevanên xwe dike. Herçiqas, ew di rêwîtîya hunera xwe de derketibe keşfa nasname û coxrafyaya xwe jî, em dibînin ku xwediyê têgihîşteneke nûjen ya hunerî ye.

Heger hûn bixwazin zêdetir agahî li ser xebatên hunerî yên Celayir bidestbixin, hûn dikarin serî li malpera hunermênd (www.mahmutcelayir.de) bidin.

www.arsivakurdi.org

# *Jiyan bi kurdî xweş e*




# NAVEROK

## ÇILEYA PÊŞÎN 2010

Krîza Siyasî li Iraqê û rola Kurdan
**Prof. Dr. Ferhad Îbrahîm**
▶ R. 1

Riya ku ji antîkurdolojiyê ber bi kurdolojiyê ve diçe û Îsmaîl Beşîkçî
**M. Malmîsanij**
▶ R. 1

**JI ÇAPEMENIYÊ**
▶ R. 2

Bêdadî
**Serge Halimi**
▶ R. 2

Xelkekî nenas: almanîaxêv
**Alexander Homann**
▶ R. 3

Di navbera lundisme û belçîkîbûnê de
**Alfonso Artico**
▶ R. 3

Nasnameya Valoni
**Marc Jacquemain**
▶ R. 4

Gelo Valonya dê heta hetayê sosyalîst bimîne?
**Olivier Bailly**
▶ R. 4

Pisporiya zanistî di xizmeta welatiyan de?
**Jacques Testart**
▶ R. 5

Piştî du salan, çi bi şoreşa ciwanên yûnan hat?
**Pierre Daum û Aurel**
▶ R. 6

Ne dostanî, ne diijminahî, bi tenê berjewendî
**Nikolas Kozloff**
▶ R. 8

Bajarvanî: şerrekî Cezayirê yê din
**Allan Popelard û Paul Vannier**
▶ R. 9

Herêma otonom a Kurdistanê Meşa dirêj ber bi otonomiyê ve
**Philippe Rondot**
▶ R. 12

Çareseriyeke li gorî berjewendiyên kêmneteweyan
**Babakr El Bachadari**
▶ R. 13

Mînaka ruwandayî li Burûndiyê belav dibe
**Colette Braeckman**
▶ R. 18

Li Burûndiyê, Yekîtiya Ewropayê bi gumana li ser hilbijartinan re rû bi rû ye
**Vincent Munié**
▶ R. 19

Heyraniya cemseran
**Gilles Lapouge**
▶ R. 20

Çîrok û rastiya şerrê perayan
**Laurent L. Jacque**
▶ R. 21

Kultur - Polîtîk
**Kejo Bajar**
▶ R. 22

Facebook, neynika sêhrbaz
**Philippe Rivière**
▶ R. 23

## Forma Abonetiyê

Nav:
Name

Navnîşan:
Address

Koda Postayê:
Postcode

Bajar:
City

Telefon:

E-Mail:

Abonetiya salane (12 hejmar!)

☐ Almanya (50 €) ☐ Derveyî Almanyayê (60 €)

☐ Abonetiya dîjîtal (20 €)




**Le Monde diplomatique kurdî, salnameya 2011yan diyarî aboneyên xwe yên nû dike!**
**Heta 31'ê çile bibe abone: salnameya LMd-kurdî wek diyarî bigre, roj û mehan bi kurdî bişopîne**

**Independent Kurdish Media Group GmbH (IKMG)**
**Carnotstr. 4 - D-10587 Berlin**

Berliner Volksbank - Hesab/Account/Konto: 2284 1230 10 - BLZ: 100 900 00
IBAN: DE78 1009 0000 2284 1230 10 - BIC/SWIFT: BEVODEBB

www.arsivakurdi.org